

W

Lal Laleş

Şeymûs Diken

Mem Mîrxan

Osman Baydemir

İsmail Beşikçi

Canip Yıldırım

Ahmet Altan

İhsan Colemêrgî

Keya Îzol

Yaqob Tilermenî

Edîb Polat

Muharrem Erbey

Salihê Kevirbirî

İrfan Uçar

Amed Gökçen

Omer Dilsoz

Arjen Arî

Berken Bereh

Hamît Geylanî

Ahmet Tarî

Necmiye Alpay

Adnan Binyazar

A.Ömer Türkeş

Zana Farqînî

Medenî Ferho

Fawaz Husên

Ayhan Meretowar

Dilower Mêgerî

Rêzan Tovjîn

Yaşar Kemal

www.arsivakurd.org

DOSYE. AMEHD

MEDEN

DOSYE: MEHMED UZUN

“N iha Diyarbekir di heyata min de jî di nivîskariya min de jî cihekî gelek giring werdigire. Wekî hûn jî dizanin nivîskariya min li welatê xerîbiyê dest pê kir û ez bûm nivîskarê romana Kurdî. Û li welatê xerîbiyê nivîskarî zaf zaf zehmet bû. Zehmet e, gelek zehmet e. Di wê heyama avakirina nivîskariya min de; Diyarbekir her tim bi min re bû. Jixwe di romana min a “Tu” de Diyarbekir bi firehî heye. Mirov dikare bêje ku ew roman romana Diyarbekirê ye. Diyarbekir, hingê ji bo min bû hêz û qewet, da ku ez karibim li hember zehmetî û dijwariyên welatê xerîbiyê rawestim û li milê din jî karibim nivîskariya xwe ava bikim. Baweriya min gelek bi Amedê û hemû herêmên Kurdistanê heye.”

MEHMED UZUN



Boraboz 5

EROÛTÎKA

ئەرۆوتیکا

ARJEN ARÎ

ارژهن اری

Helbest

navero.k...

- **Jİ DESTEYA EDÎTORIYÊ / 2**
- **BI MEHMED UZUN HEVPEYÎVÎN / 3**
Hevpeyivîn: Lal Laleş-Şeymus Diken-Mem Mirxan
- **MIROVEK HAT BAJÊR: MEHMED UZUN / 10**
Osman Baydemir / Ji Tirkî Werger: Mem Mirxan
- **DI SALA 1973yan DE MEHMED UZUN / 12**
İsmail Beşikçi / Ji Tirkî Werger: Mem Mirxan
- **LI GOR MIN MEHMED MUCÛZEYEK E / 14**
Canip Yıldırım / Ji Tirkî Werger: Mem Mirxan
- **MEHMED UZUN / 18**
Ahmet Altan / Ji Tirkî Werger: Mem Mirxan
- **DI DEMÊN ZINCÎRKIRÎ DE KARÎNA (QUDRETA) GOTINÊ / 20**
Şeymus Diken / Ji Tirkî Werger: Behlül Zelay
- **FELEKA ME XAYÎN E / 24**
İhsan Coşkun
- **LIBERXWEDANEK BÊMSAL / 26**
Keya İzol
- **MARATONVANÊ TENYA / 28**
Yağob Tilermeni
- **ROMANNÛS Û ÇIROKBÊJ MEHMED UZUN / 32**
Edib Polat
- **MÎRAT Û CIVAK / 35**
Muharrem Erbey / Ji Tirkî Werger: Lal Laleş
- **MEHMED UZUN Û NİFŞÊN NÛ / 36**
Salihê Kevirbirî
- **NIVÎSKARÊ KU TEVLÎ LEHENGÊN KU WÎ AFIRANDINE BÛYE / 38**
İrfan Uçar
- **GELO BERÊ DIVÊ EM RABIRDÛYA XWE PAQIJ BIKIN? / 39**
Amed Gökçen / Ji Tirkî Werger: Mem Mirxan
- **XÎRETKÊŞ Û PALÊ EDEBIYATEKE STEWR: MEHMED UZUN / 41**
Omer Dilsoz
- **07.2006 / mamik / serjimêrî / li dor "nameya li ser baskê kevokê" Û şaxê zeytinê, serxawê / 42**
Arjen Arî
- **MEHMED UZUN / 46**
Berken Bereh
- **AX Û NALÎNÊN AMEDÊ / 48**
Hamit Geylani
- **EWREKÎ REŞ Û TARÎ / 49**
Ahmet Tarî
- **DER HEQÊ ZIMAN Û VEGOTINA DI ROMANÊN MEHMED UZUN DE / 50**
Necmiye Alpay / Ji Tirkî Werger: Sîdar Jîr
- **CÎHANA VEGOTINÊ YA MEHMED UZUN / 54**
Adnan Binyazar / Ji Tirkî Werger: Dilawer Zeraq
- **ZIMANEK, DÎROKA WÊJAYA WÎ ZIMANÎ YE / 57**
A.Ömer Türkez / Ji Tirkî Werger: Zeyneb Yaş
- **DER BARÊ ZIMANÊ MEHMED UZUN DE ÇEND TÊBÎNÎ / 61**
Zana Farqînî
- **MEHMED UZUN LI SER STÛLEKE RÊKÛPÊK RÛNÎŞT / 68**
Medenî Ferho
- **RONÎ MÎNA EVÎNÊ TARÎ MÎNA MİRINÊ / 73**
Fawaz Husên
- **RONESANSA LI WELATÊ ME / 74**
Ayhan Meretowar
- **BÎRA QEDERÊ Û FOTOGRAFÊ HERÎ DAWÎN: "ZOZAN HADÊ EM BIÇIN ZOZANÊN JIYANÊ" / 76**
Mem Mirxan
- **MİHEMED UZUN: NIVÎSKARÊ KURD LI BER DERGEHÊN CÎHANÊ / 83**
Dilower Megerî / Ji Erebi Werger: Sirwan Hecî Berko
- **BÎRA QEDERÊ / 88**
Rêzan Toşjîn
- **ZIMANEK GELEKÎ (NETEWYEKÎ) DIAFRÎNE / 91**
Yaşar Kemal
- **ENCAMNAMEYA KONFERANSA PARASTINA ZIMAN / 92**
- **LI SER "SÊ ROJ Û SÊ ŞEV, DENG Û BÊJ"Ê ÇEND NOT / 94**
Cemil Oguz

Kovara Sênehane
Hejmar 13 / Zivistan 2007
Xwedî û Berpîrsiyara Nivîsarana: Rojin Türkekul
Desteya Edîtoriyê: Mem Mirxan / Lal Laleş / Şeymus Diken
Redaksiyon û Serrastkirin / Dilawer Zeraq
Desteya Wergerê:
Dilawer Zeraq
Behlül Zelay
Mem Mirxan
Lal Laleş
Zeyneb Yaş
Sirwan Hecî Berko
Sîdar Jîr
Grafîk û Mizanpaj: Şener Özmen
Şewirmendê Hiqûqê: Av. Muharrem Erbey
Navnîşan: İnönü Cad. Ma-Gül İş Hamî No. 60 Diyarbakır
Çapxane: Gün Matbaacılık-Stenbol
E-Mail: kovaraw@yahoo.com
kovaraw@hotmail.com
WEB: www.kovaraw.com

Nivîsên ku ji bo weşanê ji kovarê re tên sandin, li wexdiyê wê nayê vegeandin.
Her nivîskar ji nivîsa xwe berpîrsiyar e.

Şertên Abonetiyê:
Nava Welat, salek: 20 YTL
Welatên Dêreke, salek: 60 EURO

Banqe: Rojin Türkekul Ziraat bankası Merkez Şubesi Diyarbakır
Nimroya Hesabê: 101 27 71 EURO: 1044279

Merheba,

Xwendevanên ezîz, Kovara "W" bi hejmareke nû û taybet bi we re ye. Xwendevanên me, yên ku kovarê ji nêz de nas dikin û dişopînin, dizanin em di hin hejmaran de hin nivîskarên xwe yên kedkar û serkêşê wêjeya Kurdî; ku li ber dilê me û we tevde hêja ne û xwedî nixrin, bi hejmareke taybet a ku hemû rûpelên kovarê ji wan re tê terxankirin pêşkêşî we dikin. Cara yekem me di hejmara 10an de bi edîtoriya hêja Dilawer Zeraq, bi hejmareke taybet rûpelên kovarê, ji wêje û helbesta rêzdar helbestvan û nivîskar "Ehmed Huseynî" re terxan kiribû. Kovara Wyê, vê neqlê jî bi hejmareke taybet, rûpelên xwe ji wêje û nivîskariya romannûsê hêja û bi qîmet "Mehmed Uzun" re terxan kir.

Di vê hejmara me ya taybet de, gelek nivîsên giranbiha hene û heta ji destê xebatkarên kovara Wyê hat hewl da ku ji hemû aliyan ve berhem û edebiyata Mehmed Uzun bê nixrandin. Ji ber ku jixwe di gelek kovar û rojnameyan de, ji gelek aliyan ve romannûs hatibû vegotin, lê wekî hûn jî dizanin Kovara W, kovareke wêjeyî, çandî, hunerî û rexneyî ye, ji ber xususiyetên kovarê me hewl da ku em huner û romannûsiya nivîskêr derxin pêş, heta ji me hat me

kir ku mirovên xwedî ramanên cihêreng û di kar û barê xwe de biserketî, bi piralî berhemên wî ramanên wî ji we re bixwînin û binixînin. Li gorî baweriya me hejmareke dûrî magazin û ulûman, hejmareke entelektuelî, edebî û ilmî derket holê.

Rûpelên kovara me nivîskaran wiha neqîşand:

Xwendevanên ezîz, wek edîtorên vê hejmara taybet, me bi Mehmed Uzun re hevpeyvînek kir. Birêz Uzun ji rewşa zimên bigirin heta rewşa edebiyata me û cihanê, ji evîne bigirin heta mirinê, di gelek waran de fikirên cihêreng anî zimên.

Îsmail Beşikçi di nivîsa xwe ya bi navê "Di sala 1973yan de Mehmed Uzun" de, li hember rewşa aloz a wê demê aramiya Mehmed Uzun destnîşan dike. Di heman katê de em bi nivîsa Beşikçi rewşa salên heftêyî ya welêt fêr dibin.

Osman Baydemir di nivîsa xwe ya bi navê "Mirovek Hat Bajêr: Mehmed Uzun" de bandora bajarê Amedê ya li ser nivîskêr dinirxîne û dibêje; vî bajarê qedîm gelek bîranînên xedar derman kiriye.

Rexnegira hêja Necmiye Alpay ku ew niha bêhtir serê xwe li

ser pîrgirêkên ziman diêşîne, der barê ziman û vegotina Mehmed Uzun de gotareke balkêş ji we xwendevanên me yên hêja re amade kiriye. **A. Ömer Türkes**, ku ew bêhtir li ser teoriya romanê disekine, bi nivîsên xwe yên rexneyî romana Tirkî xurt dike, vê carê li ser berhemên Mehmed Uzun sekîf û destnîşan kir ku "Zimanek, Dîroka Wêjeya Wî Zimanî ye."

Canip Yıldırım di nivîsa xwe de qala Amedê û Mehmed Uzun kir. **Ahmet Altan** qîmet û giranbihayiya Mehmed Uzun nişan da. **Şeyhmus Diken** bal kişand ser qudreta gotina nivîskêr.

Şairên Kurd **Arjen Arî**, **Berken Bereh**, **Hamit Geylani** û **Ahmet Tarî**, bi lirîzm û kelecana welêt bûn şirikê vê hezkrinê.

Fewaz Husên balê dikişîne ser kitêba Mehmed Uzun a bi navê **Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê** û wiha vedibêje "Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê destanek e, destana kesên ku bi darê zorê bûne dijminên hev."

Îhsan Colemêrgî dibêje, **Feleka Me Xayîn** e û ji zozanên Berçelanê bang li Mehmed Uzun dike. **Omer Dilsoz** di nivîsa xwe de balê dikişîne ser ked û tehba Mehmed Uzun a ji bo edebî-yateke netewî û bi kurtaşî dibêje "Mehmed Uzun neçirvanekî jîr û zîrek ê dangan e."

Medenî Ferho dibêje "Mehmed Uzun li ser stîleke bi rêk û pêk rûnişt."

Adnan Binyazar gava behsa "Vegotina Dinyaya Mehmed Uzun" dike dibêje, mirov wî hem ji bo Tirkî, hem jî ji bo Kurdî nivîskarekî nûjen ê li hemû dinyayê belavbûyî bihesibîne.

Zana Farqînî kite bi kite li ser zimanê Mehmed Uzun disekine û tşkiliya nûserekî Kurd bi zimanî wî re dinirxîne. **Dilawer Meqerî** Mehmed Uzun wek nivîskarekî li dergê cihanê bi nav dike.

Yaqob Tilermenî balê dikişîne ser keda Mehmed Uzun û dibêje, em wî wek maratonvanekî tenya nehêlin. **Mem Mîrxan** piştî şirovekirina "Bîra Qederê" fotografekî din li "Bîra Qederê" zêde dike. Ew Fotograf, fotografê Mehmed Uzun û jina wî Zozanê ye.

Keya Îzol balê dikişîne ser berxwedana mehmed Uzun û biserketina wî. **Muharrem Erbey**, civak û mîrateya wê û di afirandina wê mîrateyê de rola ronakbîrên civakê dinirxîne. **Salihê Kevirbirî** "Nîfşên Nû û Mehmed Uzun" nîqaş dike. **Îrfan Uçar**, dibêje ku ew tev li lehengê afirandibû bûye. **Amed Gökçen**, dibêje divê berê em rabirdûya xwe paqij bikin. **Ayhan Meretowar**, ronesansa li welatê me, **Rêzan Tovjîn**, berhema "Bîra Qederê" dinirxînin.

Xwendevanên ezîz Kovara Wyê hewl da ku dûrî populîzmê û magazinê, objektîf; bêhtir ji hêla toreyî ve nivîskarekî bi rûmet Mehmed Uzun nîqaş bike û binirxîne. Em hêvîdar in ku kêfa we ji vê hejmara taybet re bê.


Heta hejmareke din bimînin di xêr û xweşiyê de...

BI MEHMED UZUN RE HEVPEYIVÎN

Hevpeyvîn: Lal Laleş, Şeyhmus Diken, Mem Mîrxan

Lal Laleş: Berê her tiştî ez dixwazim bêjim derbasî be. Hûn li xerîbiyê li welatê dîr, li sirgûnê nexweş ketin, we êş û azar kişand û rojekê we biryar da ku vegerin welatê bav û kalan, hûn vegeriyên Amedê. Gelo sebaba vê biryardayîne çî bû. Û gelê me niha tenduristiya we, siheta we meraq dike. Hûn dixwazin ji gelê Kurd re çî bibêjin, ji gelê Amedê re çî bibêjin. Bi wê ve girêdayî, tşkiliya nivîskarekî gewre û bajarekî qedîm çî ye?

Mehmed Uzun: Niha Diyarbekir di heyata min de jî di nivîskariya min de jî cihekî gelek giring werdigire. Wekî hûn jî dizanin nivîskariya min li welatê xerîbiyê dest pê kir û ez bûm nivîskarê romana Kurdî. Û li welatê xerîbiyê nivîskarî zaf zaf zehmet bû. Zehmet e, gelek zehmet e. Di wê heyama avakirina nivîskariya min de; Diyarbekir her tim bi min re bû. Jixwe di romana min a "Tu" de Diyarbekir bi firehî heye. Mirov dikare bêje ku ew roman romana Diyarbekirê ye. Diyarbekir, hingê jî bo min bû hêz û qewet, da ku ez karibim li hember zehmetî û diwariyên welatê xerîbiyê rawestim û li milê din jî karibim nivîskariya xwe ava bikim. Baweriya min gelek bi Amedê û hemû herêmên Kurdistanê heye. Bi Mezopotamyaya jorîn heye. Hêz û qewet e. Ez wisan difikirim. Rewşa min a tenduristiya li Ewrûpayê gelek xirab bû. Dixtoran vekirî ji min re digotin emrê te heftetek, du hefte maye. Yanê divê tu xwe hazir bikî ji bo roja dawîn. Îcar hingê min biryar da, heta ez bi Zozanê û bi gelek heval û hogiran re peyvîm, me biryar da me got: "hingê em vedigerin welatê xwe." Heger mirin be bila li welatê me be, ku şîfa be jî cihê min ê şîfayê Diyarbekir e. Diyarbekir çawan jî nivîskariya min re bû hêz û qewet, mimkun e ji bo



siheta min jî bibe hêz û qewet. Li ser wê yekê em hatin vê derê û îro em dibînin ku biryara me gelek di cih de bû. Yanê hem di warê moral de di cih de bû. Yanê gelê kurd bi her kesê xwe bi her awayî rabû ser piyan û piştgirtî li min kir. Piştgirtiyê gelek bi coş, bi heyecan, bi qewet nişanî min dan. Ew ji bo min bû hêza jiyane, a moralê. Di vê nexweşiyê de moral gelek giring e. Gelê me jî tu tiştêk teksîr nekir. Ez behsa çend kesan nakim bi milyonan insan ji her deveran, ji her kategoriyên civatê, ev bû hêz gelek mezin ji bo min da ku ez karibim li hember nexweşiyê şer bikim û li vê derê bi wasita we ez dixwazim ji gelê xwe yê ezîz re spasdariya xwe pêşkes bikim. Ew alîkarî, ew piştgirtî, ew destek nebûna, ne mimkun bû ku ez bi ser ketama. Ez gelek spasdarê wan im û ez ji bo ku spasdariya xwe di piratîkê de jî nişan bidim hin tiştan difikirim.

Bajar di edebiyata modern de cihekî navendi digire. Edebiyata modern, nemaze romana modern, li ser bajarvaniyê ava bûye. Yanê tarîxa bajarvaniyê û romana modern yek e. Ji bajêr derketiye. Ji bo wê jî bajar, saloxdana bajaran, tasvîra ba-



jaran, di edebiyatê de cihêkî gelek girîng digire. Hemû nivîskarên dinê yên navdar di navbera xwe û bajarê xwe de pêwendiyek ava kirine. Niha bajarê me jî hene. Bajarê me bajarên tarîxî ne. Mirov dikare bêje ku bajarên me di dinê de bajarên herî balkêş in. Ji ber ku bajarên me di eynî wextê de kaniya medeniyet û şaristaniyê ne. Kaniya însaniyetê ne. Lê di edebiyata me de mixabin me hîn bajarê xwe nekirine nemir. Me bi xurtî salox nedane. Me tarîxa wan taswîr nekiriye. Me ew nekirine hêz qeweteke dikare jîndar be. Bikaribe hêz û qeweta xwe veguhezîne nivîskarên dinyayê. Di dinê de nivîsarên wiha gelek in. Minak **James Joyce** (Jeymîs Joys), ji bo Joyce Dublîn di nivîskariya wî de cihêkî gelek girîng e. **Thomas Man, Victor Hugo** heye. Gelek nivîskarên din hene ku bajarên xwe û nivîskariya xwe bi hev re kirine yek. Bajariyên mîna hêzekê li nivîskariya xwe zêde kirine û edebiyata xwe pê dewlemend kirine û di heman katê de ew bajar jî bi nivîskariya wan dewlemend bûye. Îcar ji bo min jî Diyarbekir bajarekî wiha ye. Min jî her li ser Diyarbekir nivîsand, ji romana xwe ya yekemîn heta îro min her tim nivîsand. Hem di romanên min de, hem jî di ceribandînan min de Diyarbekir heye. Di romana min a dawîn **Hawara Dicleyê** de dîsa Di-

yarbekir heye. Diyarbekira salên 1840î. Min ew Diyarbekir nivîsandîye. Divê em di edebiyata xwe de bajar û bajarvaniyê derxînin pêş. Wan wisan taswîr bikin ku însanên me ji bajarên xwe hez bikin. Bi wan taswîr û saloxdanan tarîxa bajarên bizanibin û bizanibin li ser kîjan axê dijîn. Mirov bi vî avayî bikaribe hafizeyeke netewî ava bike. Tiştê ku ji me hatiye dizîn, ji me hatiye girtin.

Mem Mîrxan: Kekê Mehmed, tam di vê derê de şolbûnek heye. Wek rexnegirekî hemû nivîskaran dixwînim. Di bajar û taswîrkirina wan de zelaliyek tune ye. Di nava romanên nivîskarên kurd de ev tişt hene: Roman cihê ku lê derbas dibe, lehengê ku li wan kolan û kuçeyan digere ne diyar e. Behsa bajarekî tê kirin, lê em nizanin kîjan bajar e. Bajar ne diyar e, mirov ne diyar e û ew heyama ku tê de dijî ne diyar e. Li vir xwendevan û nivîskar nagihîjin hev. Xwendevan dixwaze ji cihêkî hez bike lê nizane ev cih ku der e. Ji kolanê hez dike ji leheng hez dike, lê nizane çî kes e çî kûs e. Hûn dixwazî di vê mijarê de çî bêjin.

Mehmed Uzun: Niha saloxdana edebiyatê ne mîna nivîsandina tarîxê ye. Ne xebateke sosyolojîk e jî, di edebiyatê de xewn û xeyal esas in. Ji bo ku



tu bikaribî zimanekî edebî ava bikî divê tu xewn û xeyalan jî binivîsinî. Li ser qeweta afirandina zîhnî, ji bo wê mirov nikare ji nivîskarê edebiyatê bixwaze ku saloxdana wî ji sedî sed rast bin. Ew dikare li gor xwe xeyalan jî çêbike, xewnan jî çêbike. Bi baweriya min û nemaze jî ji bo me, em bajarên xwe bi navê wan, bi tarîxa wan, bi kuçeyan û sikakên wan, bi derbasbûyîna jiyana civakî divê em nîşan bidin. Divê em bikaribin xewn û xeyalên xwe bi bajarê xwe re bikin yek. Em bi xewn û xeyalan bihonin, lê divê tarîxek wê jî hebe.

Mem Mîrxan: Ji bo Cezayîrê Cazablanca çî ye, Pera Palas ji bo Stenbolê çî ye, ji bo me Kurdan jî divê Amed wiha be.

Mehmed Uzun: Belê divê wisan be.

Şeyhmus Diken: Kek Mehmed, bi qasî ku ez dizanim tu berî nexweşiya xwe li ser du romanên girîng dişixuliyî. Lê piştî vê berxwedena li hember nexweşiya em dizanin ku wekî deynekî dilsoziya gel tu li ser romaneke sêyemîn jî dişixulî. A yekemîn piştî Komara Kurdan Mehabadê

hilweşiya û şûnde di pêşengiya **Mustafa Berzanî** de meşa pêşmergeyan a ji sînorên dewleta derbas dîke û kozik bi kozik şer dîke û xwe digihîne Sovyetistanê, bi gotineke din “meşa dirêj” a navdar ku we senger û cihê wê jî dîtibûn, ev yek, a duduyan piştî Şerê Cihanê yê Duyemîn jiyana Feylesofekî elman a li Stenbolê “Heviya Aurbaxê”, a sêyemîn jî deynê dilsoziya gel ku di vê nexweşiya de hûn bi tenê nehiştine. “**Xewna Melayê Batê**” hûn dikarin naveroka van romanên bi me û bi xwendevanên **Kovara W** re par ve bikin. A din jî hûn dikarin mizginiya vê yekê bidin ka hûn ê pêşî kîjan romanê binivîsin. Li gor we wê heta çî wext em ê bikaribin wan bixwînin. Ev pîrseke dijwar e, lê xwendevanên te jî li benda bersîva van pîrsan in.

Mehmed Uzun: Belê ev her sê proje jî hene. Projeya dawîn “**Xewna Melayê Bateyî**” ji nexweşiya min hat pê. Ez wê wekî yadîgarekê ji bo xelkê xwe, ji bo gelê xwe, ji bo welatê xwe difikirim. Ji bo wê piştigiriya xwe gelê min ji bo min li her derê nîşan da, divê bêbersîv nemîne. Divê ez nivîskarê romana Kurdî, bersîva wê bi berhemeke hêja bidim.

Ji ber wê divê ez romanekê li ser xweşî û spehiya zimanê Kurdî, xweşî û spehiya edebiyata klasîk a Kurdî, xweşî û spehiya Welatê Kurdistan romanekê binivîsim. Ji bo wê jî ez **Melayê Bateyî** fikirîm. **Melayê Bateyî** yek ji nivîskar û şairê me yê herî kevn e. Bi zimanê xwe yê xweşik, bi zimanê xwe yê xweşik ê Welatê Hekarê, hem Mewlûd nivîsandiyê, hem jî helbestên gelek xweş nivîsandine. Ji ber ku rêberê zimanê Kurdî ye. Ez jî dixwazim vî rêberî bikim lehengê romana xwe ku ez ê pêşkeşî gelê xwe bikim. Û ez bawer im destpêkê ez ê vê romanê binivîsim. Ên din projeyên profesyonel in. Lê ev ji bo min projeyeke hîsî ye. Deynekî min ê wefayê ye ji bo miletê min, ji bo welatê min. Ez bawer im destpêkê ez ê vê binivîsim. Kîngê dê xelas be ez nizanîm. Piştî wê hêviya Aurbax heye. Ez ê wê jî bi Kurdî binivîsim. Li ser wê xebata min heye, gelek sal in ez li ser vê romanê dişixulim. Hîn jî divê ez bi çend kesan re bipeyivim. Piştî wê jî ez ê rûnim û binivîsim. Yanê ku ez nexweş neketama min ê dest bi nivîsandinê bikira. Her tiştê wê temam bûbû. Ji aliyê teşe, ji aliyê teknîk, ji aliyê şêwe û raxistina romanê zelal bûbû. Gelek notên min jî hebûn û min gelek pirtûk jî tev dan. Ez ê piştî romana **Melayê Bateyî**, dest bi vê romanê bikim. A din wekî **Hawara Dicleyê** projeyeke dirêj e, fireh e, mezin e. Û ne tenê Meşa mezin a **Mele Mustafa** wan, her wiha tarixî Kurdên Îranê û Iraqê, ev heta îro jî tê. Bi vî awayî ez dixwazim tarixî Kurdistanî Iraqê û Îranê jî li nivîskariya xwe zêde bikim. Ev kêmaniyek bû ji bo min. Di nivîskariya min de kêmaniyek e, ez dixwazim wê nîşan bidim. Heta rûxandî û hilweşandî Sedam jî romaneke wisan e. Ev projeyeke dirêjtir e. Lê ez ê hêdî hêdî li ser wê jî bisekinim.

Lal Laleş: Pirseke min a din jî ji te heye. Piştî salên nodî gelek nivîskarên ciwan bi xwendina berhemên te dest avêtin pênûsê û bi Kurdî nivîsandin. Di wê demê de, di wê dema asimilasyon û tadeyiyê de, ku zilm û zor li ser zimanê Kurdî bû, hûn jî nivîskarê Kurd re bûn moral. Te dikir ku gelek kes bi vî zimanî binivîsin û xwe îfade bikin. Ez bawer im daxwazeke te ya mezin ew bû ku edebiyateke Kurdî ya xurt çêbibe. Dema mirov li berhemên te, li tiştên ku te ji bo vî zimanî kirine dinihêre, wek antolojî, wek roman, berhemên teoriyê ku te li ser edebiyata Kurdî nivîsandine. Jixwe ev nîşan dîkin.




Ez niha dixwazim bizanibim, îro, piştî salên 2000î, ji bo rewşa edebiyata Kurdî tu çi difikirî? Û tu dixwazî ji bo romannivîs, şair û wan kesên ku ji bo vî zimanî dilebitin çi bibêjî? Tu yê çi bi wan re parve bikî?

Mehmed Uzun: Niha rewş ji berê gelek çêtir e. Em divê vê bibînin. Ez bi xwe vê dibînim. Rewşa nivîskaran ji berê, ji bîst salan berê gelek çêtir e. Hejmara nivîskaran bêhtir bûye. Hejmara kesên ku rahiştine pênûsê û bi Kurdî dinivîsin, ne nivîskarên edebî bin jî bi Kurdî dinivîsin gelek zêde bûne. Îro wek **Azadiya Welat** rojnameyên rojane diweşin. Kovar derdikevin. Hevalên mîna we êdî xwe dane qebûlîkirin. Bi xebatên xwe, bi berhemên xwe. Bi kitêbên xwe, xwe dane qebûlîkirin û her di nava xebatê de ne. Hejmara we jî roj bi roj zêde dibe. Ev bêguman min gelek kêfxweş dîke. Lê ji bo ku em bikaribin edebiyateke dewlemend ava bikin ev gav têr nakin. Ev pêşketina ku ez behs dikim têr nake. Jê re hîn gelek tiştên din lazim e. Ji bo wê jî divê ew di warê



zimanê Kurdî de em seferberiyekê îlan bikin. Bi alîkariya tevgerên siyasî, bi alîkariya komele û rêxistinên siyasî, civakî, çandî û bi alîkariya şaredaran, çi imkanên me hene divê em ji bo seferberiya Kurdî bi kar bînin. Da ku bazareke edebiyata Kurdî çêbe. Bazara kitêbên Kurdî çêbe. Da ku rexnegirên Kurdî çêbin. Da ku hejmara rojname û kovarên Kurdî zêdetir bin. Da ku nivîskarên Kurd karibin di warê aborî de, di warê civakî de hêsantir nivîskariya xwe bidomînin. Ev girîng in. Ji bo wê jî ez hin tiştan difikirim. Bi serokê şaredariyan re, bi partiyên siyasî re, bi gelek cihên din re ez ê bipeyivim. Ji bo ku em karibin hin imkanan ji bo nîfşên nû ava bikin. Nivîskarekî Kurd divê bikaribe beyî zehmetî alozî û dijwariyên aborî li romana xwe, li helbesta xwe, li berhema xwe bifikire. Bikaribe konsantreyî wê be. Ev wezîfeyek e ji bo min. Gelek hevalên me di herin rojê deh saet, dozdeh saet dişixulin piştî wê jî nivê şevê rûdin û dixwazin edebiyatekê ava bikin. Ji ber ku hîn bazara Kurdî çênebûye di vê rewşê de ne. Nivîskarê Kurd nikare bi nivîskariya xwe heyata xwe bidomîne. Gelekê wan jî birçî ne. Di vê rewşa giran de bi fedakarî xebata xwe didomînin. Divê em çareyekê ji van tiştan re

bibînin û rica min, tika min ji nîfşên nû yê nivîskarên Kurd ew e ku mejiyê wan divê vekirî be. Bêguman em ê bi Kurdî binivîsin, welatê xwe binivîsin, gelê xwe binivîsin, lê divê mantelîteya nivîsandina me, haletî ruhiya nivîsandina me navnetewî be. Enternasyonal be. Gava meji, hiş modern nebe û gava bi edebiyata dinê re pêwendiyek me tunebe, hingê ne mimkune mirov berhemên heja ji bo gelê xwe jî binivîsîne. A yekê ev e. A duduyan jî: rewşa zimanê Kurdî ne mîna zimanê din e. Zimanê Kurdî zimanekî qedexeyê. Îro yek ji wezîfeyên me yê herî girîng ew e ku divê em bikaribin xwendevanên Kurdî jî çêbikin. Gelek însanên me nikarin bi Kurdî bixwînin û binivîsin. Ji bo wê jî gava nivîskarê Kurd, helbesvanên Kurd dinivîsin ji bîr nekin ku xwendevanên wan xwendevanên destpêkê ne û zehmetiyên wan ên xwendinê hene. Ji ber wê jî çî qas dikarin rewantir, dewlementir û zelaltir binivîsin ew çend hem dê xwendevanên wan pêş bikevin û berhemên wan belav bibin û ew çend xwedavanên me jî lê zêde bibin. A sisêyan jî bêguman nivîskarî bi heyateke nivîskariyê ve girêdayî ye. Mirov jê bi dûr bikeve û carinan binivîsîne nabe. Yek ji kêmaniyên nîfşê berê ew bû. Jê gelek



wan hevalên min dostê min bûn. Ji **Cegerxwîn** bigire heta **Mam Hejar**, lê wan çi dikiri, çi kar dikir? Wan dixwest bîst karan bi hev re bikin. Siyaset dikirin, rêxistinên wan hebûn, di komeleyên civakî de dişixulîn. Gelek tiştên din jî dikirin. Di ber re jî nivîskarî dikirin. Helbest dinivîsandin. Ji bist salan carekê pirtûkek dinivîsandin. Miraseke xurt û dewlemend mixabin çênebû. Ji bo mîraseke xurt a dewlemend çêbibe; divê berdewamî hebe. Ji bo wê jî hevalên ciwan divê netirsin. Kitêbek wan mimkun e nebaş be, kitêba duduyan jî divê nebaş be. Lê divê binivîsîn. Mirov ancax dikare bi nivîsandinê bi pêş bikeve. Bi zêdekirina berhemana mirov dikare berdewamiyekê ava bike. Mirov dikare kamil bibe. Daxwaz û tika min ji nivîskarên ciwan ev e.

Mem Mîrxan: Kek Mehmed, di nivîsandina romana Kurdî de ez rastî çar şeweyên nivîsandinê tîm. Jê yek nivîskar wek dê û bavê xwe dinivîsîne. Ancax tu dêya wî, an bavê nas bikî tu dikarî ji berhema wî fêm bikî. A duduyan; nivîskar bi kurmanciya gundê xwe, an herêma xwe dinivîsîne. A sisêyan, nivîskar li ser navê modernîzmê; peyvên ku ji deran tomar kiriye, an wî çêkiriye dide hev û wan di roman û nivîsan de bi kar tîne. Şeweya

çaran ez dikarim bêjim şeweya we ye. Xwendevan çawan fêm dike, dê çawan tê bigihîje, beyî ku xwe biêşîne, beyî ku li peyvan bigere, bi wê şewazê dinivîsîne. Û ev şewaz ji aliyê gelek zimanzan û nivîskarên kurd ve tê rexnekirin. Minak dibêjin: "di nivîsên wî de gelek peyvên Tirkî, Erebi û Farişî hene. Ev şewaz tê rexnekirin. Hûn van çar şewazan çawan şirove dikin. Ez bi xwe jî di nivîsandinê de ber bî we tîm. Ji ber ku kesek ji nivîsê fêm nake, xwendevan her ku diçe kêmbin. Li gor we divê roman bi zimanekî çawan bê nivîsandin

Mehmed Uzun: Divê berê her tiştî di nivîsandinê de em zimanekî standart ava bikin. Zimanekî yekgirtî ku her kes bikaribe jê fêm bike. Ji ber wê jî divê mirov hêdî hêdî ji devoka bav û diya xwe gund û bajarê xwe, tax û herêma xwe bi dûr bikeve. Divê bikaribe bi zimanekî wisan binivîsîne ku her kes jê fêm bike. Hem herêmên welêt, hem jî însan jê fêm bikin. Di destpêkê de ev bêguman zehmet e. Bi zimanê Kurdî perwerde tune, xwendin û nivîsandin tune, tu bi kurdiya ku tu dizanî dest pê dikî. Ev normal e. Lê divê hedef ew be ku em xwe bigihînin zimanekî standart. Zimanê yekgirtî yê ku ji Çiyayê Kurmênc, heta Mehabadê, ji Serhedê heta bi Hewlêrê, Dihokê mirov karibe jê fêm bike. Ez bala xwe gelek didim ser vê yekê. Ev di nivîskariya min de gelek girîng e. A duduyan: Ez bi tu awayî gotinan çênakim. Min çet çênakirine. Min bi hezaran rûpel bi Kurdî nivîsandine, lê min gotinek bi xwe, bi serê xwe çênakiriye. Min tiştê li rastnivîsîna Kurdî zêde nekiriye. Bêguman dîtînen min jî hene, rexneyên min jî hene. Car çaran ez jî dixwazim hîn tiştan bikim. Feqet ez bi qaydeyên ku hene bi wan dinivîsînim. Dewsa ku gotinan li ziman zêde bikim, di şûna ku problemên nû derbixim ji bo ziman û xwendevanên Kurdî, ji bo Edebiyata Kurdî, zimanê ku heye ez pê dinivîsînim. Gelek heval ji ber xwe de gotinan ava dikin, çêdikin û bi wan peyvan dinivîsînin, beyî wan jî kes jê fêm nake. Mirov divê tiştên wiha neke. Edebiyat tiştêkî ne wiha ye. A sisêyan jî niha di navbera zimanê edebiyatê de, alîmên edebiyatê û nivîskaran de heye. Ez ne alîmê ziman im. Min ilmê ziman lînguîstîk jî xwendiyê. Lê belê ez xwe alîmekî ziman nabînim. Ez nivîskarê edebiyatê me. Di nivîsandina edebiyatê de mirov nikare wek alîmekî edebiyatê binivîsîne. Mirov nikare gotinan li hev

bîne û bêje xwerû Kurdî ye, ji bo wê ez ê vê peyvê bi kar bînim. Ew çax mirov nikare zimanekî rewan ava bike. Di edebiyatê de zimanekî rewan, zimanekî zelal, zimanekî rê bide ku tu karibî vebêjî, tasvîr bikî, lehengê xwe bikaribî bidî jiyandin e, ev esas e. Ez van tiştan bi zanî dikim. Di gelek cihan de qehremanên min nabêje dîrok dibêje tarîx, nabêje Amed dibêje Diyarbekir, nabêje jiyandin dibêje heyat. Hemû jî bo em bikaribin zimanekî rewan û herikbar û edebî ava bikin e. Ku em li gorî qaydeyên gramatikê herin û mîna alîmekî ziman binivîsînin, hingê ne mimkun e ku em tekstên edebî ava bikin. Şiir jî wiha ye, di şîrê de tiştê herî muhîm rîtm e, aheng e, uslûb e. Gelek gotinên Kurdî hene, xwerû Kurdî ne feqet li rîtmê şîrê nayên wê gavê tu dikarî ji soranî bigirî, ji zakî, ji Erebi dikarî bigirî, ji Farişî dikarî bigirî, tu dikarî ji zimanê biyanî bigirî, yanê niha gelek, gelek peyvên enternasyonal hene. Ne hewce ye ku mirov di dewsa wan de gotinên Kurdî peyda bike û bi kar bîne. Jixwe ew hene, her kes jê fêm dike û hatine qebûl kirin û jixwe bêhtir li tekstê tîm, li nivîsandinê tîm. Ne hewce ye tu bêsebeb ziman giran bikî, wisan giran bikî ku xwendevan nikaribe jê fêm bike. Gelek girîng e ku nivîskar û helbestvanên kurd divê tekstên xwe de hezkirin, coş, lezet û heyecana ziman jî bide. Divê em bikaribin wê lezetê, wê coşê, wê hezkirinê hîs bikin û lê vebin. Divê em ji bîr nekin îro li Tirkîyê jî sedî nod û nehên Kurdan ditirsin bi Kurdî bixwînin, ji ber ku kurdiya wan tîm nake. Gava dixwîne jê fêm nake. Di vê rewşê de divê em rê bidin ku ew xwendevanê ku ditirse, tîrsa xwe birevîne û lê vebe. Ji zimanê xwe hez bike. Bi zimanê xwe bawer bike.

Şeyhmus Diken: Berî ku em biqedînin hûn ji bo agirbestê dixwazin çi bêjin?

Mehmed Uzun: Ez agirbestê gelek girîng dibînim. Piştgiriya agirbestê dikim. Ez hêvîdar im ku careke din çek neyên hildan û şidet neyê herêma me. Lê di heman wextê de divê Gelê Kurd tekoşîna xwe bidomînin. Bi her awayî ji bo mafên xwe bi rêyên demokratîk, bi rêyên civakî, bi hemû şeweyî, lê bêçek, ji ber ku divê di heremê de çek nebe şeweya çareser kirina pirsgirêka Kurdî. Rêyên din jî hene. Dubare dibêjim ez piştgiriya li agirbestê dikim. Divê em alîkariyê bikin ku agirbest berdewam bike û Kurd jî hêdî hêdî bikaribin bigihîjin heqê xwe.

Mem Mîrxan: Dema min pirtûkên we xwend min dît ku hûn gelek tiştan şirove dikin. Wek sirgûn, wek jiyandin, wek mirin, wek hezkirin, wek evîn, wek hesreta welêt. Ku ez yeko yeko ji we bipirsim: (Hûn dikarin bi hevokê jî bersivê bidin)

Mem Mîrxan: Evîn...

Mehmed Uzun: Evîn kaniya heyatê ye.

Mem Mîrxan: Jiyandin...

Mehmed Uzun: Jiyandin qedera mirov e.

Mem Mîrxan: Mirin, we mirin gelek şirove kiriye, bi wê ve girêdayî: gelo hûn ji mirinê ditirsin? Mirin çi ye ji bo we?

Mehmed Uzun: Na ez ji mirinê natirsim. Mirin dawiya qederê ye û tê serê her kesî, hîç kesek nikare xwe jê xelas bike. Lê ji bo kesê ku mirin li pêşiyê ye tiştê herî girîng. Divê mirov karibe tiştêkî nemir li pêş xwe bihêle.

Mem Mîrxan: Diyarbekir:


Mehmed Uzun: Diyarbekir, kanî û enerjîya nivîskariya min e û şifa nexweşiya min e.

Em li ser navê Kovara W spas dikin. Saxî û silametiya ji we re dixwazin.

MIROVEK HAT BAJÊR: MEHMED UZUN

Osman Baydemir /
Ji Tirkî Werger: Mem Mirxan

Gelek bajar hene ku tu bi salan lê dimînî, lê bajar te hembêz nake (te ji xwe nahesibîne). Rojekê wek qederekê tu neçar dimînî ji wî bajarî derkevî. Divê tu derkevî û tu diçî. Tu diçî û dema tu li pey xwe dinihêrî, li tiştên ku te li pişt xwe hiştine difikirî. Û tu hew dibînî ku ji wî bajarî tu tişt di binhişê te de nemaye. Piştê jî ew bajarê ku te li dû xwe hiştiye nebûye bajarê te. Bi sedan mînakên



derçûnên wisan û ji bajaran wisan hene.

Lê belê hin bajar jî hene; dema te hewa wan stend û da, te hembêz dikin. Hewce nake ku tu li wî bajarî hatibî dinê jî. Bajar ew qas ezîz û nazdar e ku di dema naskirinê de te wek hembajariyê xwe qebûl dike. Te wekî yekî ji xwe qebûl dike. Hemû tiştên ku dane ser hev ji duh ve hazir e ku bi te re parve bike. Li benda bîrewerê xwe ye...

Ku hûn rojekê ji wî bajarî dûr dimînin dilê we pê ve dimîne. Hûn bi wî bajarî re radibin û bi wî bajarî re radizên. Hûn çûbin cihekî ku naşibe bajarê we, cihekî lêzimiya wî bi bajarê we re tune ye, yanê hûn çûbin xerîbiyê jî, hûn di navbera bajarê ku lê dijîn û bajarê xwe de manendiya û lêçûyîna wan digerin û ew lêçûyîn piçekî din we bi jiyanê ve girê dide. Hûn wan şibandin û kitekitan bi baldarî didin ber hev û razên bajarê xwe careke din difikirin.

Destpêkirina min a bi vî rengî, bi nexweşî û vegera Mehmed Uzun a di meha tîrmehê ve girêdayî ye. Hîn şeva ku hatibû, dema got: "Ez ne ji bo mirinê ji bo jiyanê hatime" mirov wan çend gotinan wek nîşaneke hesreta bajarê xwe û têkiliya salên sirgûnê dibîne.

Mehmed, di berdewamiya heyamek salên sirgûnê de bi nexweşiyê ku ez naxwazim navê wê bêjim ketibû. Em bi rewşa wî re ji nêz ve eleqedar dibûn. Me rewşa wî ji nêz ve dişopand. A rastî ji destê me zêde tiştê nedihat. Li bajarekî dûr û sar bû.

Dermankirina wî dom dikir. Lê dermankirinê têr nedikir. Ji bo mirovê welatê sar, tevger û şêla wan, fikara wî hebû. Têkiliya mirovê welatê lê dijî sar û mekanîk bû. Min ev ji gelek vegotinên wî yê sirgûnê dizanibû.

Tiştên Mehmed çend rojên dawiyê li wê rê jiyabû peyîtdandina vê yekê bû. Bijîşkan nûjdarî sekinandibûn û gotibûn "êdî tiştêkî ku em bikin nemaye" Mehmed jî, aha di wê kelîyê de biryara xwe dide. Dê vegere. Hem jî tavilê. Dê vegere bajarê xwe. Diyarbekirê. Ew bajarê ku wekî hembêza dê dilovan e. Bajarê ku bi salan e xwîn vedirîşe! Û kesek pê nizane. Ji yên dipirsî re jî dibêje 'min ava sûsê vexwariye.'

Diyarbekirê dikaribû birînen herî xedar jî bicebirîne. Ku ev bajarê qedîm û kevnare nikaribe, dê kî bikaribe. Bi sedan salan çî qas birîn cebirandinê? Yek xwediyê birînan û yê din ew dizane. Erê dibe ku Mehmed ji ber vê sedemê, dê ji rabirdûya xwe û ji vî welatê dûr û sar wekî hemû defterên kevnar bigire, vegeriya.

Îro di ser vegera Mehmed Uzun re sê meh derbas bûne. Ez dema li encama vegere dinihêrim, ev bajarê ku ez ji hembajarîbûna wî şanaz dibim, bi kêfxweşî ez dibînim ku Diyarbekira ku tevî ruh û giyanê mirov dibe, li ser navê mirovekî careke din bi taybetmendiya xwe ya cebirandinê mezinahiya xwe nîşan dide. Û belkî ji ber wê, ya rast ev e ku ez ê gotinê bi gotina Mehmed Uzun a nexweşaneyê biqedînim. "Diyarbekirê kana şêla ya Mezopotamîyayê ye. Ez jî ji bo şêla hatim. Diyarbekirê. Ez ê rehet bibim."

DI SALA 1973yan DE MEHMED UZUN

İsmail Beşikçi /
Ji Tirkî Werger: Mem Mîrxan

Di girtîgeha Rêveberiya Awarte ya Bajarên Diyarbekir û Sêrtê de, ji destpêka 1973yan de dest bi anîna xwendevanên dibistana navîn û lîseyê jî kirin. Ji Dêrsimê, Tetwanê, Mûşê, Sêwregê, dem bi dem komên xwendevanên anîn. Xwendevan di jêpîrsînên bi îşkence re derbas dikirin û dişandin girtîgehê. Dema xwendevan dihatin hundir, ji binçavkirinê heta jêpîrsîna bi îşkence û girtinê yek bi yek vedigotin. Bi xwendevanên re sepanên nû jî anîbûn rojevê. Ji şagirtên hatibûn girtin û




şandibûn girtîgeha rêveberiya awarte, hefteyek, deh rojan şûnde, ji qawîşê digirtin û dîsa dibirin jêpîrsîna ewlekariyê. Şagirt, dema jêpîrsîna bi îşkence bi bîr dianîn, nedixwestin dîsa biçin buroyên ewlekariyê. Bi xof û tirs diçûn. Ên cara duduyan diçûn saziya ewlekariyê careke din di îşkenceyê re derbas dibûn û dihatin. Vê yekê hem şagirt hem jî yên di qawîşê de hêrs dikirin. Hevalên di girtîgehê de li ser vê mijarê gelek bi-hîstyar bûn. Her tim bi rayedariya girtîgehê re dipeyivîn da ku yên hatine girtin divê careke din nebin îşkenceyê û ji bo vê jî divê rêveberî raya xwe bi cih bîne. Daxwaza sereke li hember derketina îşkenceyê bû. Girtîgehê soz û peyman didan, garantî didan, lê belê xwendevan disa ji qawîşan dibirin saziya ewlekariyê û disa di jêpîrsînên bi îşkence re derbas dikirin. Ev yek her didomiya. Nûnerên qawîşê û hevalên din her tim bi rayedariya qawîşê re dipeyivîn, nîqaş dikirin. Di dawiya sala 1973, meha Rêşemiyê de, ji Sêwregê komeke qeşbalix xwendevan anîn. 25 şagirt. Ji wan piranî xwendevanên lîseyê bûn. Ev xwendevan jî di jêpîrsînên bi îşkence re derbas bûbûn. Her yekî tiştên bi wan hatibûn kirin, ji hevalên di qawîşê de, ji kekê xwe re yek bi yek vedigotin. Ev heval, bi hinceta şandina Dadgeha Leşkeriya Enqereyê hatibûn girtin. Digotin, wê di demeke kurt de bişînin Enqereyê. Mehmed UZUN, wê jî di nav vê komê de bû. Mehmed UZUN, wê

demê, zirav, dirêj, wekî şitlekî bû. Di qawîşê de gelek Ruhayî û Sewregî hebûn. Dilê ciwanan û kekê wan ê li qawîşê hema li hev germ bû. Serqîsê Ferid Uzun, Mustafa Düşünekli, Sabrî Çepik, Ahmet Melik bi van hevalan re ji nêz ve eleqedar bûn. Hevalê nûnerê qawîşê û hevalên din jî ji nêzikahiyeke gelek germ nişanî wan dan. Roja 2yê Adarê rayedariya girtîgehê, xeberek ji qawîşê re şand û got, divê ji hevalên ku ji Sêwregê hatine çend jê dîsa biçin Saziya Ewlekariyê. Li ser vê yekê, hevalên ku ji Sêwregê hatibûn, gotin "dîsa îşkence", ketin nava kelecane, endîşe û tirsê. Gotin em naxwazin dîsa biçin ber jêpîrsîna bi îşkence. Qurf û panîk çêbûbû. Xwe li vê derê û wê derê qawîşê vedîştartin. Diketin binê ranzayan. Li ser wê yekê hevalên me yê nûner û hevalên din dan dest-nîşankirin; "em careke din ji ber lêpîrsîna bi îşkence, van ciwana naşînin Saziya Ewlekariyê. Nûnerê Qawîşê Edip Karahan bû. Tê bîra min wê rojê ji Kek Edip bêhtir İbrahim Güçlü bi rayedariya girtîgehê re kete nava têkilî û nîqaşan. Bi rastî di hemû hevalan de dinamizmeke mezin hebû. 2yê Adarê di navbera rayedariya girtîgehê û girtiyan de nexweşiyê mezin çêbû. Rayedariyê got, teqez divê em çend ciwanan bişînin Saziya Ewlekariyê. Ev fermana parleşkergehê ye. Midurê girtîgehê çend caran hat qawîşê û bi taybetî peyivî. Fermana parleşkeriyê dubare kir. Got: "ez kefil im ku wê destê kesî bi hevalê we nebe." Di berdewamiyê de got, rewş gelek cidî ye, tiştêk di destê min de nemaye. Girtî jî, ji yek û nîva xwe danediketin. Girtiyan ji ber serboriyên derbasbûyî baweriya xwe bi midurê girtîgehê nedianîn û digotin; "ew li ser soza xwe neman." Her du hêl jî bibiryar bûn. Hevdîtina dawiyê di 12ê şevê de bi rayedariya girtîgehê re dîsa li qawîşê pêk hat. Encam jê derneket.

Li hember îhtîmala êrişê, me li ber deriyê qawîşê barîqat çêkir. Mase, dolabên nan, kursî, dan ber derî. Her kes bi heyecan li benda tiştên dê biqewimin bûn. Her kes li ser piya bû. Hin heval

tevî cilê xwe, xwe vezilandin. Êrişê ku me dipa di tariya şeva 3yê Adarê de pêk hat. Hêzên ewlekariyê bi bombeyên gazê êriş kirin. Piştî bombeyan, gulebaranê dest pê kir. Derb li bermala qawîşê û li hesinê renza diketin. Di qawîşê de panîkeke mezin çêbû. Bi bandora bombeyên gazê fetisok re, heval ber bi pacê, derî ve baz dan. Li ber pacê, leşkerên biçek sekinîbûn. Li paş qawîşê, bi gotineke din li hêla daşirê, du tanq ketibûn sengerê. Tanqan jî dest bi gulebaranê kir. Ji ber barîkatan me nikaribû derkevin cihê hêwadarkirinê jî. Hin heval ketin dolabên nan û xwe veşartin, bi vî awayî wan digot em ê xwe ji gazê biparêzin. Ji ber dûyê, çavan çav nedidît. Ên ku derketin cihê hêwadarkirinê jî ketin ber çu, jop, qudax pêhn, gurmist û darên leşker, tîmên taybet û polîsan. Ew roj li girtîgehê rewşeke awarte ya mezin hebû. Nêzî 40 hevalî wekî sergerdeyê bûyeran kurisandin hucreyê. Dest danîbûn ser hemû ferax û fol, daktîlo, pirtûk, rojname, pelgeyên arşivê û hwd. Pirtûk, kovar, û pelgeyên arşivê çirandin, avêtin nava heriyê û çalên avê û pê lê kirin.



Ez Mehmed Uzun ji wan rojan nas dikim. Bêdeng, biedeb, bipergal, xwende û hevalekî bifikir bû. Wî jî, ew bûyerên

min li jor behsa wan kir dişopand. Ji wan rojan û heta îro pêşketineke balkêş...

Mehmed Uzun ji dema 1978-1979an, ji Komal-Rizgarî jî tê bîra min. Demekê bû gerinendeyê karê nivîsaran ê Kovara Rizgarî jî. Ji ber wê bi Orhan Kotan, Taner Akçam re di hepsê de ma. Taner Akçam ew çax rêvebirê 'Dev-Yol'ê bû. Ez romanivîsîna Mehmed Uzun gelek hêja dibînim. Lê ez di demeke kurt de bi wergerandina wan a Tirkî re biguman im. Ez nizamim ev rast e, an na, bêbawerî me.

Ez ji Mehmed Uzun re saxî û silametiye dixwazim. Ferid Uzun, Kek Edîp û Orhan Kotan bi dilşadî bi bîr tînim.

LI GOR MIN MEHMED MUCI- ZEYEK E

Canip Yıldırım /
Ji Tirkî Werger: Mem Mîrxan

Min Mehmed Uzun li Amedê li Girtîgeha Leşkeriyê nas kir. Hingî ew 18-19 salî bû. Mirovekî cihê bû. Cudatiya wî xuya dikir. Wek mînak, li Sêwregê xwedê dabû, lê tevgera wî ne wek sêwregiyana bû. Heta dawiyê fêrbûyî, xeribdest bû ku xwîna mirov lê dikeliya. Sêwregî xwe ji yên din mezintir dibînin, Mehmed Uzun ne wisan bû. Pismamê wî Ferîd Uzun jî li ba me bû. Ferîd hişk bû, mirovekî bi angaşt bû. Lê Mehmed bi sebir wek "bêje hela bisekine ka çi dibe?" tevdigeriya. Heta yê li hemberî xwe tê negihîştta, bersîv nedidayê. Ji temenê xwe mezintir tevdigeriya. Heta dawiyê biedeb û qencmîrov bû. Min tu carî bîr nedibir ku Mehmed ê bibe romanivîsekî kurd. Yanê Mehmed mirovekî xweser bû. Mehmed gelek di bandora Diyarbekirê û girtîgeha wê de ma. Piştî di gelek rêxistinana de cih girt û şixulî. Berpirsiyariya roj-nameyan kir.

Li gor min Mehmed mucîzeyek e. Min tu carî texmîn nedikir ku Mehmed ê wiha navdar bibe. Gencineyeke veşartî bû. Me nizanibû ew çend gencîne ye. Wî jî nizanibû. Belê sebra wî. Xwedî sebreke gelek mezin bû. Tim digot: "xeman mexwîn." Ne mirovekî hêrsok û lertzok bû. Tim karê xwe li gor demê dikir. Digot: "zeman çareya hemû derdan e." Ku îro bi ser nexweşiyê de diçe û li ber xwe dide, ew ji wê bêhnfirehiya wî ye. Ji baqîlbûna wî ye.

Mehmed serekê romanivîsên kurdan e. Mehmed di dîroka wêjeya Kurdî de yekta ye. Me roman û



çîrokên Kurdî, gotarên Kurdî bi wî re naskirin. Li hember van Mehmed wekî ku tu tiştê nekiribe nefsbîçûk tevdigere. Ez jî nizanîm çawan Mehmed vebêjim. Mirovekî ecêb e. Tu tiştê wî ji kesî nekêmtir e, lê xwe tim li nefsbîçûkiyê digire. Di rastiyê de mirovekî mezin e.

Wek min got Mehmed "ka bisekine", di bersîvdayînê de ne bilez bû. Li yê hemberî xwe guhdarî dikir û gelek tiştan jê hîn dibû. Fikr û ramanên xwe hema bi yê li hemberî xwe ve nedizeliqand. Ne bi angaşteke mezin bû. Jixwe hunermend û nivîskar û helbestvan di bandora mirovan de dimînin. Dixwazin yên li hemberî xwe fêm bikin. Nivîskarê ku ev hêla wî tunebe, helbestvanê ku ev hêla wî tunebe, tim dipeyive. Bi rik in. Jixwe divê romanivîsê herî mezin binhişîya kolektîf a gelê xwe bizanibe û jê fêm bike. Yanê ku got kew e, divê bizanibe nikul sor e. Mirovekî fireh e. Wekî deryayekê ye. Bi serketina di vê nexweşiyê de jî wisan ye. Panîk nake. Baweriyê wî ye ecêb heye. Xwedê saxî û silametiye bidê. Wexta ku dixtorên wî dibêjin, "êdî wî bibin." Nabêje min bibin Sêwregê. Dibêje min bibin Diyarbekirê. Min bibin Diyarbekirê. Lewra vî bajarî bandor lê kiriye. Ji

Wek min got Mehmed "ka bisekine", di bersîvdayînê de ne bilez bû. Li yê hemberî xwe guhdarî dikir û gelek tiştan jê hîn dibû. Fikr û ramanên xwe hema bi yê li hemberî xwe ve nedizeliqand. Ne bi angaşteke mezin bû. Jixwe hunermend û nivîskar û helbestvan di bandora mirovan de dimînin.



ber ku hîn di zarokatiya xwe de zindana Diyarbekirê nas kiriye. Ji mirovên li wê derê bandor stendiye. Vê bandorstendinê di mêjî û giyanê wî de şopên balkêş hiştine. Belê ketiye zindana Diyarbekirê, lê mayîna wî ya di girtîgehê de cihê ye. Bandora çîrok, destan, kilamên Kurdî li ser Mehmed gelek mezin in. Mirovên hunermend, mirovên zanyar û feylesof tim guhdarî dikin. Ev gelek girîng e. Mehmed zarokê jî guhdarî dike. Gelek tiştan ji zarokê hîn dibe. Hunermediya herî mezin jî ev e. Wekî mînak ew trajediya ku di romanên wî de heye, trajediya Mala Bedirxaniyan, Menduh Selîm Beg, ji keçikeke çerkez hez dike, ew jî ji wî hez dike, lê belê utopya wî, îdealên wî û evîna wî pev diçin. Bîrdoziya wî serdest dibe. Li vê derê kurdekî bi kok û evîna wî, takekesiya wî, gelhez, yek ji gel bûyîn û dizane ku ji vî gelî ye û vê yekê hîs dike û berê xwe dide çiyê û evîna wî keça çerkezana bi erebekî re dizewice. Ev trajediyeke gelek erjeng e.

Ez zêdetir di bin tesîra Bîra Qederê de mam. Ev pirtûk trajediya Bedirxaniyan vedibêje. Mirovên

qelender, mirovên birûmet, mirovên gelhez êş kişandine.

Êşên gelek mezin kişandine. Ev êş ji ber terbiyeyan wan, ji ber nixên etîkî, malbateke biesl û esas e. Piraniya endamên vê malbatê li Ewrûpayê xwendine. Li Elmanyayê, li Fransayê, li Belçikayê xwendine. Ev jî tev li refên nasyonalên wê demê bûne. Mirov jê re bêje welatperwerî çêtir e. Û dema vedigerin welêt ew jî tev li rêxistinên welatperwer dibin. Ev tevgerên nasyonalîst li wan ew qas tesîrê dikin ku hemû hebûn û heyînen xwe di vê rêyê de xerc dikin. Rojek tê tiştê wan namîne û ji ber zext û tadeyiya dewletê sirgûnî Suriyê dibin. Li Sûriyê li wê çola Xwedê, dest bi çandiniyê dikin û pera qezenc dikin. Wan pereyan jî ji bo îdealên xwe bi kar tînin. Pirtûkxane û weşanxaneyan vedikin û ji bo pêşveçûna xwe tim dixwînin. Û ji bo debara xwe çandiniyê dikin, ji bo ku li wê axa çolistanê hilberîne bikin bîrê dikolin. Û di vê bîrê de, Celadet Bedirxan difetise. Mehmed vê yekê bi wê şeweya xwe ya xweş, bi zarê xwe yê xweş gelek bedew dihene. Û hebekî heyata min jî di vê ro-


manê de heye. Rastî jî, em jî gelek baş hatin perwerdekirin, dadikê me hebûn, me taştêyek dikir, te çî bixwesta tê de hebû, tiriye reş, hêk, şîr û hingiv... Wekî hespeke bi esl (ku berî xwediyê xwe, tirajediya wan tê digihîje) û yekî jî rêzê, mala Bedirxaniyan jî tê mirov û xwende bûn. Ji bo ku bibin malbatek ew qas mezin bandora perwerdehî û edebê gelek li ser wan heye. Mirovekî çiyayî û zarokê wî û malbatek li Cizêrê û zarokê wan li vir Xwedê dane bi destê pîrik û hemşîreyên herî baş ne wek hev in. Ev taybetî di mala Cemil Paşa de jî hene. Mînak Ekrem Cemil Paşa û Qedrî Cemil Paşa yek ji bijarteyên nîşana welatparêziyê ne. Ew jî dema li Swîsreyê dixwînin tev li vê hereketê dibin. Dema tîrî Tirkîyeyê û behsa Kurdan û pirs-girêka wan dikin. (Süleyman Nazif xalê wan e.) Dema behsa kurdan û kurdayetiye dikin Süleyman Nazif dibêje ev çî fikir e. Ev çî dîtin e. Kurê min hûn neçûne Lozanê hûn çûne zozanê. Ji bo gelê bêpişt, zexta li ser wan, biçûkxistina wan Süleyman Nazif dibêje ev tiştêkî normal e. Em gelê Amedê jî wek wan in. Em jî biesl in. Mafê me ye jî, xwarinên herî xweş bixwin. Tevgera wan ji bo guherîna qedera kurdan e.

Ez ji bo nivîskarên ciwan dibêjim. Rastî ez tê nagihîjim. Li bajêr Xwedê em dan. Em bi tirkî dipeyivin, lê çîrok û helbestên Kurdî min mest dikin. Mînak helbestên Melayê Cizîrî, helbestên Cegerxwîn min mest dikin. Ez heyrana bedewiya di wê helbestê de, xweşikî û ahenga vî zimanî me. Helbesteke Melayê Cizîrî heye, kurê Şêx Selîm, Evdîlmed Beg xwend got: "ev di dîwana Melayê Cizîrî de jî tune ye. Ev tenê li ba malbata me heye. Helbest xwend. Tavilê min jî ji ber kir." Sorgula quncadihen, wek nîhala kê yî tu. Mehweşa gulpîr û xweş û şepala kê yî tu. Gulriha sîmen..... Li ahenga vê helbestê binêrin. Jixwe helbest bi ahenga xwe helbest e. Û hûn bi ber pêlê vê ahengê dikevin. Û ev aheng tev li rihê we dibe. Gelek helbestvanên gewre yên kurd hene. Lê belê kurd gelek çiyayî ne. Tim li çiya û newalan, li kendalan jiyane. Ku roj çû ava kurd jî radizên. Ew çax bi nivîsandin û xwendinê re tu tîkiliya wan namîne. Radizên. Sibê şiyar dibin û diçin ser axa xwe. Ku pez hebe, şivanê pezê xwe ne. Ji ber wê çendê kurdên li bajêr xwe winda nekirine, Melayê Cizîrî, Şêx Ehmedê Xanî, wek tê zanîn Cegerxwîn jî gundiyeke Kercewsê ye. Cegerxwîn jî wekî sêvê li Suriyê distewe. Ji ber ku ew çax li wê derê bizava

Kurdî heye. Ji ber ku hemû rewşenbîrên ji ber Serhildana Dersimê, Koçgirî û Agiriyê direvin, berê xwe didin Sûrî. Û li vê derê çima em hatin sirgûnkirin, çima zilm û zor li ser wan hate ferz kirin û çima hatin? Kuştina xwe fêr bûn û li vir welatperweriyeke gelek mezin geş bû. Ne li Îranê ne li Îraqê ne jî li Tirkîyeyê, li Sûriyê.

Niha gelek ciwanên me yên hêja hene. Helbest, çîrok û romanên Kurdî dinivîsin. Bi Kurdî dîroke dinivîsin. Ev roj, ev heyam "Ronesansa kurdan e". Reform e. Yanê dawiya sedsala 20an despêka sedsala 21ê Ronesansa Kurdan e. Û gelek ciwanên binamûs digihên. Helbastvanên jêhatî digihên. Ha ji we re Mehmed Uzun. Ev tiştêkî dîrî aqilan e. Bi Kurdî romanê dinivîsîne. Me di xewna xwe de bidîta; me nikaribû bawer bikira. Çawan dibe, bi Kurdî dê roman bête nivîsîn. Dema em xwendevan bûn nivê salê em ji Enqereyê vedigeriya Diyarbekirê, me bi hevalên Meletiyê û Xarpêtê re tim şer dikir. "Kurd hene, an tune ne." Wan digot: "Helbesteke we heye? Edebiyatek we heye? Dîrokeke we heye?" Ji ber ku wê çaxê her tişt qedexe bû me jî nizanibû gelo ev tişt hene, an tune ne. Lê belê me bi binhişiya xwe, bi terbiya ku me stendibû dizanibû gelê Kurd heye. Em dizanin heye; lê em zimanê wî nizanin, wêjeya wî nizanin, em hunera vî gelî nizanin û dîroka wî nizanin. Belê bi tevgera 49an re bi tevgerên piştî 49an re û bi tevgera gelê kurd a îroyîn re kurdan di demeke pir kurt de gelek karên mezin pêk anin, reform û ronesans pêk anin. Hem jî heta dawiyê bi risk, ne tenê bi devkî di pratîka çalakiyan de jî gelek gavên mezin avêtin.


Guherînen gelek mezin çêbûn. Vê guherîne bandora xwe li Rojhilata Navîn jî kir. Îro hemû gelên bindest, mezhep û ol bi reform û ronesansa kurdan kêfxweş dibin. Keldanî dibe, asûrî dibe, êzidî dibe, yên qizilbaş û elewî dibe.



MEHMED UZUN

Ahmet Altan/

Ji Tirkî Werger: Mem Mîrxan



Naskirina nivîskarekî hema hema ne pêkan e. Wekî ku Zweig gotiye, "Ew di nava me de wekî mirovên ji me bin digerin, Piştê diçin, nivîsên bêhempa dinivîsînin."

Naskirina nivîskarên wekî Mehmed UZUN jî bêhtir dijwar e.

Bi gumana min yekî din tune ye ku bi qasî wî, bi nefsbîçûkiyê behreya xwe nîşan bide.

Gelek sal berê li navçeyê Norwêçê ya li ber behrê me hev nas kiribû.

Bi tulika xwe ya bi pûte û îfina bi kêlekê ve şeh kirî, bi gomlegê bêstukur, bi peyva wî ya hêdî hêdî, bi dengê aramî û bi kubariya gewre ku ancax di mîrê kurdan de mirov dikare bibîne, wekî îro tê

bîra min.

Li gor fikr û ramana min ew qencmirovek bû.

Lê belê fikra min a destpêkê tenê ev bû.

Tiştên ku wî nivîsibûn min nexwendibûn.

Min nizanibû ew nivîskarekî çawan e.

Piştê em li ser edebiyatê peyivîbûn.

Xwedî zanîneke gelek xurt bû. Axaftina pê re wekî vekirina deriyê gencîneyekê bû.

Ez li ba wî wekî cahîlekî mabûm û wî bi kubariya xwe ya her dem ev nedabû rûyê min.

Em bi hev re gelek geriyabûn, peyivîbûn û wekî hemû hevdîtînen me yên dîtir em keniyabûn.

Li vegeerê min pêşî pirtûka wî ya ceribandîne xwendibû.

Divê ez li xwe mikur bêm ku wî kurdê camêr bi nivîskariya xwe ya bimirê û muhteşem ez heyîrandibûm.

Min ew qas jê nedipa.

Diyarbakir, malên wê yên kevn, kuçeyên wê, darên hinarê û mirovên wê kesekî din wiha nenivîsiye.

Dê careke din bibe, ez ji wê jî ne bawer im.

Bi hostatiyeke mezin û bi hezkirineke bêhempa wî vedigot.

Piştê min romanên wî yê ku her yek wekî destanekê ne, dramên li erdnigariya kurdan bi serê mirovan de hatine, lê her yek dramên mirovayiyê yên navnetewî ne xwendin.

Wî ji vegotina mirovan hez dikir.

Û bi rik û wêrekiyeke ku jê nayê bawerkirin romanên xwe bi Kurdî dinivîsandin.

Xwedî li zimanê ku hatî qedexekirin, pincirandin û piçûkistî derdiket, kurdiya ku tim bi "zimanê

devkî" dihate tawanbarkirin kire zimanê "wêjeyî" wî, kire zimanê edebiyatê û ebedî dikir.

Bêbextî lê hate kirin.

Hemnîjadên wî jî gelek salan bêbextî lê kirin. Bi neheqiyê mezin û bêwîdanî ew tawanbar kirin.

Xwedî li pirtûkên wî derneketin.

Wan, ew jî di zehmetiyên hemû nivîskarên mezin re derbas kirin.

Û wî li ber xwe da.

Ji kesekî re nebêje jî, di piştê wê kubarî û nefsbîçûkiyê de veşêre jî, wî di dilê xwe de dizanibû ew Homerosê kurd e û ew bi sebir li benda erêkirina jiyane bû.

Di dawiyê de gelê wî jî lê xwedî derket. Ez bi kêfxweşî hîn bûbûm ku ji bo xwendevanên wî pirtûkan bidin înzekirin bi saetan li bendê mabûn.

Piştê jî xwe gihand xwendevanên tirk jî.

Gelek welatên Ewrûpayê jixwe wî nas dikirin.

Tam wê bigihîştê miradê xwe, bedena wî lê îxanet kir.

Nexweş ket.

Li hember jiyane çawan disekinî, li hember nexweşiyê jî wiha sekinî

Nefsbîçûk, kubar û bibiryar.

Min hîç nebihîst wî lome kirin.

Tew lome nekirin.

Mineta jiyane, bi bişîrîna ku di nivîskarên mezin de tim tunebe jî, lê bi tewekulek di mirovên gewre de tim tê dîtîna pêşwazî kir.

Bi baweriya min, tiştê ku wî ji nivîskarên mezin cuda dike jî ev e.

Di heman demê de mezinbûna mirovekî.

Niha li bajêrê ku pir jê hez dikê ye.

Li bajarê ku "jiyana duyemîn" dayiyê bi kêfxweşî dijî.

Ew, Homerosê kurdan


Nivîskar û mirovê mezin.

Min ew nas kir.

Min ev şansê herf mezinê yê jiyana xwe dît.

Lewra mirov, li darê dinê, tim rastî nivîskarekî ku dê navê xwe li dîrokê binivîsîne nayê.

Ji bo ku mirov bibe xwediyê rûmetêke wiha, divê yekî wekî Mehmed UZUN nas bike.




DI DEMÊN ZINCÎRKIRÎ DE KARÎNA (QUDRETA) GOTINÊ

Şeyhmus Diken /

Ji Tirkî Werger: Behlûl Zelal

"Ji bo gotinekê hatim û ez ê niha wê bibêjim. Tiştên ku îro min bi tena serê xwe kirine, siberoj dê ji girseyan olan bidin. Tiştên ku niha ji tenê yek dil dibêjim, siberoj dê ji hêla bi hezaran dil ve bê gotin."

Xelil Cibran / Gotin



Piştî bi qasî sih salî, min romana Mehmed Uzun a bi navê "Bîra Qederê" xwendibû û min hestên xwe bi riya nameyekê jê re nivîsandibû. Ji Stockholmê zû bersiv dabû. Di bersîva xwe de gotibû ku; "erdnigariyeke wisan ku bêdîlşewat rûmetên xwe dirûxîne kême peyde dibe."

Ez li ser şopa vê gotinê meşiyam û min ceribandinên Mehmed Uzun, pirtûka bi navê "Demên zincîrkirî, peyvikên zincîrkirî" ji nû ve xwend.

Hê di destpêka pêşgotinê de Mehmed Uzun dibêje ku; "Êdî min hêviya xwe ya ku dê sedsala bîst û yekem ji sedsalên dî cudatir be, winda kir. Rûdanên sala pêşî ya sedsala nû, bi awayekî vekirî derxiste holê, bê ez çi qasî xelîtîme, çi qasî ez di hêviyên xwe de xeşîm û kawikî me. "Demên zencîrkirî" ku ceribandina pirtûkê ya yekem e, bi sedema ku di sala 1999an de bajarê Weimar bûye paytexta çandê ya Ewropayê, hatiye nivîsandin. Çarçoweya ceribandinê jî li ser mijara "divê sedsala nû çawan bibe?", ramaneke xweşbînî ye. De îcar binihêrin, di vê sala yekem a ku em dikevîne "Hezarsalekî Nû" de, li cihanê û li Tirkiyeyê neyiniyên wisan pêk hatibûn ku Mehmed Uzun, bi pêşgotineke wiha reşbînî derketibû pêşberî xwendevanan. Bi rastî, piştî van rûdanan, ez

Diyarbakir



nikarim mafê jî nedimê.


Vê ramana xwe, belkî jî ji bo ku pihê bike, didomîne û bi ser ve zêde dike; "ji bîrdoziya rûşûstî, êrîşkar, otorîter re ku ji bilî dahatûyeke tarî pê ve tu tiştî ji me re nake, tenê tiştek heye ku divê em bibêjin: Tiştê ku hûn dixwazin tune bikin, dahatûya me ye." Li gorî baweriya min, tiştê ku ceribandin lê hûr dibin, ev e.

Di serê havîna sala 2000î de ku ceribandin bi navber hatine nivîsandin de, ez çûbûme Swêdê, Stockholmê. Seranserê rojekê ez li bajarê ku digot bajarê min ê duyem e, gerandibûm û tevîneka vî bajarî ji min re vegotibû. Bêrawest Stockholm û Diyarbakir vegotibûn, gotibû: "di jiyana xwe de, ji gelek tiştên ku min xweziya xwe pê anî, ji gelek tiştên ku ez di bin bandora wan de mame, ji gelek tiştên ku min ji xwe re kiriye mestereyê herî girîng, bajarê kevnare Diyarbakir e." Dubare kiribû ku du navendên ku Mehmed Uzun, bi saya wan bûye Mehmed Uzun, Diyarbakir û Stockholm in.

Dema em li 'Gamlastan' ku belkî jî tevîneka Stockholmê ya niştocihiya herî kevin û ya dîrokî ye digeriyan wiha gotibû: "tu dibînî bê ev der çi qas dişibe Diyarbakirê." Dema em li kolanên bi parkeyên kevirî çêkirî digeriyan, me her duyan jî gotina xweser a Gombrowicz ku dibêje "sirgûn, goristan e" bi bîr xistibû. Lê çawan be min dizanibû ku Mehmed bûbû hosteyekî ku dikare ji mişextiya goristanê, wêjeke zindî ya ku dijî bi-afirîne.

Têgihîştim ku Mehmed, di wan kolanên Gamlastanê yên teng de, di wan zivistanên bakur ên sar û

Stockholm



ku naqedin û qet naşibine kîşwera erdnigariya me de, Diyarbakira xwe afirandibû. Bûbû çavkaniya hêza ragirtina mişextiya Diyarbakir-Swêdê, bûbû çavkaniya hêza xwenûkirinê, bûbû çavkaniya hêza xwepêşdebirinê û bûbû çavkaniya hêza ku ji gelek nivîskarên cihanê cudatir be. Nola ku vê angaştê min bipewitîne, digot: "ku Diyarbakir nebûya, ku Diyarbakir wekî siyekê ez neşopandibûma, ku Diyarbakir nemelisiya her warê xebata min, belkî dê Mehmed Uzun jî nebûya."

"Di her gavê de Diyarbakirê got, 'li min binihêre'. Li min, li dengê min, li henasa min guhdarî bike. Min ji xwe re bike mestere. Ma ji dîrokê û bi vir ve, li hemberî xeyalên Îskender ku bibe desthilatdarê cihanê, li hemberî rîma Tigranê Mezin, li hemberî êrîşên Romayîyan, li hemberî dek û dolabên Bîzansiyan, li hemberî şûrê Emewîyan ê dudevî, li hemberî xapandinên Abasiyan, li hemberî artêşên siwariyên Hemedaniyan, li hemberî siltanên Selçûkiyan ên bihesp, li hemberî hilweşandin û talanên artêşên Hülagü Khan, li hemberî dagirkariya Tîmur, li hemberî hêrsa Akkoyonîyan, li hemberî fermana Fatih Sultan Mehmet ê ku ji şûr jî tujtir, li hemberî derewên Şah İsmail, li hemberî zordestiya Osmanîyan û li hemberî dilên reş û bêwîdan ên rayedarên demê, ma min li ber xwe neda?"

Min çima ji pirtûkê jêgireke ew qas dirêj kir? Di cih de bibêjim. Di nav cureyên wêjeyê de, nivîsandina ceribandinê ya herî zehmet e. Li gorî baweriya min, zehmettirîn ceribandin jî dilketina bajarekî û ku mirov bajarekî di ruhê xwe de, di bedena xwe de bijî ye. Çarçoweya pirtûkê, li ser Diyarbakirê û li ser bihîstina dengê bajarekî bîrî hatiye avakirin. Vegotina Diyarbakir, gotina bajarê



ebedî, gotina serpêhatiya bindestan, vegotina efsane, riwayet û gotegotan, karê ceribandinên wisan e... Gotina "yê ku temenê mirovan pêk tîne, 'kêlî' ye, yê bajaran jî, 'dewran' e", bêşik li gorî Diyarbekir û li gorî nivîsandina li ser Diyarbekirê ye.


Bêguman 'Dem û gotinên zincîrkirî' ne tenê ji van pêk tên! Tengiyên şayîşa bûna Ewropayî û gotinên tengasiyên, asêyiyên nivîsandina bi Kurdî jî hene di ceribandinên pirtûkê de. Uzun di ceribandinên xwe de dibêje, "kesê ku bi Kurdî dinivîse, mecbûr e bibe Zimrûd î Anka". Çima? Dizane ku heke Zimrûd î Anka di serê her pênc sed salî de xwe dişewitîne û ji nû ve tê dinyayê, nivîskarê ku bi Kurdî dinivîse jî, divê di her carê de xwe bişewitîne û ji nû ve bê dinyayê.



Piştî vê yekê ku Uzun ji nû ve û bi mîsogerî li welêt vegeyriyaye, bi rika ku nexweşiya xwe ya zalim têk bibe, di gava ku ji cihê ku lê razayî ye li Surên Diyarbekirê, ku hêzê ji rawesta wan werdigire, dinihêre, ji navê nexweşxaneyê ku tê de

razayî ye jî binavkirî dema ku em ji nû ve li gotinên VENÎ VÎDÎ û Xelîl Cibran vegeyin e. Xelîl Cibran dibêje ku; "Li min guhdarî bikin ey keç û kurên welatê min; li ser van gotin û dengên ku min bi riya dengê rihê xwe re, ji we re şiyandiyê biramin. Di nav sînoren dilên xwe de, ji wan re cihekî vekin." Gelo, Cibran û Uzun hev û din dinasin? Belkî jî, di tunela demê de. Çawan be, her du jî, hewl didin ku kilîdên zingargirtî yên gotinên zincîrkirî yê heman erdnigariyê vekin, li hemberî demê...

A niha Uzun dibêje; "Ez hatim, min dît, min li ber xwe da û min têk bir"...




FELEKA ME XAYÎN E

Îhsan Colemêrgî

Kekê Mehmed, ev sê sal in em bi malbatî hatine Wanê. Mala me nêzikê wargeha Ûrartuya kela TUŞBAYE ye. Ez û Besê îsal havinê li benda mêvandariya te û Zozanê bûn. Min digot ger hûn bibûyana mêvanên me; piştî xwarineke doxebaya Bahdînan, em ê pêşiyê biçûna serdana gorên qralên Ûrartuya SARDÛRÎ, ÎŞPIÛNÎ û ARGÎSTIYA. Ên bi keda milan ve li bedenên kevirên kela TUŞBAYÊ hatî kolan. Piştî em ê daketîbana "Qada Pîroz." Cihê dêlindêza kewalên ji bona 79 yezdanên Ûrartuya hatî gorîkirin. Me yê wêneyek ber binê nivîsara SARDÛRIYE II. a li ser khêleber (stel) a kevirê bazalt hatî nexşandin kêşabûya. Ew Sardûriyê gotî: "Ez qralê qrala, qralê cihanê me." Ew Sardûriyê ber Asûriyên koledar serê xwe ne çemandî û serdemê desthilatdariya xwe de bûye rûmeta eşîrên Zagrosî, yên ku bingêhê xwe de HÛRRÎ.

Dawiya geriyana kela TUŞBAYÊ, me yê berê xwe zivirandibûya bajarê ALNÛNÛYÊ. Anku Edremîta îro. Nav rêz û baxên qral MENÛA ji keça xwe ya nazdar TIRARÎA ye re çêkirî. Ew baxên balkêş û pêşberî çiyayê SÎPANE XELATÊ. Ew Sîpanê evindarên dilsoj û dilkovan XECO û SIYABEND dayî ber hembêza xwe. Me yê ji dûr ve hûr û hûr lê temaşa bikira. Ew Sîpanê demsala havinê de jî sertarên wî di nav mij û moranê de. Geriyana derdorên Girava Wanê; me dê serdana Dêra Axtamarayê ve dawî bikira. Ew dêra sedsala 10. de bi aliyê avahîsaz Keşîş Manûel ve hatî avakirin. Ew berhema dîwarên wê wêneyên rêveberên ol û olrêyên Mezopotamyayî yên qedirbilind ve hatî xemilandin. Ew perestgaha va ye 90 sal in bêmêvan, ber bi mirinê ve hiştî û di nav berxwedanê de. Ez bawer im ew berxwedana wê dê biçûya xweşiya te jî.


Nivîskarê xweşdivî, di hizira min de bû ku piştî dîtina Sûlava Mûrادیه, em kêleka deşta



ÇILDÊRANÊ ya birîndarê şûrên Osmanî û Safeviye de derbazî BAZÎDIYÊ bibûyana. Çûbûyana serdana gora XANÎ yê nemir. Ka wî çawan mîna ZÎÛSÎDRAYÊ Sûmerî, ÛTNAPÎŞMIYÊ Babilî û NÛHÊ Mezopotamyayî qesira Îshak Paşa ji xwe re kirîbû keştî, lê siwar bûbû û berê wê zivirandibû nav pêlên rûbarê DÎCLE û FIRAT. Min dixwest ew berhema nav û deng ji me dîsa nêzik da bidîta. Xanî bûya, çî keştiya xwe ya li ziman û çanda Kurdî dayî barkirin, li ber bedenê BIRCA BELEK dabû rawestandin? Wî jî bo nivîsîna serpehatiya MEM û ZÎNÊ ber kîjan sedemê wargehê KARDÛKIYA yê herî kevna CIZÎRA BOTAN bijartîbû? Ma wî dizanibû neviyê binemala AZÎZANIYA yê zimanzan û rewşenbîr CELADET BEG, 250 salan piştî mirina wî dê wî "pexemberê gelê Kurd yê netewî" bidaya pejiwandin û nasandin?

Biraderê hêja, rastî karê te kirî ji yê filozofê Kurd kemptir nîn e. Te jî berê co, ava ziman û çanda pênasiya Xanî "bê xeyîdar" zivirande ser deştên Mezopotamya ye yên kedxwiran ew hiştiye tene û beyar. Ji ber wê xebata giranbiha li ber xwe bide û


dilê xwe şad û bextewar bigire. Rêzdar Uzun, hem gera me ya li herêma Hekariyan jî nivî mabû. Te par carekê di telefonê de gote min "ez ê bême herême." Lê tu nehatî. Ez îsal jî rojekê yên biharê çûme şûnwarê evîna Cembelî û Binevşa zozanê bedew BERÇELAN. Ew kêrî, bask, banî, dol, newal, kevî, mêrg, çimên, kanî, nêrgiz, asmîn û beybûnên te 25 pûşper di sala 2002yan de dîtî pirsra te ji min kirin. Avên wê co ya hevala te Zozan lê bazdayî û ketinê wê em kenî xistî yên zelal, disa di nivîna xwe de bêtirs û lez diherikîn. Sosinên doranên co ê, ber bawezîna hûnik û sivik mil dabûne hev û govend dikirin. GOLA LÎSÎ û GOLA SEYÎDXAN jî daxwaza dîtina te ji min kirin. Dêra KOÇANÎSÊ ya olrêya Nasturiyan a navendî jî ku pênuşa te ya xurt dê ji bona bêxwedaniya wê çî binivîse, ji dûr ve çavên xwe li te gêrand. Hêviya gişt perestgahên Asûriyan ên di bilindahiyên çiyayên Hekariyan de hatî avakirin, ew bû ku te dîsa ji nezik de bibînin û binasin. Min gelek dixwest ku em bi hev re biçûna serdana qesra binemala NÊHRIYÊ jî. Ew dergûşa Seyîd Ûbeydullah û kurê wî Seyîd Ebdulqadir tê de hatî hêjandin û mêjandin. Bila te çend rêzik jî li ser rewşa we ya wêran û kambax bûyî reş bikira.



Dostê jêhatî; dîsa jî xwe xemgîn neke. Hatina bayê felekê, feleka xayîn, a bêwext ji bo me Kurdan qedîm e. Ew lênehatin kevneşopiyêke dîrokî ye. Gelê Kurd berxwedana vê jiyana xwedaye domandin. Ez bawer im tu jî di nav berxwedaneke dijwar de yî.

Li gorî berhemên nivîsiyên herî kevna; yekemîn car qralê Sumeriyan, yê bajarê ÛRÛKÊ KEL-GAMÊŞ derketîbû rêwîngiya peydekirina dermanê nemirinê. Ew kulîlka li ser pêşniyariya ZÎÛSÎDRA ê mirov ji tufanê rizgarkirî, wî bi mêrxasî ji binê deryayê derdorên GIRAVA DIL-MONÊ anîbû der. Lê hê wî ne xwarî ew kulîlk ji bo pelîseyê marekê. Li gorî hin gernasana "ew jî peyamek bû Yezdana dayî giyandaran." Ji wê rojê vir ve lêgeriyana dermanê nemirinê berdewam e. Jixwe tu nemir î. Te di demeke kurt de hejmara berhemên xwe zêde kir û navê xwe xist listeya nemiran. Ji bo ku çend xelekên din li wê zincîrê zêde bikî li ber xwe bide. Jixwe berxwedan di hejîte te.

Bi hêviya saxberî, tenduristî û nojdariyê baş ve ji bo hemû dostên binemala Uzun a silavên germ.



LIBERXWE- DANEKE BÊEMSAL

Keya Îzol

Mehmed Uzun li hember nexweşiya xwe ya giran ji meha nîsanê heta îro ketiye nav têkoşîneke bêemsal û li ber xwe dide.

Ji roja ku hat zanîn Mehmed giran nexweş e ez wek hevalê wî yê zarotiyê li cem wî bûm. Maratona wî ya ji bo jiyane ji Swêdê dest pê kir ji bo demeke kurt ji Bostonê derbas bû û piştê dîsa Karolinska û herî dawî jî hatina Diyarbekirê. Wan rojên dramatîk ez pê re bûm.

Em hemû kesên ku şev û roj pê re bûn her car li hêviya xeberên baş bûn. Carinan îşaretên gelek biçûk jî dikaribû me bixista nav hêviyeke mezin. Lê pir caran ew hêviya biçûk û mezin cihê ji bo reşbîniyê berdida. Xemgîniya me careke din geş dibû û me heman pirsî careke din ji xwe dikirin. Çima, gelo çima di emrekî ciwan de trajediyêke wiha hat ber deriyê Mehmed Uzun? Dêrdorên Mehmed çi qas xemgîn bibûna bila bibin jî wan xemgîniya xwe her car ji wî vedişartin. Wî pir caran tê digihîşt ku em xemgîn in û dixwest me teselî bike û digot; "Hûn meraqan nekin hûn ê bibînin ez ê baş bim." Ji ber sebebên ku îro baş tî zanîn, dermankirina Mehmed li Swêdê ketibû xetereyê. Dixtorên wî nedixwestin kemo-terapî dom bike. Li ser wê Mehmed biryar da ku êdî li Swêdê nemîne û ji bo jiyane berê xwe bide welatê bav û kalan. Rojên gelek dramatîk li pêş wî bûn.

Wî di şertên herî zehmet de dikaribû xwe bigîhîne balafirê ku dê wî baniya Diyarbekirê. Ji çavên wî meriv çirûskên bextewarî û hêviyê didît. Ji ber ku derûdorên wî û wî bi xwe jî tu car bawer nedikirin ku em ê bikaribin xwe sax û selametî bigîhînin Diyarbekirê.

"Ez ne ji bo mirinê lê belê ji bo jiyane hatim Diyarbekirê."

Gotina wî rast derket.

Mehmed ji bo jiyane hatibû Diyarbekirê.


Mehmed û Diyarbekir ketibûn nav hemberiyêke dîrokî.

Her du alî jî bi hêza xwe bawer bûn.

Diyarbekir wek paytexta Kurdistanê bi hesasiyeteke dayikekê dil û hembêza xwe ji bo nivîskarê xwe yê mezin vekiribû. Ji her derên Kurdistanê bi hezaran meriv li ser navê Diyarbekirê xwe ji bo tendurîstiya wî seferber kiribûn. Dîcle û dîwarên Diyarbekirê bi efsûnên xwe yê bisêhr dixwestin şifa bidin Mehmed.

Mehmed jî wek zarokêk biçûk ku bi salan dayika xwe nedîtibe, bi hesreteke mezin û berxwedaneke bêhempa dixwest bersîva Diyarbekirê bide. Her du alî, Diyarbekir û Mehmed piştî zehmetiyên mezin hev dîtibûn û bûbûn yek perçe. Ew baştir ji hev fam dikin. Gava hêza her duyan bigihe hev dê nexweşî jî û zordestiya dijmin jî nemîne.

www.arsiv.kurd.org



MARATON- VANÊ TENYA

Yağob Tilermenî

"Her kes dimire; bira û birazî, yar û evîndar, heval û dost, hogir û rêger, nêz û nas... hemû wefat dikin. Dora min jî hat, niha jî dora min e."


(Bîra Qederê, Rûpel: 7)

Mehmed Uzun, di qada wêjeya Kurdî de maratovanekî tenya ye ku di pêşbaziya sed metreyî de ne li nik wî, ne li pêşiya wî, ne jî li paşiya wî tu maratovanên din tune ne. Dema maratonek yekkesî li dar be, dê bezokên din çi qasî karibin cihekî ji xwe re di vê pêşbaziye de zêft bikin? Ma ne ev pirsgrêk



e ku ji serê salên 1990î û vir ve ye ku di rojê wêjeya Kurdî û wêjevanên kurd de ye? Ma ne ev nakokî ye ku Romannûs Mehmed Uzun bi berhemên xwe yên hêja di rojê cîhana wêjeyê de ye, lê nivîskarên din ên wêjeya Kurdî nikarin bi tu hawî derkevin ser textebana wêjeya cihanê... Ji pazdeh salan zêdetir çêbû ku ez wêjeya Kurdî bi rêya kovar, rojname, pirtûk û internetê dişopînim. Bi dehan nivîskarên wêjeya Kurdî, bi bengî dinivîsin, ji bo dewlemendkirina pirtûkxaneyê Kurdî hewl didin, nivîsarên wêjeyî di kovar û rojnameyan de belav dikin; lê nivîskarên bakurî fena Mehmed Uzun nikarin di ber deriyê qada maratone re jî bibihurin. Ez vê baş jî dizanim ku nivîs û wêje zû bi zû bi rûyê her kesê pênuşgir nabîşire. Dîsa ez baş dizanim ku nivîsar ku ne deqên afirandî be û xususiyeteke nivîskar di berhemê de tunebe, tu car nikare têkeve jiyana xwendevanên wêjeyê. Nakokiya li pêşiya nivîskarên Kurd, ne qelsnivîsandin û nezaniya wan e, ne ku nikarin xwe bigihîjin derûnî û ruhiyeta xwendevanan e jî; berovaci van tiştan, kevneşopiya ku di nava kurdan de bûye wekî nexweşiyeye vegirtî û roj bi roj belav dibe, nahêle ku navine din derkevin pêş: Ji ber ku hemû tişt ji bo siyasetê ye!

Ji wexta ku min bihîstiyê birêz Uzun bi nexweşiyeye xedar ketiyê, ez bi rêya empatiyê wekî afirînerêkî li wî difikirim û mîna her xwendevanekî heyfa xwe tînim ku dê hîna gelek berhemên nemir biafiranda. Çawan ku mirin îro jî bo nivîskar wekî têgeheke berbiçav û zindî ye, ez bawer im şerê mirin û nivîskar ji destpêka nivîsina wî û heta îro jî didome. Ma ne ev karesat e ku mirov dizane dê taliya jiyana wî/ê were? Ma ne destana nivîskî ya pêşîn a cihanê **Gilgamêş**, lêgerîna nemirtiya mirov vedibêje? Ma ne ew hewldan e ku nivîskar pênuşa xwe wekî şûrekî li hemberî mirinê dihejîne û berhemên ku dê navê wî/ê nemir bikin, dinivîsîne? **Arthur Schopenhauer** feylesof ku di gelek berhemên xwe de li 'mirin'ê kolaye û lêpirsiye, heta dawiya jiyana xwe ya nivîsînê di vî warî de gelek aforîzmayên girîng afirandine. Di cihekî de gotiyê, "Ez ramana ku dê piştî demeke kurt kurmik bedena min bikurîsin de yax dikim, lê ramana ku dê profesoren felsefeyê felsefeya min bikurîsin dibe sedem ku ez bivenicim." **Schopenhauer** rûbirûmayîna bi mirinê re bi du rêyan rave dike: Bi rêya hişmendiye (mentiq) û bi rêya ku dê piştî mirinê jiyaneke din hebe



ango rêya olî. Bi vê sedemê ku rasteqîniya mirinê û tirsê ji ber wê, bûye asasê felsefe û hunerê.


Çawan ku her bêhnstendina me ji bo mayîna me ya li jiyane hewldaneke bedena me ye, bizava nivîsandinê jî abadînkirina navê me ye aîdî wê bedenê ye. Li vir nivîs û mirin du destbirak in ku hevaltiya wan bi şerêkî dijwar dest pê dike û dawiyê vediguhere dostaniyeye mayînde. Mehmed Uzun jî di her romaneke xwe de ji vê dostaniyê haydar, pêl bi pêl dolaba xwe gerandiye û merşa xwe hilberandiye. Ji ber ku **Tu, Mirina Kalekî Rind, Evdalê Zeynikê, Siya Evîne, Bîra Qederê, Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê** û herî dawî jî **Hawara Dicleyê** ji bo zeximkirina merşa rengareng dide xuyakirin ku nivîskar her carê di çi pêlikan re hilkişiyaye. Wekî **Schopenhauer** gotiyê, "Rêya ku ji çêbûnê ber bi mirinê ve diçe, di wateya başî û jî jiyane kêfsitendî de her ber bi jêr ve dimeşe; zarokiya ku bi bextewarî xeyalan saz dike, xortaniya bişadî, navoseretiya bizehmet, yextiyariya şikestokî û bi giştî eşbar, îşkenceya nexweşiya dawîn û di dawiyê de êşa mirinê..." Mirov dikare van qonaxên jiyane ku feylesof destnîşan kiriye, di hemû romanên Uzun de bibîne.

Romana **Tu**, romana Mehmed Uzun a pêşîn e. Di Tu de sê heb vebêjer hene: Ez-vebêj, hertiştzan-vebêj (vegötina xwedayî) û dengêkî ku tev li pêşaniyê dibe. Jixwe di romanê de dengê ku tev li pêşaniyê dibe xwîner jî nava romanê derdixê û dibe wargehekî dîtir. Ji ber ku romana Tu, ji honakeke navnivîsarî pêk hatiye, destnîşankirina kesên ku mirine wekî **Lorca, Faik Bucak û Kafka** tîne hawara pêşaniya xwe. Bi vê azîneyê nivîskar xwestiyê bide nîşandan ku kesên mirî nivîskar bin, ger miribin jî, dikarin bi rêya wêjeyê tev li jiyana mirov bibe. Yanê mirina nivîskaran ji hêlekê ve

nemirtiya wan jî rê dide.

Di **Mirina Kalekî Rind** de ku lehengê wî ye kal û kor, "...ew bi şev û roj, bi şagirtên xwe re dixebite ku şagirt hunerên wî fêr bibin û piştî ku wî wefat kir jî hunerên wî bimînin..." (Weşanên Avesta, Rûp: 119) Mirov dibîne ku her hewldanê Kalî ji abadînkirina kar û hunerê xwe ye. Roman bi behsa koçkirina Kalî diqede. Bêjeya 'mirin'ê ku di navê romanê de jî heye, hewla nivîskêr a li derdora mirinê pir xweş eşkere dike. Siya Evîne bi koçekê dest pê dike, "Koç. Bi dû payîza jiyane re koça dawîn. Bêdeng, bêpejn. Wext naxuye, cih û war naxuyin. Yan jî ew dixuyin, lê tevlihev. Hem ev der û hem ew der. Hem niha, hem do û pêr. Hem nêzik û hem dûr." (Weşanên Doz, Rûp: 7) Mirov dibîne ku jiyana leheng **Memduh Selîm Beg**, piştî mirin(koç) a wî vedigere ser behskirina jiyana wî.

Bîra Qedere jî mîna **Siya Evîne** bi mirinê dest pê dike; "Destpêk: Her kes dimire; bira û birazî, yar û evîndar, heval û dost, hogir û rêger, nêz û nas... hemû wefat dikin. Dora min jî hat, niha jî dora min e." (Weşanên Avesta, Rûpel: 7) Jixwe lehengê ku di serê romanê de saloxa mirina her kesî dide, di dawiya romanê de di bîrê werdibe. Romaneke din ku dîsa bêjeya 'mirin'ê dihevine, **Ronî Mîna Evîne Tarî Mîna Mirinê** ye. Beşa ro-





manê ya yekemîn '1. Mirin' e. Baz û Kevoka ku du lehengên sereke yên romanê ne, di rûpelê pêşîn de ber bi mirinê ve dimeşin; "Baz bi vê dizane, ji tecrûbên xwe dizane ku ew ber bi mirinê derin. **Kevok** hê pê nizane. Mîna gelek tiştên din, Kevok bi vê yekê jî nizane; mîna gelek tiştên din, ew naxwaze bi vê yekê jî bizanibe." (Weşanên Avesta, Rûp: 9) Hevoka dawîn a romanê jî mirina her du lehengan salox dide; "Hingî Baz, mîna Kevokê, li ser axa mader a havîna germ, ji erdê hew radibe." (Weşanên Avesta, Rûp: 350) Destpêk û dawiya romanekê ku bi mirinê dagirtîbe, mirov dikare çî qasî nivîskêr jî vê babetê cuda bihesibîne!

Romana **Hawara Dîcleyê** bi jibîrbûyiyan ango bi miriyan dest pê dike. Jibîrbûyî **Biroyê Dengbêj**, jibîrbûyî **Ester**, jibîrbûyî **Mîrê Cizîra Botan**, jibîrbûyî **Apê Xelef**, jibîrbûyî Êzîdî, Suryanî, Keldanî, Nasturî, ehlê **Cizîra Botan**, însanên Hekaran, xelkê Mikus, Wan û Serhedan in ku tên xapandin, qirkirin û koçkirin. Ev kesên ku di wextê wextan de ji dinyaya me koçkirene, ji pêûsa Uzun dîsa ruh distînin û hawara xwe dighînin Dîcleyê. Nivîskarekî ku bi hemû romanên xwe, bi mirinê re ew qasî heşîr neşîr be, gelo dê çî qasî jî mirinê bitirse? Gelo jî her kesî bêhtir nizane ku mirin, rêyeke bêveger e û jî destpêka çêbûna mirov, bi mirov re ye? Gelo hîlbijartina rêya tenêtiyê, nivîs ji bo nivîskarekî ne zirêkekî li dijî mirinê ye? Wekî Schopenhauer di jînegariya xwe de gotiye; "Her dem min hêvî kiriye ku bi awayekî hêsanî bimirim, ji ber ku mirovekî ku di hemû jiyana xwe de bi tenê be, tenêtiya xwe herî baş ew dadigire. Ji dêl-eva ku tev li tolazî û qirdikiyên ku ji bo sewalên duling hatiye hesabkirin bibim, ez ê vegeim cihê ku min lê dest pê kiribû û bi şanaziyeke ku min peywira xwe bi cih aniye ez ê jiyana xwe biqedînim." Dema ku pirtûka feylesof a dawî Par-erga û Paralipomena hat weşandin, wiha got. "Ez pir kêfxweş im ku zaroka min a dawiyê çêbû. Tu dibê qey barê ku min ji bîst û çar saliya xwe de bar kiribû ji ser piştî min daket. Tu kes nizane ev tê çî wateyê." Ma ne nivîskar Mehmed Uzun e ku piştî gelek romanên berhemêke ku bîranîn û jînegariya wî vedihewîne, **Keskesora Giyanê Min** (Ruhumun Gökkuşağı) nivîsandîye!

Wê çaxa wêjeya netewekê, ango wêjeya zimanekî bi tenê ji hêla maratonvanekî di pêşbaziye de be, bi mirina wî maratonvanî hem ew netew nikare di

wêjeya cihanê de cihê xwe bigire, hem jî zimanê wê netewî dê mîna gelek zimanan jî holê rabe. Bi van sedeman; divê ew netew di serî de li wî maratonvanê qedirbilind xwedî derkevin û ligel vê jî, bala xwe bidin ser maratonvanên din jî ku bi meşa kîso tev li pêşbaziye bûne. Romanûsê pêûsxurt û maratonvanê tenya Mehmed Uzun, jixwe bi berhemên xwe 'mirin' têk biriye. Ji qewla wî, bila "Serê xwe meêşîne!"



ROMANNÛS Û ÇÎROKBÊJ MEHMED UZUN

Edîb Polat

Edebiyata Kurdî ew çend bi zargotinê ve girêdayî ye ku, nivîskarek dema hê tevna vebêja xwe dihone, dibe mîna çîrokbêjekî civatan. Mafir ku lezeta zimên di dirûtin û rêzkirina peyvvan, di aheng û lîrîzma gotinê de ye, çî cudahî di nava nivîskêr û çîrokbêjekî nûjen de dimîne? Xasma zimankê wekî yê Kurdî ku tenê bi saya medreseyan û zargotinê xetereya windabûne tîk bîriye, di dema pêşketina nivîskî de dikare xwe ji bandora dengbêj û çîrokbêjan xelas bike? Ji ber van pirsên ku dê werin rojeva wêjeyê, min sernivîsa li jor hîlbijart. Ev sernivîs, dikaribû wekî **"Bandora Zargotinê li ser Berhemên Mehmed Uzun"** jî bihata nivîsîn.

Feqiyê Teyran bi çûkan re diaxivî, **Evdalê Zeynikê** bi qulingekî birîndar re digeriya, Feqî helbestên xwe bi devkî ji avê re digot, Evdal ji quling re di-sitra. **"Dîlber"** a **Melayê Cizîrî** meşhûr e. Destana **Ristemê Zal** li civatan heta Kurd li ser riyê erdê bin dê were gotin, sê şev û sê rojan xelas nabe. Çîroka devkî ya **Siyamend û Xecê** ku bi kilam jî tê gotin di zargotina Kurdî de cihekî xweser girîtiye, **Ker û Kulik** û destana **Dewrêşê Evdî** jî di edebiyata Kurdî ya devkî de bi nav û deng in. Ev berhem pêşek in, rêber in, tam û lezeta zimên, best û hewesa wêjeyê ji nîfşên nû re hiştine. Mîna van, bi dehan berhem hene ku nivîskarên wan vebêja xwe ya ji kesekî re, ya ji ajalekî re an jî ji civatê re gotine. Ev yek, pêwîstiya guhdar derdixê holê û berhemên ji kurteçîrok û romana nûjen dîr dixîne.

Mehmed Uzun bi xwe bi navê **"Dengbêjên Min"** berhem nivîsiye, çî qas di bin bandora wan de maye, bi lêv kiriye. Bi dîtina min hemû berhemên wî li aliyekî, lê **Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê** li aliyekî divê werin nîrxandin. Çima? Ev berhem çîrokeke dirêj e, divê ne wekî romanê lê wekî kilamekê, çîrokekê an çîrvanokekê were şîrovekirin. Tu cudahî di nava wê pirtûka Uzun û çîrokekê de nîn e, ew berhemek ji edebiyata devkî ye, jixwe di bîngeha xwe de mijar wisan e. Lewma min di serî de got Uzun çîrokbêj e jî, ango li rex karê roman-nûsiya Kurdî, divê mirov çêla çîrokbêjiyê jî bike. Her wiha, dema mirov li çîroka **Evdalê Zeynikê** guhdarî dike, mirov ji xwendina wê bêhtir sûde û lezeta hunerî jê digire. Di berhemê de vebêja **Ehmedê Fermanê Kîkî** jixwe çîrokê derdixê holê, di serê de ew dibêje **"Gotina Min"**. Hêj di serê **"romanê"** de wiha dibêje **"Wey li min felekê, Felekê, te çima li min wiha kir? Te kume xwe li min xwar kir, Korbûna Evdalê Zeynikê, kalbûna wî li dinê, ji xwe re, feyde û kar kir."** Dema dest bi mijarê dike, di serê peyvê de ne wekî romanê, lê wekî çîrokekê ji civatê re bibêje, wiha pê ve diçe: **"Guhdar û xwendevanên ezîz, we ji strana wî derxist, belê Evdalê Zeynikê kor bû..."** Wekî ku hin kes li hember wî rûniştibin û ew ji wan re çîrokê bêje, dibêje **"guhdarên ezîz!"** helbet ev ji bo romanê jî ne qisûr e, divê mijarên bi vî rengî wiha dest pê bikin. Di dawiya beşa yekem de wiha dibêje: **"Em ê niha hinekî li çîroka xwe vebin û Evdal li ser Çiyayê Xelatê bihêlin û werin cem bermaliya wî Gulê û serpehatiya evîna navdar a Evdal û Gulê."**

Birêz Uzun bi dîtina wî vê **"romanê"** bi vebêja **Ehmedê Fermanê Kîkî** diherikîne, lewma venaşêre, di gelek hevokan de dibêje **"Em çîrokê dirêj nekin..."** û didomîne, hin rûpelan bi peyvva **"Guhdar û xwendevanên ezîz"** daye destpêkirin. Di **"Hawara Dîcleyê"** cîlda yekem de, gotinek li pêşiya destpêka romanê heye: **Dengek, tiştê li pey wî/wê maye, aha ev e, dengê... Ne hewce ye em bêjin ku peyvva "deng" zargotin e. Ne nivîsek, ne bêjeyek, ne tîpek, çima dengê? Di pêşeka romanê de birêz Uzun wiha dibêje:**

"...Li ber destê sibê, gava çirûskên dawîn ên stêrên şeva ronî jî çûn ava, min li ser kaxizekê navek nivîsî: Biro..."

... Ew gotina min wê şevê nivîsî, Biro, hêdî hêdî, bi wextê, qulipî ser dengêkî. Dengêkî ku nîvê şevan hêdîka dihat û li ber guhê min, mîna pêjneke sivik a bayekî sivik, bang li min dkir; "Li min guhdarî bike, guh bide min... li dengê dengbêjan, li Dengê Dîcleyê, li dengê hez û evînê, şer û pevçûnê, kîn û nefretê, îxanet û hesûdiyê, hêvî û tekoşînê, afirîn û hunerê guhdarî bike..." Wekî hûn dizanin lehengê romanê dengbêjek e, **Biroyê dengbêj e. Jixwe mirovekî ku dîroka Kurdan vebêje, dikare ji dengbêjan dîr bikeve? Biro ji xwe re dibêje ez dengbêjê Dîcleyê me, lewma Hawara Dîcleyê bi qelesa Uzun ew dibêje.**


Hawara Dîcleyê ji heft şevbihêrkan pêk hatiye, ji beşa **"Qendîl"** dest pê dike û dîsa bi **"qendîl"** diqede. Wekî ku me li jor jî gor peyvva şevbihêrkê bi serê xwe bîngeha zargotinê dihone. Ji bo zargotinê sê peyv hene; şevbihêrk, çîrokbêj û dengbêj. Di van şevbihêrkan **Biroyê dengbêj** hunermendê gotinê yê sereke ye. Ev berhema giranbiha ku wekî destanekê hatiye honandin, wekî kilamekî diherike, gelo ne şevbihêrk be, ne Biro be dikare were nivîsandin? Ji ber ku Biro hunermendê civandina dengên Mezopotamyayê ye. Şeweya romanê ne li ser bîngeha jiyana bajarvaniyê, bi tîkîlî û diyalogên lehengan û bûyeran, niqaş û atmosfera jiyana nûjen e, mîna pirtûka **Rojek Ji Rojên Evdalê Zeynikê** ku ew wekî **Dengbêj Biro** bi wasîteya dengbêj **Ehmedê Fermanê Kîkî** diherike, li ser bîngeha zargotinê, bi saya dengbêjan, bi spartina qehremanek dengbêj, bi beşên **"Şevbihêrk"** an hatiye nivîsîn. Şeweya romana **Tarî Mîna Mirinê, Ronî Mîna Evînê** cihê ye, terzê romanek nûjen e, li ser bîngeha serpehatiyeke, serpehatiya du lehengên romanê **Baz û Kevok** hatiye nivîsîn. Lê, dema mirov li romana **Bîra Qederê** dinihêre, romanek otobiyografîk e û li ser bîngeha fotografan (16 Fotograf) hatiye nivîsîn. Navê romanê, romana **Celadet Bedîrxan** e ku tenê ji du hevokan pêk hatiye û nivco maye ji ber mirina wî ya bêwext. **Dengbêj Ehmedê Fermanê Kîkî** dengbêjê malbata **Celadet e.**

Di romana **Mirina Kalekî Rind** de, nivîskar bi kalekî ku ji malbata **"Rindan"** e re dipeyive, sohbet dike. Gotinên gotûbêjê di nava kevanê de hatine nivîsîn, ango bîngeh li ser axaftinê, li ser niqaş û guftûgoyê hatiye ristin. Tesîra zargotinê, kurmanciya devkî di şeweyê romanê de dertê pêş. Uzun di

beşa yekem, di rûpelê pêşî de piştî ku helûmercên naskirina xwe û kalekî **"Rind"** tîne zîman, wiha dibêje: **(Niha min parantêzek divê. Kalê rind, ez divê niha rast bi rast, bi te re bipeyivim...)** Piştî serpehatiye xwe û wî, wekî ku pê re sohbet bike dibêje û romanê bi pêş ve dibe. Beşa duyem a vê romanê dîsa bi hevpeyvinê wiha dest pê dike: **(Kalê Rind, tu dizanî, gava ez gihîştim Stockholmê, min çî kir? Min hîsên xwe yê nexuyayî, tevî gula xwe ya sor, danî ser dîwarê salona mala ku ez tê de rûniştim...)** Û parantêz wiha xelas dibe: **"Belê, Kalê Rind, min ev yek jî got..."** Helbet edebiyata ewil ji gotinê derketiye, çêşn jê zêde bûne, piştî teherên nûjen yê nivîsînê wejandîye. Lewma dibêjin **"Pêşî peyv hebû..."** Ev yek ji bo edebiyata nûjen ne kêmasiyek an qisûrek e ku mirov bêje di wêjeyê de paşverûyî an paşdemayîn e. Na, lê belê teherên nivîsîn hene, roman û kurteçîroka nûjen du cure yê sed sala nozdeh û bîstan in û heta niha ji me re mîrat mane. Ger mebesta nivîskar honandina axaftinan, çêkirina kesayetan û qewimîna bûyerên li bajêr bi awayekî fiktîf be, ew çax mecbûr dimîne ji zargotinê ji çîrok û çîrvanokan hinekî dîr bikeve. **Lezeta zimankê Kurdî** ji mîrata sed salan heta niha di zargotinê de veşartî maye. Li ser bîngeha **"guhbaran"** hatiye avakirin çîrok an romanên berê, lê yê niha li ser bîngeha **"xwendevan"** tîne nivîsîn. Mirov mijarekê ji guhdaran re bêje cihê ye, ji xwendevan re binivîse cihê ye. Ger mirov bûyerekê ji **"guhdarên ezîz"** re wekî dengbêjekî vebêje cihê ye, lê ger mirov jiyana bajarvaniyê, kuçe û kolanan, axaftina du evîndaran li saloneke otelek pênc stêrk bîne zîman, an qala bombekirina Bexdayê bike, tîkîliyên kirêt yê nava sîxur û dîplomatan binivîse cihê ye. **Dengbêjek an çîrokbêjek** nikare bûyerên nûjen, bi zîmanê zemanê berê, bi hêmaya kurmanciya bav û kalan binivîse.

Wekî encam; bandora edebiyata devkî ne tenê li ser Mehmed Uzun, her wiha li ser hemû nivîskarên Kurd dê demeke dirêj bidome. Hetanî Kîngê? Hetanî Kurdî bi berfirehî di dibistan û zankoyan de bête axaftin û perwerdekirin, heta di jiyana bajarvaniyê de, di hemû helûmercan de bête bikaranîn, heta dewleta Kurdan çê bibe, hemû dezgehên wan ên nûjen ava bibin... Berî wê, divê em qîma xwe bi wergerê binin. Wê demê, dengbêjek kilama **Fîltê Quto û Mamê Etmankê**, kuştina **Silêmanê Mistê**, an xayintiya **Elo** ku bi

Koçero re kiriye, Kuştina Şêx Fexriyê Mala Bokarkê li Geliyê Godernê, lehengiya Bişarê Çeto û Mehmedê Dewrêş, Şerê Mala Eliyê Ünîs di Newala Qeremûsê de, di hotêleke pêncstêrk de an di galeriyayekê de, di palazakê de, an li ser înternetê bibêje, an di romanekê de lehengek van kila-man ji dergistiya xwe re bêje, wê çi feyde bike, an dê çi qas di cih de be?



MÎRAT Û CIVAK

Muharrem Erbey /
Ji Tirkî Werger: Lal Laleş

Civak bi jiberkirina modernîtêyê ya motemot nikarin bi pêş bikevin. Hebûna civakan her daim a li ser dika dîrokê, bi bandora rûmetên wan ên qet tîk naçe re tîkildar e. Ger ji hemû tiştên madî û manewî re çand tê gotin, divê wê gavê em li sekna wan rûmetan a di şert û mercên navneteweyî de binêrin. Ên ku Kurdan tune dihesibînin, ên bi înkarkirina wan dixwazin wan tune bikin. Ew kesên ku wan hewl da ji bo ku kevneşopiya edebiyata gelerî ya hêzdar, dîroka devkî, ziman û çanda kurdan biparêzin û xurt bikin qet bi tişteki nehesibandin.

Konfîçyûs belasebeb negotiye “Eger hûn dixwazin welatekî talan bikin ewilî zimanê wî welatî xera bikin.”

Di sal 1990î de dema em li Stenbolê şagirt bûn, me li **Navenda Çanda Mezopotamyayê** ku li Tar-labaşî hatibû vekirin, li pirtûkxaneya refikên wê vala dinerî û diketin xewn û xeyalan. Me ji refikên vala du kitêbên bi Kurdî yê zarokan ku ji 16 rûpelan pêk hatibûn, ji destê hev direvand û dixwend. Me qala ku wê rojek bê wê pirtûkên Kurdî di van refikan de hilneyên dikir, em bi meraq li benda wan pirtûkan diman. Em ji çîrok û romanên Kurdî bêxeber bi meraqdarî li bendê bûn, “kî ne ew nûserên meçhûl, kî dê bibe nivîskar.”

Hîn zêde sal nebihurîbûn me bihîst ku li Swêdê nivîskarekî Kurd bînavber di zimanê xwe yê zikmakî de roman dinivîse. Piştê em pêhisiyan ku yê bi zimanê xwe yê zikmakî bi meraq romana dixwînin jî pir bûne. Lê belê nizanîm çima piştê yê dixwendin hindik bûn, gava qedexebûn rabû pirtûk, kovar pir bûn, me dît ku tiral bûn û nema xwendin.

Digel vê hat famkirin ku nivîsandina bi zimanekî ku tê înkarkirin û xwendevanê wî kêm e û tu kes qîmet nadiyê bi talûke ye û ji kirina vê yekê re jî wêrekî tê gotin. Îcar Mehmed li hember talûkeyeke wisan li zimanê zikmakî xwedî derket, bû serkêşê karwanê yê ji bo ziman xurt bikin dixebitîn.

Hêja Mehmed, ku hosteyê peyvê bi salan li Swêde sar sirgûn bû, bi xeyalakirina tenûrên welatê xwe germ kir û bêyî ku pênuşa xwe ji destê xwe derxe li sirgûnê nexweş ket. Gewdeyê xwe anî cihê ku dilê wî lê diavê û got ger ez ê bimirim bila ez li welatê xwe li cihê ku ez jê xwedî dibim bimirim. Bi dilariya xwe bêterikandin vegehiya welêt, Mehmed gava vegehiya tenduristiya wî xerab bû, niha başbûna moralê wî re, tenduristiya wî jî tîra xwe baş bûye. Em gelek kêfxêş in.

Gelek tiştên ku wê romanûsê Kurd hêja Mehmed Uzun bike heye. Nexweşî nikare wî tîk bibe divê wî tîk nebe. Mehmedê ku bi salan li hember sirgûnê, zilmê, kotekiyê, înkare, debar kiriye, bêguman ew ê vê nexweşiyê jî tîk bibe, li ser maseya xwe rûnê û romanên bêhempa binivîse, em di vê baweriyê de ne. “Ez ne ji bo mirinê ji bo bijîm tîm” zû bi ser xwe ve were û rabe ser piyan. Ji bîr meke gotina xwe yî ez ê “Amedê bikim navenda çanda Kurdî” Mehmed ew ê baş bibe û wê hîn romanên nû bineqîşîne li dîroka edebiyata Kurdî. Her bijî ji yê mîrateke nemir dihêle ji civaka xwe re. Her bijî ji yê zimanê li ber mirinê yê li ber windabûnê vedijênînin.

MEHMED UZUN Û NİFŞÊN NÛ

Salihê Kevirbiri

Ne şaş bim 1998 bû. Li Beyoğluya Stenbolê, li avahiya Rojnameya 'Azadiya Welat' ku li Kolana Ayhan Işık bû li me qesidibû. Ji rojnameyê 3-4; wekî mêvan jî 2-3 kes amade bûn. Temenê me li dora 18-24 bû. Bi dilekî geş behsa serpêhatiya xwe û zimanê Kurdî dikir. Bi kurmanciyê 'gewr' û 'çêjdar' dixwest me bibe 'dîwan'a serpêhatî, kilam û lawjeyên berê. Digot, 'Ji klasîkên xwe hez bikin! Xwe ji Zargotina Kurdî nedin alî. Guhê xwe bidin awazên dengbêjan!..' Yekem car min Mehmed Uzun li wê derê dît. Tiştê ji civata wê rojê di bîra min de ma, hêviya wî ya ji nîfşên nû bû. Hewl dida û dixwest bide fêmkirin ku 'çîmento' ya zimanê Kurdî zarok û nîfşên nû ne. Her wiha car caran bêjeya 'nîfşa 90' î bi lêv dikir, dînanî ziman ku ev nîfşa navborî dê di 10-15 salên bê de karên ku di 100 salî de nehatine kirin bike...

Vê demê di mejiyê me de ekoleke ku her dem me bi şanzî behsa wê dikir hebû: 'Ekola Swêdê'. Bi awayêke din ev ekol, 'Ekola Kurdî' bû. Behsa bi dehan navan dihate kirin ku bi salan e ji bo kurmancî, soranî, hewramî, kirmanckî tédikoşyan. Me rojnameyê xwerû bi Kurdî derdixist. Li navenda Stenbolê, car dibû bi hefteyan li avahiya rojnameyê gotieneke 'Tirkî' nediket guhên me! Ev helwestek bû... Her tişt bi zimanê Kurdî bû. Rabûn, rûniştin, xwarin, vexwarin, nirxandin, sohbet her tişt bi Kurdî bû. Em ji rojnameyê derdiketin, zimanê Kurdî 'pere' nedikir! Li saziyên kurdan ku ji bo geşedana ziman, çand û hunera Kurdî hatibûn vekirin, axaftin -bêyî nepixandin- ji sedî 70-80 bi zimanê Tirkî bû. Heyf e ku car caran zimanê Kurdî dibû mijara gazine û henekan jî! sedem jî, Xwedêgiravî em gelek 'hişk' û 'tûj' in û çima zimanê Kurdî li ser mirovan ferz dikin, çima carinan em jî tev li nîqaşên bi zimanê Tirkî

nabin?! Ji ber vê yekê, ji bilî dewletê; ku bi dadgeh, girtin û kotekiyên xwe dixwest me ji karê me bike, me bi 'rêhevalên xwe' re jî gelek caran têkoşîna zimanê Kurdî dida!.. Van agahiyan li ser Ekola Swêdê dibêjim. Ji ber ku me 'xemxuriya Kurdî-kurdewarî' hildabû ser milên xwe, Kurdîxêvek, Kurdînivîsarek, Kurdîguhîdarek, Kurdîbêjerek li ku hebûya delalê ber dilê me bû. Madem wisan bû, kesên di nava wê ekolê de bûn û bi salan bû ku li 'Skandînavyaya Sar', zimanê dayika me geş dikirin, delalên ber dilên me bûn! Helbet dê yek ji wan jî Mehmed Uzun bûya...

Di sala 2000î de; di demsalên zivistan û havînê de, li **Stockholma Swêdê** gelek caran bû qismet ku guh bidim dîtin û ramanên wî. Mêvanê Rehmetyê **Mehmûd Baksî** bûm û me li ser kitêba wî ya dawî 'Serhildana Mala Eliyê Ûnis' kar dikir. Baksî gelek nexweş bû, lewra kêman caran be jî hevalên wî dihatin serdanê. Kekê Mehmed Uzun yek ji wan kesan bû. Terka Baksî nekiribû! Di dema dawî de nexweşiyê pişt li Baksî şikandibû, lê karesata mezin ew bû ku, bi sedan 'heval' û 'hogir' ên wî pişt xwe dabûnê. Çi jî dibe bila bibe, ke-sayeti û pozîsyonên wî yên siyasî çî dibin bila bibin, Baksî 'heta tu bibêjî' kurd bû, kurdewar bû. Bi nêrîna min ev bû sedem ku heta roja mirinê jî Mehmed Uzun ligel wî ma. Ji çend rojan carek dihat, tiştên ku me nivîsandibû dixwend, dîtinên xwe bi me re parve dikir. Bi taybetî ji beşên ku tê de kilamên dengbêjan derbas dibû, gelek hez dikir. Carinan di xwendina hinek beşan de wekî zarokan şa dibû, bi hevokan dilîst. Ji xwe paşê ji kitêba navborî re pêşgotinê jî nivîsî ku li Stenbolê çap bû. (Serhildana Mala Eliyê Ûnis, Weşanên Welat, 2000).

Gelek car çû û hat. Li Stenbolê hema bêje her cara dihat min bi awayekê xwe digihandê. Li civatan, li şahiyên, li îmzekirinên pirtûkan, li ser piyan be jî me bi hev re sohbetê dikir. Ji min re digot 'Nivîskarê Dengbêjan'. Pê kêfxweş dibûm. Dema min jê daxwaz kir ku li ser kitêba min a li ser 'Karapetê Xaço' pêşgotinê binivîse, bi dilekî geş pejirandibû. Min jê re kitêb şandibû Stockholmê. Di nava çend rojan de pêşgotineke xweş û herik-bar nivîsandibû û şandibû.

Ji min re bêjin; 'Mehmed Uzun, bi çî awayî ye di bîra te de?' Dê bersîva min wiha be: 'Mirovê ku ji

ciwanan pir hez dike. Nexasim ji ciwanên ku bi Kurdî re radibin, bi Kurdî dinivîsin û bi Kurdî distrên!..' Tiştêkî din heye di dilê xwe de nehêlim. Bi qasî hezkiriyên wî hebûn, kesên jê nefretê dikirin jî hebûn! Hesûdî ye an jî tiştêkî din e nizanîm, lê rastî gelek civatan hatime ku êrişên gelek dijwar li ser Mehmed Uzun dikirin. Helbet rastî gelek durûyan jî hatim ku li cem wî 'heyran' û 'qûrban' bûn, lê li pey wî hewl didan gora wî bikolin! Me tim jê hez kir. Qesta min ji bêjeya 'me', 'nîfşên nû' ye. Nîfşên nû tu caran durûtî li Mehmed Uzun nekir. Li gorî çavdêriya xwe dibêjim; di nava rêjeya kesên ku pirtûkên Mehmed Uzun dikirin û dişopînin de, rêjeya ciwanan, rajortirîn rêje ye. Ji îmzekirinên pirtûkên wî, ji çend semînerên wî yên li Diyarbekir û Stenbolê vê yekê dizanim. Her wiha ji hatina wî ya dawî bo Diyarbekirê jî ev yek zelal û berbiçav e. Ciwan û nîfşên nû, îro bi saya kesên wekî Mehmed Uzun, zêdetir ji zargotina xwe, ji dengbêjan û ji serpêhatî û klasîkên Kurdî hez dikin. Ez bixwe hatina wî ya bo Diyarbekirê, wekî 'Dawet û zemawinda wî ya duyem' dinirxînim. Govendeke gelek mezin li Diyarbekirê li dar bû ku sergovendên vê govendê ciwan û nîfşên nû bûn!

Gelek balkêş e, yekem car e ku Kurdan, di saxtiyê de nirxekî wisan mezin da nivîskarekî xwe... Bi hêviya ku ji îro û pê ve jî, Kurd nirxa van nirxan bizanibin...

Gotina dawî; Mehmed Uzun bi xêr hatî mala xwe. Em nîfşên nû şopînerên te ne...



Ji Weşanên Lîsê

LİS

NIVÎSKARÊ KU TEVLI LEHENGÊN KU WÎ AFI- RANDINE BÛYE

İrfan Uçar /

Wergera Ji Tirkî: Mem Mîrxan-Omer Dilsoz

Ez qurbana we me...

Hebû tunebû. Zemanek ji nav zemanan di navbera du çeman de gelek dijiya. Êşên vî gelî pir, bextewari yên wî hindik bûn. Dêrdê wî gelî yê sereke di halê xwe de jiyîn bû. Lê yên dûr û yên nêzik nedihîşt ku ev gel di halê xwe de bijî. Xwende û nivîskarên wî yan dikirin zindanan, an jî sirgûn dikirin.

Yê me jî berê kirine zindanê, piştî ku ji wir derketiye jî berê wî dane sirgûnê. Tûrê xwe daye piştî xwe, berê xwe daye oxirfelekê û terka welatê xwe kiriye. Dûr çûye, nêzik çûye, çiya û newal li pey xwe hiştiye û gihîştiye welatê bêroj ku malên wê ji cemedê bûne. Havîna vê zivistan, zivistana wê cemed bûye. Bi yên dinivîse re peyiviye, yê peyiviye nivisandiyê. Di şevên dirêjên zivistanê de Tîna Roja ku hestiyê mirov germ dike fikiriye. Dema serê xwe daye ser balîfê tim xewnên welatê xwe dîtine.

Mirovên welatê sar gelek ji yê me hez kiriye. Mêvandariya herî xweş nişan danê, xwarinên herî xweş danê û ew li cihê herî baş razandine. Lê piştî

bihurîna şevê ew dîsa bi tena serê xwe maye. Rojek hatiye, yê me zewiciye, bûye xwediyê zar û zêç, lê kesera wî bi dawî nehatiye. Tişteki ku tenêtiya wî sivik kiriye; Nivîsandin... Nivîsiye, nivîsiye bi qasî bejna xwe pirtûk nivîsandine. Her roj bi zimanê ji dayikê xwe fêr bûyî bi lehengên pirtûkên xwe re axiviye û xemên xwe pê revandine.

Rojekê ji rojan nexweş ketiye û ew birine ser doxtoran. Wan gotiye, "Derdekî bêderman e, tişteki ji destê me nayê." Nas û dostên wî gişk seferber bûne. Memleket bi memleket ji bo wî li dermanan geriyane. Li deriyê kîjan hekîmî xistine, çûne kîjan nexweşxaneyê, ji wan gotine: "Derman tune ye." Der nehiştine geriyane, heyf û mixabin... Wan gotiye, Loqmanê Hekîm jî nikare çî dermanan jê re peyda bike. Yê me jî gotiye, "Hebî nebî dermanê min welatê min e, derd li vir e lê derman jî li wê derê ye." Li xerîbiya ku bi tûrê li piştî xwe çûyê, bi nexweşiyêke bêderman jê vegeriyaye.

Li dilê welatê wî ew li nexweşxaneyekê razandine. Her kesê hêviya xwe jê buriye, dia jê re kirine. Ji aliyekî din ve jî ji bo ku ew baş bibe her kes seferber bûye. Mêşhingivan li şûna hingiv jê re şîr çêkirine, teyran jî hêk. Rojê silava xwe, dims û tîrêja xwe jê re şandiyê. Ji bo bibe derman; Çiyayê Simbilê hingiv, jafî û penîrê sîrik, Sîpanê pincara xwe, Araratê jî qalibek cemed di çilê havînê de bi keçikên herî delal re, jê re şandiyê. Ji çar aliyên welat millet hatiye serdana wî û kêfa wî xweş kirine. Pîr û kalên ku nikaribûne bîn jî, bi wan re silav û diayên xwe şandine. Hinan jê re, ji riya deh rojan dîr ji çî n û maçînê çavînok, hinan jî nivîşt şandine. Ji wî re kêman behsa nebaşan, qencan behsa mirovqencan kiriye. Helbestkaran jê re helbest xwendine, dengbêjan kilam. Zarokan jî ew bi hezkirina xwe ya pak û paqij hebandine. Yên ku ji koka daran, ji ava çiyar derman peyda nekiriye jî hatine nik ê me û jê re gotine, "Em jî hînî zimanê xwe bûne, mizgînî li te."

Lehengên ku ji nava pirtûka wî nivîsandiye derketine jê re bûne hekîm.

Yê me piştî sê çar heyvan ji derdê bêderman filitiye û gotiye, "Ez qurbanê we me" û tevli lehengên ku wî di kitêbên xwe de afirandine bûye.

GELO BERÊ DIVÊ EM RA- BIRDÛYA XWE PAQIJ BIKIN?

Amed Gökçen /


Wergera Ji Tirkî: Mem Mîrxan

Zimanê Kurdî piştî bédengiyêke dirêj, bi nivîsandinekê -birêkûpêk- derbasî qonaxêke dîtir dibe. Bîranînên ku di guhê me de, di dilê me de bûn hêdî hêdî derbasî nivîsê dibin. Ne bi derengî hema bi xwe re nîqaşên "nivîsê" jî bi xwe re anîn. Me yê rabirdûya îro binivisandana?

Gelo çî qas pêkan e em ê serboriyên xwe, êşên xwe, sirgûn û dîrketinên xwe û egîtiya xwe derbasî rûpelan bikin û xwe bigihînin edebiyata pêşerojê? An em ê bi saya çanda Kurdan a devkî ku derbasî pirtûkan bûye, bêjin wêjeya Kurdî rihekî teze zeft kiriye û axa mirinê çawa ji ser xwe avêtiye înkâr bikin çî qas rast e?

Li hember vê rewşê ne pênûsa xwe sipartibe rabirdû û "nivîsa" li gor vê tevdiqere, ne jî dîroka bav û kalan bidin hêlekê û cografiyaya wînda û lehengên li ser li ser axa wê nagerin nefê li Wêjeya Kurdî dikin. Nedayê jî. Di vê mijarê de, yanê tam jî di navbera nîqaşan de li cihê ku peyên "Kurd", "Edebiyat" û "Siyaset" tê ba hev, di hemû guftegoyan de navê Mehmed Uzun çendîn caran hat bihîstin.

Li derveyî Mehmed Uzun navê herî bi nîqaşê Edebiyat a Modern a Kurdî ye, bi saya van nîqaşan bi riyên dîtir li wêjeya Kurdî nefa wî jî bûye. Lewra -belkî yekemîn car- Zimanê Kurdî bi berfirehî û bi



refleksên xwe rê li ber gengeşiyê vekirin. Yanê yên ku ji Mehmed UZUN hez nedikirin jê hêlekê de jî pirtûkên ku di pirtûkxanaeya wan de bûn dixwendin û didan ber hev, li rexê din jî ji rastiye dîr bi kitekit û gengeşiyên ziman û wergerê hatin çêkirin. Ev gengeşî ne tenê ji hêla wêjenasên Kurd jî hêla Nivîskarên Tirkên ku Wêjeya Kurdî bi rêkûpêk dişopandin jî hatin meşandin. Ev gengeşî li ser bingeha "Wêjeya duh û îro", "Edebiyat a Modern û Nivîskarê Modern" an jî "Tenê dîroka devkî bûye şeweyê edebiyatê" bête meşandin jî, Uzunê ku bi giringdayîna avakirina ziman û di vegotinê de ev organizasyona bi "lezzet" dikaribû bersîva wan pirsan bide.

Lewra Uzun her çî qas wêjeyêke li ser rabirdûyê binivîsîne jî, bi bikaranîna pênûsê, bi fikirîna wê, bi hêrsbûna xwe, bi parvekirina hestên xwe û leheng bijartina wî dem îro ye. Û em her çî qas bêjin em romaneke dîrokî dixwînin jî Mehmed Uzun bi vegotina demê îro dinivîsîne. Kanî û jêdera pirtûkên Tu, Mirîna Kalekî Rind, Siya Evînê, Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê, Mirîna

Egîdekî, Bîra Qederê, Ronî Mîna Evîne-Tarî Mîna Mirinê, Hawara Dicleyê jî piştî xwe didin vê rastiyê.

Her çî qas rexne li dora navê Mehmed UZUN derbas bibin jî, di rastiyê de ya ku tê nîqaşkirin wêje û siyaseta Kurdi bi xwe ye. Bi guherîna pergala dinê re, Edebiyata Ewrûpayê, tevgera yên ku di bandora wêjeya rojhilat de mane, pevçûnên di navbera nîfşan de û bi bandora adet û kevneşopiyên ne tenê Kurdekî ji rêzê, aktorên gengeşiyên bi gotinek din mîjîyê Kurdên din jî tev li hev bûye.


Mehmed UZUN tam li vê derê, di nav vê tevliheviyê de, rewşa ku wî jî wek takekes rexne dikir birik dubare dike û rîsta wêjenas a siyasî dixwe nav hev.

Di hevpeyivîneke xwe ya BIANET'ê de, dibêje "Kurdi zîmanekî qedexeyê û gelek watedar e ku mirov bi Kurdi binivîsîne. Lê hêla din nîmetên "na nebûye" yek bi yek bi yek tene rêz kirin, ketina nav hev, tevliheviya mîjî em dibînin. "yanê ku Kurdi vediguheze Tirkî hinek taybetmendiyê xwe wînda dike. Lewra Kurdi zîmanekî heta dawiyê xweser, heta dawiyê germ û xurt e. Tirkî ev taybetmendîya xwe wînda kiriye. Li gor min gelek sebebên windakirina taybetmendiyên Tirkî hene. Ji zîmanê bazarê bigire heta dive navgînê îdeolojiyên Fanatîk, propagandîstê derewên medyabûnê û ji gelek egerên din (...) Kurdi heta dawiyê zelal, rewan û zîmanekî ekonomîk e. Ji ber ku tenê bersîva pêdiviyên mirovan dide. Kurdi ne zîmanekî bazarê, ne yê dewletê, ne jî yê îdeolojiyên bi quwet e. Ew zelalî, ew delalî, ew sadebûyî ew rewanî hîn di Kurdi de gelek xurt cih digire. Ev avantajê gelek mezin e... A duduyan di Kurdi de dilsoziyan peyvan heye."

Mehmed UZUN di heman hevpeyivîne de bersîva pîrseke din jî wiha dide. "Nivîskariya min cihê ye, ez nivîskarekî cihê me. Divê hûn min û nivîskarên din tevlihev nekin. Li Tirkiyeyê nivîskarekî din wekî min tune ye. Ez bi zîmanekî qedexeyê dinivîsînim. Û ev qedexebûn derbasî her gotineke min dibe. Ez bi wê derûniyê dinivîsînim. Ez vî zîmanî di 18 saliya xwe de di zîndanê de hîn bûm. Mûsa ANTER hînî min kir. Min bi hezar zehmetiyên zîmanekî edebiyatê ava kir. Ez ji bo

nivîskarekî ji bo nivîskariya xwe karibe bidomîne xwediyê tu derfet û navgînan nebûm. Ne dewleteke min çêbû, ne pirtûkxaneyên min, ne zanîngehên min, ne kanalên ragihandinê, ne medyayêke min, ne jî xwendevanên min hebûn. Divê ev hemû bihatana afirandin.

Divê em baş bidin zanîn ku, Mehmed Uzun hosta û zanayê xurt ê ji bo edebiyata kurdi meşrûiyetê qezenc bike ye. Lê belê divê nîqaşên me li ser em çî qas nivîskarê xwe, cografya xwe û zîmanê nas dikin be. Û pîrî caran di cihoka vî kaniyê de reng tev li hev dibin. Em jî di nava vî jêderê de ne, Mehmed UZUN jî.



XÎRETKÊŞ Û PALÊ EDE- BIYATEKE STEWRA: MEHMED UZUN

Omer DILSOZ

Ez jî dixwazim li ser kekê Mehmed Uzun çend tiştan bibêjim, çimkî li gorî min, ew nêçîrvanekî jîr û zîrek ê dangan e; "dengên jîbîrbûyîyan" di nav rûpela tarîxa nenivîsandî de, cara ewil min ji wî bihistin, bi nêza û awazeke kovandar a ku ji nalîna dengbêjan dihate pê. Ew, dengbêjê nivîsa zîmanekî çilmisandî ye.

Gelo çandina axeke kovî ya beyar, bêyî ribsekirin û vewejandina bi salan, çendîn hêsan e? Her ku ez xwe berdidim nav çalên zêhna xwe û li ser vî pîrsê difikirim kekê Uzun tê bîra min. Çimkî wî bi wêrekî kariyê bêje 'erê' ev zevî dikare bête cotkirin û bi taybetî jî gava ku mirov li berhemên wî dinêre her wiha dibîne ku ev yek bi pênûsa xwe jî çes-pandiye.

Kekê Mehmed, di heyameke herî bêdeng a ku dîroka vî mîletî li bin simên bindestiyê de dinaliya, bi cegerdarî dilê xwe da bin barê pênûsê û dest bi neqîşandina "çîrokên me yên wînda" kir. Çawan ku Evdalê Zeynikê bi dengê xwe yê zîz û zelal, serhatî û çîrokên me di stranên xwe de nemir dikirin, wî jî, duhiya me ya nêz, xîretkêş û paleyên jîbîrbûyî yên vî mîletî di wê bêdengiya kore de dariştin ser rûyê kaxizan. Me bêhna 'Xoybûnê' û serkêş û

xîretkêşên wê pêlê di romanên kekê Mehmed de nas kirin. Ne tenê naskirin, belkî jî pê re çûn ber awênaya zêhn û bîrmendiya mîletê xwe û çavê me pê re kenî yek jî giriya... Çimkî ji pênûsa Uzunî me "dengê wan ê jîbîrbûyî" bi hemû hişmeta xwe dibihîst... Loma jî mirov dikare bêje ku kekê Mehmed 'hewara' edebiyateke stewart e jî.

Dema ku wî dest bi kar û barê nivîsa bi vî zîmanê stewart kirî, hingê belkî jî kesê bawer nedikir ku dê bi zîmanekî ku tenê talde û paşxaneyên şaristaniyê jê re hatine vekirin, bibe zîmanê nivîsê û dê deng û nalînen ku di qîrîna Evdalê Zeynikê de nepenî bibin roman...

Kekê Uzun bi rastî paleyêkî bi sebr û xwedan bîr û baweriyeke gelek xurt e, pêşbîn e; çimkî ew pê hesiyabû ku birçîtiya vî mîletî ne tenê ji zîkî ye, bêhtir ji mejiyê û ji bo têrkirina vî mejî jî baş dizanî ku pêdivî bi hubrê heye. Ancax ev mîletî bi hubrê têr bûya. Dêderê herî giran ê vî mîletî xwendin bû, çimkî korefam hatibû hiştin, tarîxa wî hêdî hêdî bi mirina dengbêjan ji ser zîmanan jî nedima û wînda dibû, diviya bi zîmanê xwe berceste bûya ev tarîx... Mehmed ev yek pêk anî.

Kekê Uzun pê li birîna tugirtî dikir û bi xîret û zehmetkêşiyêke bêhempa kurdiya ku stewartê nivîsê bû avis kir. Ber û berhemê xwe da: Romanên giranbuha li pirtûkxaneya vî mîletî zêde kirin; gelek ji me bi tîna kitêbên wî hez ji mîletê xwe kir. Belkî jî ne tenê ev, her wiha kekê Uzun di çîrok û serhatiyên xwe de, em hînî pêrabûna tîrs û tabûyan jî dikirin... Tabûyan çînseliyê, cergebez ên hizir û kevneşopên me di nava kitêbên Uzun de dihatin pêpeskirin û me bi zîmanê xwe jî dikaribû 'orgazm' bibûna...

Kekê Uzun şevçirayekî ji dûr ve diçirûse bû jî. Bêhna welatê bindest ji dûriyê, ji welatê xerîb û xurbetan di sirgûn û derbederiya malkambax de digihand mîletê xwe. Wî mîletê ku dê rojekê 'belkî' bi hewara wî bihesiyaya... Erê, min tenê xwest gotineke min jî hebe li ser Uzun, çimkî ez jî xwendevanekî wî me. Ez bi dilrehetî dikarim bêjim ku Kurdan hewceyî bi gelek 'Uzun'an heye. Çimkî ew xîretkêşekî vî mîletî ye, dengê 'jîbîrbûyîyan' e û berî her tiştî edîbekî dilsoz e. Şareza û hostayê gotina xwe ye.

..... 07. 2006

Diyarî bo Mehmed Uzun

şer ku teriqandîbin kulî
koçber bin quling li ser axeke hişk
û dûpişk bi xwe vedabe ji kerban
li esmanekî vala megere li kevokan
ne guliyek zeytûné filitî, ne tayek ta-rîhan:
çiyayê xewnan şewitî heyran, çiyayê xewnan!

arjen arî

mamik

ba pif dîke êgir
agir gur, agir gur
gund rijî, çiya komir
bi hev re şewitîn hişk û çir
agir vemirî agir mir
ba rabû, xwelî bi kû ve bir?

arjen arî

..... 07. 2006

Diyarî bo Mehmed Uzun

şer ku teriqandîbin kulî
koçber bin quling li ser axeke hişk
û dûpişk bi xwe vedabe ji kerban
li esmanekî vala megere li kevokan
ne guliyek zeytûnê filitî, ne tayek ta-rîhan:
çiyayê xewnan şewitî heyran, çiyayê xewnan!

arjjen arî

mamik

ba pif dîke êgir
agir gur, agir gur
gund rijî, çiya komir
bi hev re şewitîn hişk û çir
agir vemirî agir mir
ba rabû, xwelî bi kû ve bir?

arjjen arî

Arjen arî

serjimêrî

4 hezar gund
 30 hezar kuştî!
 3 milyon penaber...
 ji berdevkê devê fermî ev xeber:
 hêj jî em nizanin jimara bî û sêwiyan!

li dor "nameya li ser baskê kevokê"
 û şaxê zeytûnê, serhawe

gelek kevok firîn
 spî spî, ji esmanê şîn î hêşîn
 qasidê aştiyê bûn her yek
 bi baskên wan ve kurtenameyek,
 di nava nikilan de şaxê zeytûnê
 firîn ber bi asoyên Rojava
 firîn berû hingoriya gerdûnê..!

zeytûnek peyde nekirin li ser tîngan
 tiyê taseke av, zarokên birçiyê qetek nan
 li pêrê zirbajarên ji zû ve hînbûyê gewenditîyê!

lewitîn hevok jî di devê şerxwêzan de
 gotin bi gotin, peyv bi peyv
 û roj û şev, û roj û heyv
 û qete-bejahî
 û zerya
 û girav...
 di nava çirava şer de malzaroka axê jî
 û pê re pê re, ser... û bizav!

ji qirkirana biharê çend kulîlk filitîn?
 perpitî her reng di rengvedanekê de
 û sor bi zer ket, zer bi keskiyê
 spî mir li dû aştiyê berî hemûyan!
 dilêr bûn her yek, her yek wêrek û dilsoz
 me egît hebûn Yilmazê min, ji çiyayên pîroz
 li kolanên zirbajaran biyan, niha li pîrsa azadiyê!

azadî bi xwîn e
 azadî xwîneke bûkîn e
 çim'î çiyayan bûn ji lewra her artêş
 her artêş dagirker
 di destê her artêşî de mirineke zer
 û leşker bi leşker qirakên mirinê!

aya xwîn diçilpe ji teşkên newalan
 aya ji navpolên Cûdî, ji malzaroka Dîjle
 û Tu nameyekê didî baskê kevokê:
 hest-mirov, bi berger, mişt lava...
 ez gunehkarek im Yilmazê min, ez xwestiyê welatekî
 lê ev mindal, gunehê van zarokên sava?

berkerken bererên

MEHMED UZUN

awêneyeke ji kederê ye heyat
li hindava çemê ferêt dinale

bêhaydan ketime kolanên heyatê
da hînî tevna jiyaneke asan bibim

zanim maratoneke pir dirêj e ev çîrok

mirinê ji ku dest pê dikir, awazên agirîn
bêhna binefşan dihat ji stranên jibîrbûyî
di sûretê heyvê de diçirûsî rabirdûya bê
û bi xumînî dest pê kir
meşa kewmeke ehlê govendê

li keviya şeva henûn dengê simên risasî
şûr û mertalan dipîva bejna heyatê
jiyan koçber dibû
dîrok derî radayî
her pêrgî têkçûnê hatin karwanê evinê

em zarokê te bûn; birçî, xweşmêr û nezan
dilê me dibijiya okyanûsan

bihurîm yek bi yek
ji perestgehên ker û lal
ji çiyayên devgirêz
gihîştim bihuşta zaroktiya xwe

berkerken bererên

min dît dêwên heftserî, çekên nukleerî
zimanên biyan digurînin çermê min
dicle miçiqiye
ferat li ber sirkatê ye
cûdî winda kiriye şaşika serê xwe

mîna diayek gemar bariya welatê min
nalîna sewal û daristanên ciwan
min dît xewna kalekî rind
şiverêyên mêrxasan
şahî û şîngiriya evîndaran
û tégihîştim ku
em ji qewmê agirin
her kiras pêteke li bedena me

min vexwar şikur
taseke tije ji hêwirzeya zarokan
ku semax dikirin bi alên gûstêrk

AX Û NALÎNÊN AMEDÊ

Germa havîneke dilmayî de
Evîndariya xaqermera Amedê
Bêhna wêjeya gulavî dikişîne.
Mizgîniya yekem!
Xortê canemerg, eva jiyanek hêşîn e
Lewra nexweşiya girêbaya rûreş
Nikare darçinara ser rûbarî biweşîne.
Tu îro rêwîniyeke şahnazî de
Ser text û bextên Veni Vidiyê
Taybetî demî mêvan.
Bijîşkên sondxwarên Hîpokratî
Her dem mayînde mazûvan.

*

Mizgîniya duyemîn!
Dilekî xweş û geş agahdar be
Min jî girêba nû, da ber ba.
Nexşesosin û nêrgizên wekî te
Hêvîdar im dor dora te.
Mizgîniya herî balkêş!
Dormandora Sêwrega dîrokî û rengîn
Paxila kevnebaxê Hecî Xidir de
Kulîlkên hinara bûkîni bişkiftine.
Malwêran dê rabe "Bîra Qederê" de
Vere bin "Siya Evînê"
Hênik be ber "Hewara Dîclê"
Û gaziyek lorînî; strana min û xwe
Ya welatê nalînî û xemgînî bêje.
Ev helbesta rêzmorikî û dilşikestî
Xelatê nivîskarê zirav û DIRÊJ e...

Tîrme-Tebax '06
(Qiraxê behreke malmîrat)

EWREKÎ REŞ Û TARÎ

Ewrek daket ser Tela Bûka
Ewrekî reş û tarî
Li pê rabû ba û bablîsok, gêr bûn tûmik
Û pê re jî baranek barî


Baranek barî li Kaniya Cila, li ser çiloyên zer
Li pê wê bê berf û baran, serma seqem, kul keder
Kî dizane kî dê carekê din bibîne biharê
Û bextewar be û dîsa hambêz bike berxên nûzayên Adarê

DER HEQÊ ZIMAN Û VE- GOTINA DI ROMANÊN MEHMED UZUN DE

Necmiye Alpay /
Wergera Ji Tirkî: Sîdar Jîr

"Dizane, dil li ser axa xwe, li welatê xwe deng ve-
dide. Li ku ye ew deng?" (SE 37) (1)

Cureyekî yekbûna deng-nivîsê, lîrîzmeke xweser
ku ancax dikare di serdemên modern de pêk were
desthilatê romanên Mehmed Uzun e. Ji aliyê tevn-
saziyê ve ku mirov bikaribe bibêje duyîleya Dîcleyê
ya ku nivîskêr têde herî wêrek û rehet e jî tevlê, ji




hêlekê ve heta ku tu bibêjî ji hemû derfetên tevn-
saziya serdemên hemdem sîd wergirtiye, ji hêlekê
ve jî zimanekî ku naşibe yê wêjeya modernîst a sar
tê bikaranîn.

Sedema vê yekê, wisa difikirim ku derketina pêş a
dîrok, surgûniya dîrokî-civakî, kirde ya kolektîv a
di nivîsên Mehmed Uzun de ye. Mijar û nîqaşa
romanên, di sazkirina zimanê de xwe dide der. Ya
di vê derê de ne ya ku li dijderketina modernbûna
civakên pişesaziya wan pêşketî ye, li hemberî
qewimanan rûyê xwe ji dîroka civakê re badayî
bêhtir zimanekî hilweşîner ê dîroka takekesî bi
xwe yê wêjeyê modernîst nîn e. Zimanekî ku
bang ji nûbûnê re dike: "Rûpeleke nû. Jiyanekê
nû. Serdemekê nû." (TMMRME 58, 309), "Hîsek,
zanînek û bireke nû" (HD 43), "Gotineke
nû, vegotineke nû" (HD 93). Hem di bikaranînê
zimên de hem jî di yên temsîlkar de avakar û çêker
e. Bi awayekî balkêş, di heman demê de heta
radeyekê lêpîrsîniyê jî di nava xwe de dihewîne ev
taybetî. (2)

Ji bo ku gotinên xwe yên li jor hinekî ji hev
veçirîm, divê ez balê bikêşim ser rêşopîna xeta
pêşveçûna romanên: Di destpêkê de Uzun, ku
heta tu bibêjî bi dîroka civakê re girêdayî ye û
kesê/a ku dê li ser hûr bibûya jî ji wê rasteqîniyê
hildibijart, di romanên ku li pey hev rêz dibin de
hêdî hêdî ji dîroka civakê vedikişê û azadiyekê ji
serlehangê xwe re bidest dixê. Di vê çarçoveyê de
wekî hilberîna gihîştinê Biroyê di duyîleya Dîcleyê
de dibe ku rasterast ne ew kes ê ji bo ku civakê

têbigihîje li dîroka xwe ya tek û kesane binihêre:
em nikarin gaveke ku bi wî aliyê ve hatiye avêtin,
raterast û nayênîqaşkirin bihesibînin. Lê belê
Biro, ji bo derfetên rêşopîneke wisa, ji bo binge-
heke wisa ava bike di serbestiyê de ye, karakterekî
ku ji karakterbûna bi tenê yê civakê û dîroka aîdî
wî ye derketiye. Bi silavkirina Tanpînar ku em
bibêjin, hem di nava dîrokê de ye, hem jî li derveyî
dîrokê ye.

Li gorî min serkeftina herî xurt a duyîleya Dîcleyê
ev e: Di pêvajoya serbestbûnê de yekirina hêlên
ku di asoyeke berfirehtir de dimîne ye. Di Biroyê
serlehangê romanê romanê de her du hêl dibin
yek: Biro, di heman demê de di nava lehengên di
romanên Mehmed Uzun de yê herî bi tevnasazî
pêk hatiye, hem jî kesekî di dîroka civakên cîhanê
de hevpar, kevn û girîng (Berhîm Pêxember) tîne
bîra mirov û pêk hatiye anîn. Ji bo metna romanê
jî mirov dikare qala yekbûna du hêlan bike: wekî
nivîseke pêşketî romana ku ji rêbazên modern sîd
wergirtiye û wêjeya devkî ya ku bi hostetî li hev
hatiye anîn.



Yekbûna deng û nivîsê

Ji ber ku bi Kurdî nizamim, li ser navê "yekbûna
deng û nivîsê" nikarim dest biavêjim pevgirêdana
deng û wateyê; di vê mijarê de hin taybetiyên ku
mîrov dikare wekî bingeîn bihesibîne, ez ji tirkîya
wê dikevim rê û pê de diçim.

Di nava hêlên ku yekbûna deng û nivîsê pêk tînin
de, ligel berêxwedana bi dîroka civakê û kirdeya
kolektîv, derûniya kesên ku di romanên de ved-
ibêjin jî xwedîgirîngiyek e.

Taybetiya herî xurt a vî çîrokbêjî (mijara ro-
manê*), çî qasî di rewşa "nivîskarê/a xwedawend"
de dibe bila bibe, ji serî heta binî, di germahiya
mazûvanekî/e rojhilatî de axaftina wî/ê ye. Dengê
ku derbasî nivîsê dibe dengê vê germahiyê ye.
Roman mal an jî welatê vebêjeran in, em xwînêr jî
tu dibêjî qey mêvanên wan in, hîseke wisa
derdikeve holê. Mazûvan daye pêşiya me, me li
malê/welêt dide gerîn, tiştên ku li wir di nava
deman de dide xuyakirin. Lê belê ne bi zarekî sar ê
ku bi mêvanekî ne diyar e ku çî ye re tê axaftin; bi
dilsozî, bi dostane, cî bi cî jî bi hevaltî:


"Pîrê! Hema yekî ku pê re xeber bide dît, dikare bi saetan heta bi rojan xeber bide"(SE 106), "Qesr û koşk, warê têran"(SE 35), "Fisek"(HD 52 ûd).

Carinan bi dengekî gazincane dipeyive; "Qahweya tehl du caran tê vexwarin, ew sê fîncanan vedixwe. Divê qahwe hindik be, ew dibêje bila tijî be"(SE 43)

Carinan bi lome: "Her dem wisa ye, di rojên tarî, teng û bêçare de dost kêr dibin"(SE 212), "Çi ye ev qas bêhtengî, beheccandin, hesidandin?" (BQ 256)

Carinan, mîna ku hêdî hêdî li xwînê dizivire: "Nermik. Nerm û germ. Belê awirêkî çawa. Mîna awirên zarokêkî ne wisa? Zarokêkî ku li apê xwe dinihêre?... Mîna du dostan? Belkî jî mîna du evîndaran, kî dizane?! Awirêkî çawa?" (SE 58); "Lê belê kengî?", "Çima? Heta ku derê?" (SE 94 û 95: "Bi germahî, sadeyî û beraqiya gotina wêjeyî"(HD 27) hwd. Pirsên ku ji valahiyê, xwe bi xwe yan jî ji xwînê hatine pirsîn. Lê belê vebêjerekî/e ku her dem hewl dide ku derê dilê xwe vekirî bihêle.

Bi taybetî jî qalibekî vegotinê yê di romanên destpêkê de gelek caran hatiye dubarekirin: tespîtîkirin



-vegühestina ser pirsê- ravekirineke zelal. Mînak: "... Me bawer nedikir ku vegere." Henek. Henek? Hinekî henek, hinekî jî çavtirsandin. Di pey hiqeqe hiqeqe qebe re awirên xesuyekê." (SE 106) Em dikarin bibêjin bi xwînê sanal re ye jî.

Romana ku mêtandari tê de herî aşkere ye Tarî Mîna Mirinê Ronî Mîna Evînê ye. Di vê derê de çirokbêj, bi lepên "me" digire û me digerîne. Cînavka ku tê bikaranîn bi rastî jî "em" e, em = nivîskar + xwînê: "Em vêga jî wê şeva meşûm ku mirinê mohra xwe lê daye bi dût bikevin, em biçin şeveke tarî ya zamanê berê", "Rêwîtiya ji bo ku em serboriya Baz û Kevokê hin bibin didome"(TMMRME 27, 239)

Yek ji avakarê vê germahiya bi xwînê re sifata "Germ" bi xwe ye: "... çavên germ...", "çav ji bo demeke kurt dikevin tev. Germ, nerm...", "stargeheke germ ji bo derd û belaya bêdawî", "Ew dengê germik ê ku bi hesreta wî ye", "Ew awirên germ li ku ne?", "Awirên jinikê germ in" (SE 51, 58, 77, 94, 105, 154, 183). Di romanên Mehmed Uzun de cihê sifata "germ" tenê bi serê xwe dikare bibe mijara lêkolîn û dahûrandinekê. Mirov gotina "Ku em werin ser germahiya peyvê, ez hîna jî wê gelekî dût bûm" bide bala xwe ku nivîskêr bi Biro daye gotin(HD-2 328)

Daneyên din

Di nava daneyên ku 'zimanê mazûvanî pêk tîne, bi qasî îstîareyên mîna "Stêrên stûxwar", "Leyla û Mecnûn ê ku yek li rojhilat a din li rojava dişewqe" ku bi hîsan têrtijî ne, zanînen li derveyî tevnsaziyê ku di kakilê tekstê de heye, heger gotin ne şaş be yên şîlf î tazî, hevokên kurt, yên şibandînan, peyvên herêmî, gotinên pêşiyên ên ku serekeyên sohbetên me ne û her wisa cihê peyvên kurtkirî yên mîna Keso (Ksenofon), Naso (Ovidius) ku hîsa nêzikahiyê didin jî xwedî cihê girîng in.(3)

Hevkariyên zimên ên li jêrê jî germahiya pêrgîhatina bi dostekî re pêk tîne. Ne bawer im ku ev cîlweyê wergerê ye. Silavên ku Uzun didin in. Va ye Orhan Kemal:

"Li dûran, gelekî li dûran.."(SE 34, TMMRME 333), "Ji jor de, gelekî ji jor de..." (SE 88), "Dirêj, demeke gelekî dirêj paşê..."(BQ 316)

Sabahattin Ali: "Bi şev, şewqa heyvê daye her derê"(SE 88), "şewqa heyvê ketiye avê" (SE 236).

Yaşar Kemal: "Bû gilokek şewq...(SE 118)", "Pêl ketine nava listikê; dinya şiyar dibe,..."(SE 217), "Girava ku di nava deryaya rengan de soberî dike..."(BQ 36), "Li bakur komrişkek ewr dibîne"(TMMRME 103), "... Şewqekê, hundirê şikeftê dagirtiye"(TMMRME 207).

Divê beyî ku balê nekişînim ser "em"ên Mehmed Uzun bi dawî neynim. Wekî bergdana li lîlatê ya ramyarî ya ku di germahiya zimanê wî de ye ev "em"ên wî. Va ye hin cureyên "em"ên di pirtûka bi navê Ziman û Romanê de:

em: Mezopotamyayî (r. 25)

em: Nivîskarên sirgûn (r. 143)

em: Yên Tirkiyeyî (r. 28)

"nexweşiya me/(em) û wan" (r. 229)

"civaka me = Civaka Tirkiyeyê" (r. 103)

Romannûsê deng û sirgûniyê Mehmed Uzun dibêje, "Têkçûyîna li hemberî şer" (TMMRME 232): ne "Di şer de", "Li hemberî şer" têkçûyîn.

Bi hêviya ku çandên me li hemberî şer têk neçin, Mehmed Uzunê Katîneyî û hemû yekbûnê çandên ku wî alîkarî dayê, hemû "em"an bi hezkirin silav dikim.

ÛRENOT:

(1) Ji bo pirtûkan: SE: Siya Evînê, Weşanên Gendaşê, 1989 BQ: Bîra Qederê, Weşanên Gendaşê, 1995 TMMRME: Tarî Mîna Mirinê- Ronî Mîna Evînê, Weşanên Gendaşê, 1998 HD: Hawara Dicleyê I, Weşanên Gendaşê, 2002 HD 2: Hawara Dicleyê 2, Weşanên Gendaşê, 2003

(2) Sifetên "sarbûyî, hilweşîner, çêker (erênî)" û "nû" yên li vê derê, divê bê zanîn ku min di tu wateya neyînî yan jî pesindayîne de bikar neaniye. Berhemên wêjeyên bahsê ne, sifetên ku tespît pê tênekirin ev. Sifta "lêpîrsînerî" yê divê were fêmkirin ku ez bi erênî nêz bûme. Bi qasî encamên erênî yên zimanekî "sarbûyî, hilweşîner an jî çêker(erênî)" be, ew qas encamên neyînî jî dikare derkeve holê.

(3) Îstîare û şibandînen Mehmed Uzun bi dîrok û erdnîgariyê re pevgirêdanên aşkere û watedar pêk tîne. Ji ber ku nehatine hînbûn, ev şibandînen gelekî bi bandor in. Sermeselê, ji bo evînê jî ji bo destpêkan jî Mehmed Uzun şibandîna "tov"ê bikar tîne: "Heta ku tov xwe bera binê erdê nede, şîtl dikare derkeve rûkala erdê?" (BQ 42), "Rêgez, bi gotina Fransewîyan prensîb, dişîbin tovan"(BQ 42), şibandînen mişt jiyan: "Di nava nivînen xwe de wekî jîjyokî vir de wê de gevîzî" (BQ 50). Dîrok û humor: "Hêtên wê yên ku hîna tu kesî mist nedane, mîna qûna topên Osmaniyan giloverik û şidiyayî ne", "Yekî ku mîna min wekî topeke Osmaniyan giran" (HD 250 û 266) "qijîna qaqlîbazan, mîna awaza Feqîrekî Êzîdî ye" (HD-2, r. 320) hwd.

Çend Gotinên Pêşiyên: "Ceh keran şamî dike, mesqel şûran misrî dike, xizanî mîran kotî dike." (KK 160), "Ker çî zane zehferan çî ye?" (KK 210), "Çocukların olduğu eve şeytan girmez" (KK 213), "Neyarê bav nabe dostê kur." (KK 214), "Şûr Şam, xençer mam, jin dotmam." (KK 247), "Gihayê hewşê (bi xwediyê hewşê) tehl e" (KK 256), "Heft çirokên hirçê hene, hemû jî li ser hîrmiyê ne." (KK 299), "Ê ku bikeve govendê xwe dihejîne." (KK 325), "Aqilê

sivik barê giran." (DY 178) aqilê sivik barê giran "Deşilmeyen yarının acısı dîmmez" (DY 199) "Ayika bizina qol ji ya bi qiloç re namîne." (DY 258) "Tu çûyî gundekî, hemû kes bi çavêkî bin tu jî çavêkî xwe derxîne." (DS 415) "Ê li erdê jî ketinê natirse." (DS 199) "Du serî di beroşekê de nakelin." (DS 160)

Çend peyvên herimî yê hevbeş: Fetbazi (YBAG 15, 212), zabî (YBAG 43), "Binevş" (YBAG 107), tebulê (Navekî xwarina herema Antakyayê; YBAG 117), keçel (YBAG 119), çaqildax (KK 187), govend (AGAÖGK 142, 192), kubi (AGAÖGK 166), gedîk (Ez "gidîk" dizanim" DY 60), ereban (DY 71, erban? 76; erbane? 277), meftuni, (DY 135), küfkûf (DY 212), şiyabû (DY 239).


Minakeke din ji zimanê herêmî: Li şûna "dema boriya têdeyî", bikaranîna "dema boriya dudar" Ez dibêjim qey mirov zêdetir di devoka Tirkî ya aliyê rojhilata Eneholiyê de rastî vê yekê tê. Ez baş nizanîm ka ji ber Kurdî ye an na. Wekî nimûne; wexta ez difikirim gelo di vê mînakê jêrê de qertafa "e" a şayesandinê ye, an jî li şûna "koka lêkerê" hatiye bikaranîn "Mîrê min Celadet Beg, dilê min bi firê ketiye. Kekê min ka bêje; çî bi serê te de hatiye." (YBAG 70).

Minakên vegotinên lîrik: "Tramvay bi holbûnê derbas dibûn." (YBAG 36) "Rindbaziya Çiyayê Agirî." (YBAG 36) "Gurzoşê ku ji heft bavê me jî biaqiltir e." (DY 176)

Ez nizanîm ka ev arizî Kurdî ye, an jî xweseriyê M. Uzun e, car caran rastî vê vegotina helbestî tîm: "Zivistan bi ba û baranê re xeber şandiyê tî, zivistan ketiye rê û tî." (AGAÖGK 29). Vegotina ku di Tirkî de wekî "karakuş geliyor-çileyê zivistanê tî" tî gotin, di kurdiya M. Uzun de dibe, "zivistan ketiye rê û tî"; ez wisan pê dihisim ku hin bûyer ketine rê û tî." (DY 233).

CÎHANA VE- GOTINÊ YA MEHMED UZUN

Adnan Binyazar /
Wergera Ji Tirkî: Dilawer Zeraq



Her ziman, bi çanda xwe, bi avaniya xwe ya hilberîner pêş ve diçe û diperise. Kesên ku wî hildiberînin, geşe pê didin û wî dikin xwedî şewazekê jî nivîskar in. Ger ku mirov bala xwe bide dîroka peresîna vegotinê, dê bibîne di destpêkê de huner jî tune ye nivîskar jî. Hemû berhemên ku di roja îroyîn de bi navê berhema hunerî tînan afirandin, dawer û sîmgeya tişt û camidekî, wateyekê, yan jî boçûn û darazekê ne. Civakan li gorî dirûvê tiştên ku xwestine qala wan bikin û wan bînin zimên, dawer û sîmge afirandine. Wêneyên ku li ser hiyeroglîfên Misirê hatine nîgarkirin ne wêne ne, wênenivîs in. Wekî çawann, 'Alfa' ya nivîsa yekem bi sîmgeya Gê, 'Beta' ya wê jî bi sîmgeya Malê hatiye nîşankirin. Ev sîmge, li gorî berehî û firehiya xwe ya watedariyê, darazekê, hişyarkirinekê, tew bi ser de jî bûyereke biçûk vedibêje.

Hemin ku hêzeke mirovan a hîskirinê, fikirinê û afirandinê heye, bêguman berî ku nivîskar peyde bibin jî wêje hebû. Dîsan jî hosteyên vegotinê yê roja îro bi bihurîna demeke dirêj peyde bûn. Helbet kesên ku di nav civakê de afirîner bûn, tiştên dihatin jiyîn cuda hîs dikirin, cuda fêhm dikirin û van hîskirin û têgihîştinên xwe vediguherandin vegotinekê jî hebûn. Bi gotineke din nivîskar her kes bû. Çi gava vegotina hunerî di hin kesan de geş û xurt bû, nivîskariyê dest pê kir. Di vî warî de, di jiyana hoveber a hevpar de, ji teredînan bigire heta jîrtirê wan, keda gotin û vegotina ferdan heye di nivîskariya nivîskarekî/ê de. Ev jî rastiyeke: Mirov nehatin ber hev û zêmar, kilam û stran û vegotinên dîtir ên gelêrî neafirandin. Helbet kesekî ji wan ev yek dirûvand, şewce pê da û derpêşî civakê kir. Çavkaniya nivîsandinê di vê veguherandinê de ye ku piştî hîskirina aferîneka hevpar li gotinê vedihugere. Jixwe kakilê 'Lehengê Bênav' jî ev e; kes û ferdên civakê şer qezenc dikin lê navê yek an jî du kesan di dîrokê de tê gotin.


Civakan di qonaxên xwe yê pêşveçûnê de hîsên xwe, ramanên xwe û ezmûneyên xwe yê jiyânî bi efsaneyan, dastanan û kilaman anîne zimên. Vegotin û têgihîştina ji vegotinê, divêti û encameke têkilî û danûstendina mirovane ye. Bi vê danûstendinê zimên vegotin perisandiyê, vegotinê jî ziman xurt kiriye. Carinan di vê peresînê de, li gorî cihnişînên mirovan, li gorî guherînên civakî ya gelan, geşedan an jî derengmayînen nepayî pêk tên. Mirov dikare bêje, ji ber ku civaka wan dêmanî bûye û wan sazîyên çand û kulturê ava kirine, gelek berhemên ku wekî klasîk tên zanîn û pejirandin li Rojavayê hatiye afirandin. Her çi qasî di pêşveçûnê de gelek asteng derketiye pêş wê jî, Kurdî, bi dastan, efsane, bi kilamên dengbêjan, bi stranên xwe ve çavkaniyeke pir xurt, mezin û fireh e ji bo afirandina nivîskî. Divê jiyana Mehmed Uzun a wêjeyî, ji vî aliyê ve bê nîrxandin. Çanda vegotinê ya Mehmed Uzun, ku di emrê xwe yî ciwan de nêzî bîst berhem afirandine, ji vê kaniyê, ji nîrx û hêjahiyên gerdûnî ya wêjeya nûjen, ji cihoka ku rûbarekî kesekî wekî **Yaşar Kemal** vekiriye, av vexwariye. Ji ber vê yekê di ceribandîna û hevpeyvînan xwe de cihekî taybet dide Yaşar Kemal.



Wexta mirov qala nivîskariya Mehmed Uzun bike, divê mirov bandora çanda gelêrî ya li ser jî bisekine. Uzun, digel zimanê xwe yî dayikê Kurdî, bi çanda Tirkî jî rabûye. Ew di ceribandina xwe ya bi navê 'Ötekiler...' de dibêje, "Ez di maleke ku tê de Kurdî dihat axaftin ji dayika xwe bûm. Min heta heftsaliya xwe, yanê heta ku herim dibistanê, bi Tirkî nizanibû. Di pey re zimanê esasî ya hemû jiyana min a perwerdehiyê Tirkî bû. Min tu perwerdehî bi zimanê xwe yî dayikê nedît. Lewra destur nedihat dayîn. Min heta hevdeh saliya xwe bi zimanê xwe yî dayikê xwendin û nivîsandin nizanibû. A niha jî romanên xwe bi Kurdî dinivîsim. Ceribandîna û gotarên xwe bi Kurdî, swêdî û Tirkî dinivîsim. Ez ez di rewşên gelek zor û zehmet de û bi hewldanên xwe hînî nivîsandina Kurdî û avakirina zimanekî romanê bûm." Bêguman swêdî ya ku piştî 22 saliya xwe hîn bûye, wekî zimanekî nû war û qada wî ya têgihîştinê firehtir û zengîntir kiriye. Fikirîna bi sê zimanan, hîskirina bi wan, têgihîştina bi wan, hêzeke sêmend dide tiştê ku tê nivîsandin. Lewra sê ziman tê wateya sê cihana watedariyê. Fikirîna têgihêkê ya bi sê zimanan, cih û qadên nûtir ên watedariyê li pêş wê têgihê vedike, di wî kesî de fêmkirin û bibîrxistinên wateyî yê têgihan diqedîne. Di nivîskarên ku zimanê wan ê dayikê Kurdî ye lê bi Tirkî dinivîsin de, ev dewlemendiya têgihî, li gorî ast û sewiyeya zimanê ku afirandine xwe dide der. Ez dibêjim qey, Uzun, pirçandîya Enedoliyê ya di vî warî de diparêze. Rastiya ku di rewş û barûdoxên pirçandî û pirzimanî de xurttirîn û tekûztirîn berhem tên afirandin, ji van dîtin û

darazan tê fêmkirin: Dê û bavê (Yaşar) Kemal ji kurdên derûdora Gola Wanê ne ku ji warê xwe koç kirine. Ew bi xwe li Çukurovayê li gundekî tirkan ji dayika xwe bûye, zimanê wî yî dayikê Kurdî ye, lê belê Tirkî ye jî. Li malê bi Kurdî, li derve, di jiyana xwe ya sosyalî de bi Tirkî diaxive. Ji ber ku zimanê wî yî perwerdehî bi Tirkî ye, Tirkî dibe zimanê nivîsandina entellektuelî jî. Lê hestyariyên xwe, taybetiyên xwe yê etnik û çandî jî tev li vê nivîsandinê dike û zimanekî rengîn û dewlemend a romanê ava dike."


Gava mirov li cihana romanê ya Yaşar Kemal hûr dinêre, dibîne ku romana wî heta tu bêjî bandor ji cihaneke fireh a efsaneyan, ji gotin û kilamên Karacaoğlan, ji çîrokên gel û Dede Korkut, ji kilamên Dengbêjan, ji zêmaran girtiye. Her wêje di destpêkê de berê xwe dide gotinê. Mehmed Uzun, di ceribandînan xwe yê bi navê '**Dengbêjlerim**' de, çavkaniya gotinê ku jê av vexwariye nîşan dide û deynê xwe yî rêz û hurmetê dide wan vegotinên balûpal: "Di zimanê dayika min Kurdî de ses deng e, bêj jî ew kes e ku dirûv dide deng û peyvê dibêje. Uzun kevneşopiya dengbêjiyê dibe heta çax û dema Homerosê û berê xwe dide kevneşopiya gotin û vegotina gelêrî. Kesên wekî **Apê Qado**, **Evdalê Zeynikê**, **Alihan**, **Siyabendê Silivî**, **Ehmedê Fermanê Kikî** ku bûne



mijara efsaneyên çanda vegotinê ya Kurdî û kurdan, dide nasîn û der heqê vî warê balûpal a wêjeya devkî de xwîner agahdar û serwest dike. **Yaşar Kemal** jî di roman, ceribandin û hevpeyvînên xwe de bal kişandiyê ser bandora van efsane û vegotinên a li ser şewaza wî ya nivîsandina romanê. Roman, vegotin, ceribandin; di kîjan warî de dinivîse bila binivîse, bandora van vegotinên gelêrî di şewaza Mehmed Uzun de tê dîtin." **Paul Guth** dibêje, "Her nivîskari/ê du cure berhem hene. Yek jê hatiye nivîsandin, a dî jî hatiye jiyîn." Tu dibê qey ev gotin ji bo nimandina cihana romanê ya Mehmed Uzun hatiye gotin. Ne mîna ku **Goethe** gotiye, "Her nivîskar di berhemên xwe de heta cih û radeyekê xwe vedibêje", di romanên Mehmed Uzun de, yên ku hatine jiyîn û yên ku hatine nivîsandin di nav hev de ne. Her wisann, a hatî jiyîn ji ya hatî nivîsandin, a hatî nivîsandin ji ya hatî jiyîn rastkînotir e. Tê dîtin ku ev şewaz, bêyî dilbijandin û hewespêkirinê, tew bêyî ku di bin bandora wê de bipelişe, bi lêanîn û guncandina romana Rojavayê hatiye afirandin. Mirov dikare bêje ev şewaza vegotinê ya Mehmed Uzun a di berhemên Tirkî de, ji ber behre û feraseta wî ya vegotinê ye.

Bêguman çîrok, çîrcîrok, stran, efsane û vegotinên lîrik ên dengbêjan, ên ku bi zimanê dayika xwe guhdarî kiriye, kiriye ku şewazeke wiha xurt û tekûz pêk bê. Uzun, di zaroktiya xwe de, vegotinên dengbêjan ku her yekî romanek e û digel wê jî ew qasî helbestane ne guhdarî kiriye, di hundirê xwe de xunaftiye, li xwe ferikandiye û şewazeke ku hatiye ecibandin afirandiye. Her ziman deriyê cihaneke nûtir a vegotinê li pêş nivîskarekî/ê vedike. Mehmed Uzun, her sê zimanan, Kurdî, Swêdî û Tirkî, di cihana çand û afirandinê de vehelandiye, bi van zanîn û têgihîştinan gihîştîye sentezeke vegotinî. Divê mirov ji wî aliyê ve, wî wekî nivîskarekî nûjen û hemdem ê Kurdî û Tirkî ku li cihanê deng vedaye bibîne.

Ji Weşanên Lîsê



ZIMANEK, DÎROKA WÊ- JEYA WÎ ZI- MANÎ YE

A. Ömer Türkes /

Wergêra Ji Tirkî: Zeyneb Yaş

Heta berî demekê, kesî pê nizanibû ku Wêjeya Kurdî heye, li ser nedixiivî, pirtûkên aîdê ziman û çanda wî nedihatî çapkirin li Tirkîyeyê. Ew nivîskarên ku kurdbûn û xwe bi zimanê Tirkî îfade dikirin, her wekî ku şîr, çîrok û romanên wan aîdê wêja "me", "yên me" bi xwe bûn. Meseleyeke siyasî bû kêşeya Kurdî; ew hebûn, li wê derê bûn, xîzan û bêzar bûn... Ji dema Osmanî heta vêga, di romanên bi zimanê Tirkî de imaja Kurdî bi "Qeba, cahil û xerab" hate honandin, ya Tirkî jî bi; "hemdemî, ronakbîrî û çê" bûn bû. Ji aliyekê ve pesnê çanda Tirk a qedîm û dewlemend dan, ji aliyê din ve jî piş bi çandên di yên li Enadoliyê nekirin û çand, kirin amûrê meşrû yê tehakûmê; heke rastexwe neanîbin ziman jî, bi mebesta "çanda dewlemend" perestiya ramana nijadperestiye dihat kirin.

Em hemû baş pê dizanin ku di dîroka Komarê tevde di wan romanên bi Tirkî hatine nivîsandin de kurd û kêşeya Kurdî nehatiye destnîşankirin. Lê belê di wêjeya Tirkî de kêmasiya nêzîkahiya li kurdan û helwesta wan a yekalî, ez wisa pê bawer im ku barê ronakbîr û nivîskarên kurd sivik nedikir. Van ronakbîr û nivîskarên, ji ber ku dîrok û pirsgerêkên gelê xwe di romanê de -qet nebe bi Tirkî jî- destnîşan nekirine, ji aliyê din ve jî giraniya xwe nedane ku bi zimanê xwe binvîsinin, zimanê xwe pêş bixin, pêwist e ku mirov wan bi qasî nivîskarên Tirk berpirsiyar bibîne.

Li erdnigariya derveyî Enadoliyê, tevî ku gelek

tekstên wêjeyî bi zimanê Kurdî hatine nivîsandin, ji ber sedema ku kurdên di nav Komara Tirkîyê de dimînin li ziman xwe xwedî derneketine û di warê romanê de bédeng mane, belkî jî ew bû heta sala 80 jî ji xwe re tesawirek pê bi nasnameyekê nekiribûn. Romana Kurdî jî di pey lêxwedîderketina kurdan a nasnameya xwe ya çandî dest pê dike. Her çî qas berê xwe lê ceribandibin jî, pêwist e mirov mîlada nivîsandina romanên Kurdî bi Mehmed Uzun bide dest pê kirin. Ne tenê bi romanên wî, bi berhemên xwe yên li ser ziman û wêjeya Kurdî jî destpêkek e.

Maka Romanê Ziman e

Pêwist e ku aşkera bêjim, ji sala 1985an û vir ve ye ku Mehmed Uzun romanên xwe bi zimanê Kurdî dinivîsîne û pê hewleke wî yê hêja heye ku pê pêşketinek di zimanê Kurdî de were kirin, wekî din jî, romanên ku li pey hev hilberandine bi asta xwe ya estetîk jî, hem meşrûtiyeta roman û hem jî ya zimanê Kurdî dide ispatkirin. Pêşnivîsa ku **Yaşar Kemal** ji bo pirtûka Mehmed Uzun ya "Siya Evînê" re bi zimanekî helbestî nivîsî bû, minakek gelek baş bû ku romannûsekî hosta heqê nivîskarekî din ê romannûs teslîmê wî bike. "Gava min romana Mehmed Uzun xwend metel mam, yekem romana zimanekî ku ew qas bi hostatî, ew qas bi zimanekî dewlemend û di ser de jî ku ew qas bi zimanekî pêşketî yê romanê pê hatibû afirandin û nivîsandin. Mehmed, berî her tiştî bi ziman û wêjeya Kurdî baş dizane, bi zimanê Tirkî û wêjeya wê jî baş dizane. Paşê jî berê xwe dide dinyayê, çand û wêjeya dinyayê jî dihemîne. Û Mehmed, ji bo zimanê Kurdî dibe dîrok."

Pêvajoya serdema ronakbîriyê ku bi netewebûnê dest pê kir, netewe ziman û lêkolînên li ser ziman pêşketin jî, lê zimanê gelek civakên ku serxwebûna xwe bi dest nexistibûn jî pêş neketin. Berî her tiştî nayê wê maneyê ku ew ziman ne xurt û zimanên ne di asteke xurt de ne wê her wisan bin û bi pêş nekevin. Dibe ku ew zimanên bi me hişk in jî di hîmê wan de pêşketinek hebe. Ziman, ne mexzena sîlên bedew û tamam kiriye, ziman ne bi tenê ferheng e, ne koleksiyona gotinên li ser zar e, ziman, ne goristana cendekên ku kêma zêde bi hostatî hatine mûmyakirin. Ziman, heyîneke zindî ye û civatên wî zimanî bi kar tînin, amûrên pêşketina raman û jiyanê, di encama ku bi awayekî zelal pak û xawên dibe raman pê bi pêş dikeve. Tevî ku

çandên biyan jî di nav xwe de dihewîne, wan jî dihone, ji nû ve vedijene, li hev dixê û pê ziman xwe digihîne asteke berz. Ji ber ku her zimanek tevneke xwe heye, hemû tiştî vedihewîne û ji nû ve li gor xwe maneyekê dide her tişteke. Ziman, tu carî û di bin tu rextî de sînorên mutlak ji mirovan re danayne.

Di nav erdnigariyekê de heke ji civakan a desthilatdar dîroka zimanê xwe, bi boneya vejînê û bi sedema heyîna xwe bihesibîne û civakên di yên ku nexşê wê çandê ne bêzar û ziman bike, helbet wê şerê li ser ziman bibe amûrê tekoşîna siyasî. Lê belê, "Felsefeya ziman û hunera ziman yek û her eynî tişt e. Tu ferqiyeteke cihê di ziman de nîn e ku ji xeynî axaftin û nivîsandina hevokan a bi wî zimanê hatine bikaranîn bi hevokan bi hev girê dide, yanê ji xeynî dîroka wêjeya şênber pê ve tişteke din nîn e."

Tevî zimanê Kurdî, tiştê ku ziman tê de heyîna xwe bikaribe lê ragire û heyîna xwe pê bide ispatkirin, wêje ye. Lê belê, zimanek ku ji belavok, rojname, çîrok û lehengên destanan, heta bi roman û listikên li ser şanoyê tev pêk neyêt û pratîka çanda netewetî tê de neyê kirin, ziman ne ter e. Ji ber ku, çî qas ziman û çand, tevî ku ne yek û eynî tişt in, tu têgeh in ku di nav hev de ne. Heke em qala çanda civakê bikin, ma nexwe ev tê maneyê ku me heyîna zimanekî hevpar jî peji-randi ye. Ev hevparî ne ew e ku ferdên wê civakê bi hêsanî eynî gotinan bi lêv dikin; ev navenda cihewaziya ramana hevpar a civakê ku dinyayê ji yên dîtir cihewaz têdigihên û hestên xwe û tarzê bi lêv dikin. Wêje, felsefe, huner, tevî teknikên xwe tev çand, raman, têgihîştin û wekî din tore û adetên civakên jî mirov nikare durrî ziman bibîne. Çandeke bêziman, ramaneke ku nayêt ser ziman, hebe tunebe dikare bi dinyayek ne şênber xwe ra-bigre.

Pêşxistin û dewlemendkirina ziman/çanda Kurdî, bikaranîna zimanê Kurdî, bi afirandina berhemên edebî yên Kurdî û bi tercûmekirina li Kurdî ya mîrasê çanda dinyayê dikare bi ser bikeve. Heke ku mirov zimanên diparêzin, hez ji wî zimanî dikin. Parastina mafê axaftina bi Kurdî, mafê parastina çanda Kurdî, ew e ku bi rastî jî ew ku di jiyana de bê bikaranîn. Peyv, têgeh, îfadekirin, ancax û ancax, her nivîskarek gava bi awayê xwe

yê ferdî peyv xwe têxe ser metnê xwe, ji xeynî niyeta ku nivîskar dixwaze bike jî ew peyv bi honaka xwe manedar dibin û pê zêde dibin. Lê belê, bikaranîna zimanê Kurdî di nav sînorên Tirkiyê de hatiye îhmalkirin û îfadekirina raman û hest ya bi Kurdî...

Bi Tevî Romanên Xwe Mehmet Uzun

Mehmed Uzun di pirtûka xwe ya bi navê "Afrandina Zimanekî" de behsa van kêmasiyan, derengmayîne, bindestkirinê dike û ne bi tenê romanên xwe, bi berhevkarîya edebiyata devkî ya gelê xwe ku li ber windabûnê ye, bi lêkolîniya xwe li ser ziman û edebiyatê jî şerê xwe yê bêeman berde-wam dike. Di xebatên xwe yên "Kulîlkên Hinaran", "Destpêka Edebiyata Kurdî" û "Afrandina Zimanekî" de, ji aliyê ve romanên hatî nivîsandin û xebatên di derbarê zindîkirina tarîxa zimanê Kurdî de hatine kirin ber bi çav dike, ji aliyê din ve jî zemîna gengeşiyên li ser xebatên çandî û wêjeyî ava dike.

Bi rastî heta ku min ronamanên Mehmed Uzun nexwendibûn, der barê çanda gelerî û wêjaya kurdî de naskirinek min î tarî û nediyar di hişê min de hebû. Paşê min xwend; Uzun, di "Siyaya Evînê" de bi di drama şexsî ya Memdûh Selîm Beg de ku trajediya gelekî di nav dîroka Komarê tevde li ber çavan radixe, li dîrok û civaka xwe bi tenê namîne asê, li pey xewn û xeyalên xwe xemgîniya ronakbîrên ku di van rîyan de fedabûyî bi ser tekstên xwe ve vekiribû. Di ser de jî wê "Besteya Mehrûr" di guhên me de lê dixist. Bi "Bîra Qederê" bi xweh û birayên Bedirxaniyan em careke din dîsa bûn şahidê wan jiyana qurmiçî. Hem dîrokek, hem li hev hesabkirinek, rabîrdûyek ji bîrbûyî, êş û janên xwînê, şiddetê, goçberiyê, lê berî her tiştî tahma edebiyatê hebû di van romanên de. Di "Ronî Mîna Evînê, Tarî Mîna Mîrinê" de, dewletek "heyîna wê" tuneyî, "li wan dernan", dîsa li wan çiyayên ku bi xwînê hatî şuştin derbas dibû, li ser axa ku ji şiddetê bûyî çol destana evînekê bû ku li ser zîl dabû. Û "Dengbêjên Min", dengbêjên ku êdî hingî yên Mehmed Uzun in yên me bi xwe ne jî, peyvên ji ser lêvên wan diherikên yên bi efsûn, honandina van peyvên ku careke din mizgîniya pêşketina edebiyateke nû ji bo me dikir.

Her du romanên Uzun ên dawî yên ku hev temam

dikirin, du şaheserê wê wêjeyê ne. Belê, ez ê vêga ji we re behsa "Hawara Dîclê" û "Sîrgûnên Dîclê" bikim; bi dengê dengbêjekî ku mirov û dîroka jibîrkirî vedijenand ji destaneke epik... Yê hatî jibîrkirin kî ne? Yê hatî jibîrkirin ew bi xwe ye, yanî Dengbêj Biro... Paşê jî stêra dilê Biro, Stêr e; yê hatî jibîrkirin Mîrê Cizîra Bohtan Bedirxan û neyarê wî yê Ermenî Stefan Manoligiyan e. Helbet dê şivanê Cizîra Botan ê herî bi nav û deng Apê Xelef jî hatiye jibîrkirin. Bi tenê van jî namîne yên ji hişê mirovan jî çûne; Êzîdî, Nastûrî, Keldanî, Sûryanîyên ku bi sedan salan bi erf, adet û baweriyên xwe li ser vê axê jiyabûn, ahalîyê Cizîra Bohtan, Çolemêrg, Muks, Wan û Serhedê jî bê ku qeyda wan li ser dîrokê were kirin hatibûn jibîrkirin. Ji ber ku mezlûm bûn, bi ser neketibûn û têk çûbûn...

Bi van her du romanên dîroka Bedirxan Beg û malbata wan a ku bi neteweya wan re bûbû yek û li herêma Cizîrê Mîrîtî dikirin têdigihand ku dixwestin bîn ji bîrkirin û bidin jibîrkirin di met-neke wêjeyî de careke din dîroka wan jenand. Salên herî xirab bûn ji bo Mezopotamyaya Jorîn ev sal ku edalet, yekîtiyê û dîzen bi raya şûr diya dibû, ku di demên dawî yên dewleta Osmanî de paşayên şandibûn wir, ji bo bikaribin cemaatan bi-hedirînin ji xeynî şingîniya şûr û teqîniya tîfingên pê ve tu dest navetibûn tu çareseriyê û îxanet, mirin, kîn û nefretê hikm dabûn wan rojan... Wê Mîr Bedirxan jî eynî rê dabûya pêşiya xwe; bi şûr û tîfingê, wê weîlî yekîtiya di navbeyna mîr, axa, beg, şêx û cemaatên din ava bikira di nav dewletê de û paşê jî wê xeyala ji bo yekîtiya vê pêşerojê bikira.

Mehmed Uzun, di "Hawara Dîclê" de qala berî dîroka îro dike. Eyn wekî dîroka îro ya heyî ya berê, di romanê de mirov ne wekî tişteke, wekî kesayetiyeke, kes herî bi hêz radigire. Di romana dîrokî de dîroka berî îro, bes dikare bi hêza mirov a şênber û pratîk xwe bigihîne rastiyê. Di van her du romanên de kesayetiyan ku em wan dibînin û pêwendiyên di navbeyna bûyeran de guhertinên ku di nav van bûyeran de bi awayekî maddî û manevî hatine pê li gor van lêgerînan hatine avakirin; kederên şexsî, tiştên ji bilî wan tîr rayê ku bi tu awayî imkana wê nîn e û di nav vê çerxa dîrokê de digerin. Uzun, di destpêka romanê de, jiyana gundewarî ya ji rêzê ku Bilo, Apê Xelef,

Mam Sefo tê de dijîn, pêwendiyên di navbeyna cemaatan de, ku gav bi gav rengê tore û baweriyên tê diherifin, di nav dîroka wê demê de bi şeweyek helbestîya xembar, bi dengê tore, êş û jan, evîn û xwezayê dihone. Ez nabê bixwînin lê guh bidin van romanên. Bi awaza dengbêj Bilo, hemû dengên dîroka civakê ku bi janê hatiye ristin dide hev û li ber guhê xwendvan dibilîne Mehmed Uzun û êdî kevneşopîya devkî ku li ber mirinê bû, bi pêntûsa wî dibe vegotinên nivîskî.

Di rastiya xwe de, bêhna dengbêjan di hemû romanên wî de xwe bi mirov dide hisandin; dide pey dengên Mehmed Uzun. "Hawara Dîclê" jî bi hemû dengên nivîsiye. Di nav romanê de seranser dengbêj Bilo dipeyive, lê dengê tê mirov; carê Dîclê ye, carê Nînova ye, carê dengbêjên qedîm in, an jî dara tû ye ye, yê Mîr, Medreseya Sor, pirtûkên poxan girtine, yê şer e, pevçûnê ye û heta jî yê bêdengiyê ye. Tu dibê qey wî, zimanê nivîskî qulibandîye zimanê devkî. Zimanê "Hawara Dîclê" bi zimanê destanê, ûslûba wê bi nefesa dengbêjiyê hatiye honandin, tarzê wê ji romana ku jê re dibê roman, zêdetir modern e!

Giringiya Mehmed Uzun

Mehmed Uzun, ji bilî ku bi xwe dîrokek e, di romanên xwe de pêşî dor daye ristina dîroka gelê Kurd û ronakbîrên wê û wekî din jî li ser xwe jî ragirtiye. Têgihîştî ye. Bi ramana xwe ya ku hingî pêwistî pê heye ku wêjeyê nû were avakirin pêwistî ew qas bi çand û dîrokekê jî heye, ji romana xwe ya pêşî dest pê kiriye û berê xwe daye dîroka Kurdan a serobinobûyî. Lê belê, di van romanên xwe de kesayetiyan dîrokî û dramatîzekerîna jiyana van kesayetiyan ji fanteziyên ku bi şehle xwe li ser dîrokê pêçayî cihewaztir in. Li pey dem û hafizayê digere. Rabîrdû û kesayetiyan ku di nav wê rabîrdûyê de hatî jibîrkirin, yên ji bo gelê Kurd û çanda wan temenê xwe feda kirî ji nû ve wan bi bîr tîne û dide bi bîranîn. Dîroka ku tu cara neketiye nav pirtûkên dîrokê, lêkolîniya li ser li aliyê tevî ku heyîna wan hatî qedexekirin û ji gelê wî hatî bi durrîstin, hêmaya rasteqîniyê li ber çavan radixe. Ew serdemên ku qala hest û raman, trajedî û felaket, pevçûn, nakokiyên wan dike pirs-girêkên îro bi xwe ne jî.

Nabare, dijûnan nake, sirûdan naavêje, lê belê radestî, çewisandin an jî mecbûriyetekê jî nabîne;


qêrîna wî û ya gelê wî ku olana wê dilê me dis-
ûtîne di nav wêjeyê bi bilind dibe. Tevî ku ew bi
xwe jî tê de ye, tevî janên gelê xwe, berxwedan û
helwesta wî ya azadiyê, Uzun ne bi zimanê kîn û
nefretê, bi yê evîn, hezkirin, biratî, aşitiyê
dinivîse; hîlbet bi têgihîştina cihewaziyê ya ku
wêje bi zanebûniya xwe zanebûniya ku ji pirtûkên
dîrokê ferq in...

Di riya têgihandina çîrokên gelekî de ku di nav
metneke girtî de, xwe wekî hemwelatîyên miletek
yekgirtî didîtin, di demeke ku raya nasnameyan ji
holê rabûyî, pêwendiyên di nav civakan de qels
bûyî, bi bereketa rojên berê yên ronî didan ku
çanda gelekî vejene, bi vê bîr û baweriyê û bi
zagonên wêjeyî gav davêtin nav, ne bî ku wisan
were fêmkirin rêwîtiyeke rihet bû. Ji ber ku wekî
ku Uzun jî dibê, "Tiştê nivîskarên di yên dinyayê
dikin ew e ku kevneşopiya wêjeyê berdewam
dikin". Der barê armanca wan de berî wan gelek
tişt hatine zelalkirin, vitrînên wan ên ku ji aliyê
xwendevanên wan ve hatine pejirandin, kuli-
yateke wêjeyî ku berfireh û kamil e wergirtine, li
beramberî van nivîskarê kurd mecbûr e ku van
tiştên me gotî hemû ji nû ve bi destê xwe ava bike
û rêza wêjeya modern bide destpêkirin. Tevî ku ew
bi xwe jî hê di vê mijarê de serwext nebûne, nabe
ku hêviyeke wan ji xwendevan hebe. Ancax dibe
ku vê rewşa neyeksan, ev rewşa derengmayî, dibe
ku xwendevan vexwendeyî afirandina edebiyateke
nû bike û vê çerxê bizivîrîne. Pêwist e ku hingî
nivîskaran, ên bi Kurdî dixwînin û dinivîsin
parçeyek ji vê pêvajoyê ne.

Romanên wî bangek e, pêşî ji bo gelê xwe, paşê ji
me ku em hevparê erdnigariya wî ne. Rabîrdûyeke
jibîrbûyî, ji bo bîranîna hemû mirovên ku di nav
vê rabîrdûyê de temenê xwe fedayê gelê Kurd û
çanda wî kirî, wekî din, tevî ku jana xwîne, şidetê
û koçberiyê derbirin dike, ew serdemên ku hest,
raman, trajedî û felaketên wê, pevçûn û nakokiyên
ku bi zareke şairane honane, romanên Mehmed
Uzun li di çanda dinyayê de jî cihê xwe girtine. Bi
têgihîştina ku pê pala xwe daye wêjeyê herêmî û
tê de ne teqiniye, bereqsê vê yekê nivîskareke ku
bi rihê xwe bi herêmê ve girêdayî, bi têgihîştineke
mirovatî ji nû ve hatiye nixandî, ku mirov
bizanibe mirov aîdê ku ye û ev yek tê wê mehneyê
ku ji wir dikeve rê û ber bi gerdûnê ve diçe seyrê
ev metnên wî yên bi xembariyê tijî.

Uzun, romanên xwe li sirgûnê nivîsandibû. Lê
belê em têdigihên ku sirgûnî, zimanê ku rewşa
hest û zanîne bû jî bi xwe re bar kiriye diyarên
dûr. Ziman, bûye amûrê qada yekane ku ji warê
qedîm hatiye avêtin, bûye Riha, Mêrdîn, Di-
yarbekir bi xwe; ku lê xwedî derkevin, biparêzin,
pê tebikoşin. Sirgûn, bi zimanê xwe hatiye di nav
dilê xaka xwe de bi cih bûye....

Ji Weşanên Lîsê



Weşanên Lîs

Ma-Gül İş Merkezi, Katı 1, No: 66
İnönü Cad. Dağkapı - Diyarbakır
Tel: 0 412 228 97 76
e-mail: wesanenlis@yahoo.com

DER BARÊ ZIMANÊ MEHMED UZUN DE ÇEND TÊBÎNÎ

Zana Farqînî

Gava ji meriv tê pirsîn bê romannivîsên kurd kî
ne, navê ku berê tê ser zar û zimanan, nemaze ji
bo romannivîsên serdema me, navê Mehmed
Uzun e. Vî romannivîsî, ku bi berhemên xwe yên
hêja wêjeya me ya nûjen zengîn kiriye û bi pêş xis-
tiye, bêşik û guman ev yeka hanê li xwe heq
kiriye. Lê mixabin ku niha bi derdekî yeman re
têdikoşe û em bi çavekî na bi hezar çavî rêpana xe-
bera mizgîniya serkeftina wî ya li dijî vê êşa kafir
dikin.

Çawan ji pragrafa jorê xuya bû, mijara nivîsa min
Mehmed Uzun e, lê belê nivîsara min dê ne li ser
çawanî û naveroka romanên wî be. Ez dê ji aliyê
edebî ve hişê xwe nedim ser berhemên wî û bala
xwe bernedim ser honak û teknîkên romanên wî.
Bila ev alî ji pisporên vî kari re bimîne, bila rexne-
girên wêjeyê, bila wêjenas û edebiyatkar li ser van
hêl û layan rawestin, li wan hûr bibin û ramanên
xwe der bibin. Ez dê tenê ji aliyê ziman ve, ji aliyê
qalib, riyên vegotinê, biwêj û şayesên Kurdî ve, li
gorî zanebûna xwe li ser bisekinim, raman û
hizirên xwe bi we xwînerên delal re pareve bikim.
Serê pêşîn min divê ez bibêjim ku zimanê Mehmed
Uzun zimanekî sivik, hêsan û rewan e. Xwedî
şewaz û uslûbekê ye. Kesên ku bi baldarî
berhemên wî xwendibin, bêyî ku li navê nivîskêr

binêrin, tafilê pê derdixin ku ev qelem, qelesa
Mehmed Uzun e. Çimkî wî ji xwe re şeklên
bikaranîna peyvên bijartî, şeweya hevokan
durist kiriye. Hevokên wî zêde ne girift in, ne
kompleks in. Ji lew re ber û berhemên wî gazî
dikin ku ew ên Mehmed Uzun in.

Kesên dixwazin Kurdiya xwe bi pêş bixin, bêyî
bikevin kompleksê bi rihetî romanên wî dikarin
bixwînin. Ji ber ku ew bi endîşeya bikaranîna zi-
manê xwerû û sade, nakeve nav xetereya tehdeki-
rina li zimên. Ew zêde ne li dû peyvên çêkirî ye,
her wiha ew zêde ne li dû peyv û bêjeyên resen ên
Kurdî ye jî. Ew, peyvên ku ketine nav zimanê me,
bûne helal malê zimanê me, bêyî ku li ser kok û
eslê wan bifikire, bi kar tîne.

Piştî van gotinên ji bo destpêkê îcar ez dixwazim
bi navbernavan li ser çend xalên der barê zimanê
romanê yê Mehmed Uzun rawestim û ramanên
xwe rapêş bikim.

1) Şeweya Peyvan

Mixabin, çendî di warê zimanê nivîskî de ji aliyê
şeweya peyvên ve standardek çêbûbe jî, hîn
gelemşeya me ya vekîtê didome. Mebesta min a ji
rastnivîsê, ne tenê ji bo xalbendiyê ye, her wiha ji
bo şeweya peyvên e, ji bo peyvên hevedudanî û
yên din e. Dîsan çî heyf ku li ber destê me
rêbereke vekîtê nîn e da ku em bizanibin bê ka
kîjan peyv û bêje çawan tê nivîsandin. Ji lew re em
hez bikin nekin jî, dê di vî warî de gêjahî, alozî û
geremolî hebin. Li hêla din, ev rewş ne tenê li cem
Mehmed Uzun heye, hema bibêje her kesê ku bi
Kurdî dinivîse, di warê şeweya peyvên de dibe
xwedî vekîtekê û li gorî xwe şeweyekê dide pey-
van.

Ji bo ku mebesta min baştir bê fehmkirin, ez dê bi
dayîna nimûneyan berdewamî bidim nivîsara xwe.
Lê ez hez dikim bibêjim ku, hemû mînakên di vê
nivîsarê de bîna pêşkêşkirin, dê ji romana Mehmed
Uzun a bi navê "Hawara Dicleyê II" bin, ku ev
berhem ji hêla Weşanên Avestayê ve hatiye çap-
kirin. Min divê ez dîsan bidim xuyakirin ku, ez
nizanim bê weşanxaneya navborî çî qas dest li zi-
manê nivîskêr gerandiye.

Ji bo şeweya peyvên ez dê serê pêşîn peyvên
Mehmed Uzun bidim, paşê jî di nav kevanekê de

şeweyên heman peyvê yên din pêşkêş bikim:

Kahnî (kanî), tahm (tehm, tam), bîhn (bêhn, bihn, bîn), kahr (kar, karik), gwîz (gûz, goz), hejîr (hêjîr), qewet (qewet), bêhtir (bêhtir), hûnikahî (hênikahî, honikahî), tahlûke (talûke, tehlîke), diwa (dua, dia), umr (emr-jî/temen), co/cok (cih, cihok), kû (ku, ko), cih (cih, cih), bakûr (bakur), tahziye (taziye, tehziye), xwîdan (xwêdan, xweydan), çog (çok, çong), fahm (fam, fehîm, fêhîm), tavil (tafil), şevbuhêrk (şevbihêrk, şevbêrk, şevêrk), mijang (bijang), qetliyam (qetl'am, qetlîam), cimet (cimaet, cemaet), derin (diherin)....

Ev peyv, çend mînak bûn ku min ji romana navborî bijartin, li vir rapêş kirin û di nav kevaneke de jî awayên wan ên din dan ku nemaze ew di zimanê nivîskî de tîrker kirin.

2) Bikaranîna peyvên hevedudanî

Peyva rengdêr "her", ku ketiye zimanê Tirkî û di ferhengên de kok û eslê wê wek farisî tîrker kirin, di zimanê Tirkî de carinan bi tena serê xwe û carinan jî bi peyvên ve tîrker kirin. Em kurdên bakur ku ji dibistanên Tirkî rabûne û perwerdeya xwe birine serî, pirî caran li gorî vekîta (rastnivîsa) zimanê Tirkî tevdiagerin, loma jî em gelek kes vê "her" a xwe wekî wan, carinan bi peyveke din ve dinivîsin. Di ziman û rastnivîsa kek Mehmed Uzun de jî em rastî vê yekê tîrker kirin. Ji bo vê çend nimûne: Herwiha, her kes, hertim, herçi qas...

Li aliyê din, em di vekîta wî de rastî awayê bikaranîna van peyvên jî tîrker kirin: hew qas, evçend...

3) Nêr û mêtîya peyvên

Wekî tîrker kirin, di Kurmancî de peyv xwedî zayend in. Peyv an nêr e, yan mêtî ye yan jî bi gotina **Celadet Bedirxan** nêtar e. Bi gotineke din, hin peyv hem nêr hem jî mêtî ne. Di Kurmancî de der barê nêr an jî mêtîya hin peyvên de nelihevkerînek heye. Tu dibînî ku peyva tu nêr dizanî li herêmeke kurmancîxêv ew mêtî ye. Îcar ez dê li ser vê gelsê nesekînim û nebêjim bê çima peyva ku ez nêr dizanim di zimanê birêz Mehmed Uzun de mêtî ye. Na, ez dê wisan nekim, lê belê çî heye hin peyvên ku nêr û mêtîya wan ne mijara nîqas û gengeşiyê ye, nizanîm ji ber çî ye di romana navborî de za-

yenda wan wekî ku mêtî be, hatiye bikaranîn. Di bin vê navbernavê de tîstê ku ez dixwazim balê kişînim serê, dê ev yek be.

Ji bo ku mebesta min baş bê fehmkirin, min divê ez çend mînakên ji wan peyv û bêjeyan derpêş bikim ku ew hem wek mêtî û hem jî wek nêr tîrker bikaranîn: Sebeb, dims, kursî, sîng, wîcdan, mij, awir, sûret....

Lê çend peyvên ku ez dizanim nêr in, di romanê de wekî ku mêtî bin, hatine bikaranîn. Niha ez wan bi awayê hevokî pêşkêş bikim û jimara rûpela romana navborî ku hevokê tîrker kirin de derbas bûye jî di nav kevaneke de nîşan bidim: Ew dara tuyê ku min xwe, di danê êvarên zarokatiya xwe de li binê vedizeland.... (rûpel 10).

Di vê hevokê de ku min binî xêz kiriye, peyva "bin" mîna ku zayenda wê mêtî be hatiye bikaranîn û tewanga mêtîtiyê ya yekejimara a binavkirî /-ê/ pê ve hatiye danîn. Diviya ku tewanga nêrtiyê ya yekejimara a binavkirî /-î/ bihata dawîya peyvê.

...em ji binê geliyê ber bi bilindahiyên zinar û çîyan ve hilkişîyan (rûpel 12). Di vê hevokê de peyva "bin" jî aliyê zayendê ve rast e, îcar peyva "geli" wekî ku mêtî be hatiye bikaranîn. Peyva "geli" jî diviyabû ku bi /-ê/yê nehata tewandin. Ji ber ku ew peyveke nêr e. Her wiha peyva "çîyan" jî bi awayê kurt, wek zimanê devkî hatiya tîrker kirin: Bi ya min diviya ev hevoka ku bûye mijara min, wiha bûya: ...em ji binê geli ber bi bilindahiyên zinar û çîyayan ve hilkişîyan...

Dîsan di heman rûpelî de peyva "geli" wekî ku nêr be hatiye bikaranîn: ...em dabûn pey xwe û biribûn bin geliyê wîcdana xwe (rûpel 12).

... min ê êrîşekî xedar bibirayê... (rûpel 99). Ji aliyê tewanga nêrtiyê û mêtîtiyê ya yekejimara a nediyar ve şaşiyek heye ku peyva "êrîş" çendî mêtî be jî wek peyveke nêr hatiye tewandin. Jixwe di zimanê devkî de meyleke wiha heye, di dema kişandina peyvên mêtî yên yekejimara a nediyar de, ew li gorî tewanga nêrtiyê tîrker kirin û li şûna qertafa /-eke/, radibin /-ekî/yê tîrker kirin dawîya peyvê. Lewma diviya ku ji aliyê vekîta ve wiha bûya. ... min ê êrîşeke xedar bibirayê...

Lê li gora bejna jinên Cizîra Botanê ew dirêjtir bû (rûpel 22). Kek Mehmed Uzun carinan peyva Botan tewandiye û carinan netewandiye. **Celadet Bedirxan** dibêje ku peyva "botan" peyveke dariştî ye û bi /-an/ê hatiye duristkirin ku ew her wiha tewanga pîrejîmariyê ya binavkirî ye. Ji lew re hewce nake mirov careke din wê bitewîne û biçivîne. Jixwe di zargotina Kurdî de mirov rast lê tîrker ku nayê tewandin.

4) Bikaranîna qertafa dema bê

Rêzdar Mehmed Uzun di romanê de geh qertafa (pirtika) dema bê bi cînavkê ve geh jî bi cînavkê cuda nivîsiye. Jixwe di zimanê nivîskî de, der barê vê rewşê de tevliheviyek heye. Hin kes angaş (îdia) dikin ku divê ji cînavkê cuda be û hinde kes jî diangêjin ku divê bi cînavkê ve be. Lê belê tîstêk heye, kesên xwediyê angaşta ku divê ew bi cînavkê ve be, gava wê qertafê mîna "dê" dinivîsin îcar jî cînavkê cihê dinivîsin. Divê bidim diyarkirin ku qertafa dema bê di zimanê nivîskî de bi sê awayan tîrker kirin: ê, dê û wê. Lê "wê" tenê ji bo kesê sêyemîn ê yekejimara û pîrejîmar tîrker kirin. Ez bi xwe jî xwedî wê baweriyê me ku awayê wê yê berê dibe "dê" be, ku ew di zimanê devkî de li hin herêman mîna "tê" jî tîrker kirin. Niha em ji bo vê yekê mînakên ku me ji romanê wergirtine derpêş bikin:

Min ê jê re gotinên Kurdî bigota û heke ewê bikaribûya gotin bibihîsta, hingê hebû ew bitirsiya (rûpel 20). Wekî tîrker kirin pêşî jî cînavkê cihê paşê jî bi cînavkê ve nivîsiye. Li hêla din, ji aliyê grammatîk ve jî di hevokê de gelsê heye. Peyva gotin bi awayê pîrejîmar hatiye bikaranîn, lê belê lêker jî bi awayê yekejimara hatiye kişandin. Eger em hevokê rast bikin: Min ê jê re gotinên Kurdî bigotana û heke ew ê bikaribûya gotin bibihîstana, hingê hebû ew bitirsiya.

Ez du mînakên din jî der barê vê mijarê de bidim: ... min ê êrîşekî xedar bibirayê... (rûpel 99) û ..ewê got û awirê xwe yê tuj vegerand ser Amojnê... (rûpel 99). Di van her du hevokên nimûneyî yên jêgirtî de, dîsan didin nîşan ku di warê vekîta bikaranîna qertafa dema bê de nelihevkerînek li cem nivîskêr bi xwe heye. Her wiha ji aliyê tewanga nêrtiyê û mêtîtiyê ya yekejimara a nediyar ve jî şaşiyek heye ku peyva "êrîş" wek peyveke nêr be hatiye tewandin. Diviya ku ji aliyê vekîta ve

wiha bûya ku ez di bin navbernavê 3yan de li ser sekinîbûm. ...min ê êrîşeke xedar bibirayê...

5) Bikaranîna /bi-/ya fermanî

Ev /bi-/ya fermanî ji bilî lêkerên çêkerî (dariştî) di cure lêkerên din de tîrker kirin. Mebest û alaza min a jî lêkerên çêkerî ev e: Wekî tîrker kirin hin qertafên me yên lêkerçêker hene. Mîna /da-/ /hil-/ /ra-/ /ro-/ /ve-/ -wer-/ û hwd. Ev qertaf tîrker kirin lêkerên sade û ji wan lêkerên dariştî tîrker kirin. Mîna "xwarin" û "daxwarin", "dan" û "hildan", "gotin" û "vegotin", "xistin" û "raxistin", "kirin" û "rokirin" û gerîn" û "wergerîn".... A di dema kişandina van cure lêkeran de ev /bi-/ya hanê nayê bikaranîn. Jixwe em di zimanê devkî de jî rastî vê yekê nayên. Tenê li çend herêman kurmancîxêv nemaze li herêma Torê ev cure lêker bi awayekî din tîrker kirin û ji dêla ku qertafên kêşana demê û yên neyîniyê bikevin navbera qertaf û lêkerê, tîrker kirin qertafa lêkerçêker. Mînak. Veneke (neveke), ez avê vedixwim (ez avê divexwim), ez radizim (ez dirazim û hwd).

Îcar birêz Mehmed Uzun mîna hin nivîskaran ku em di zimanê nivîskî de rastî wan tîrker kirin, vê /bi-/ya hanê di van cure lêkeran de bi kar tîne. Ew di şûna ku bibêje "ragirim" dibêje "rabigirim", ji dêla bibêje "hilweşayana" dibêje "hilbiweşayana". Ji ber ku mînakên wiha zêde bûn min hewce nedît ku ez wan di nav hevokên wî bi xwe de bidim nîşandan.

6) Bikaranîna ergativiyê

Ev mijareke girîng e û ew çend jî dijwar e. Ji ber ku hin deverên me yên kurmancîxêv hema bibêje bi tevahî dev ji vê taybetiyê berdane ku ev taybetiyê zimanê me ya girîng û diyarker e. Heta hin pisporên zimanê Kurdî, diangêjin (îdia dikin) ku divê em ji vê taybetiyê neqerin. Sedem jî wiha nîşan didin ku ziman li deverên gundewar gava ber bi deverên bajêr ve diçin kaw didin, werar dibin û hin taybetiyên xwe wîndan dikin. Loma jî divê ku em guh nedin wan taybetiyên kevn.

Ez bi xwe jî çendî mijara ergativiyê diparêzim û heta ji min tîrker kirin ez di nivîsarên xwe de dixwazim bi kar bînim jî, lê ji ber devera ku ez jê me, ez dikim nakim nikarim xwe jê bifilitînim û bêhemdî şaşiyar dikim. Ji lew re divê ku di vê mijarê de mirov zêde hişyar be, da ku çewtîyan neke. Kek Mehmed Uzun, bi qasî ku ez dizanim li ser

şop û rêça **Celadet Bedirxan** e û vekît û rêzimana wî ji xwe re rêber dibîne. Ez ji ber şeweyên hin peyvyan û bikaranîna tewang û rêzîkên zimên tê derdixim ku birêz Uzun bi baldarî li ser van meseleyan hûr dibe û heta jê tê rîayetî van rêzîkan dike. Lê dîsan ji ber banekî û hînbûniyên xwe yên berê, mirov bêyî hemdê xwe şaşiyên rêzîmanî dike. Ji bo vê dabaşê ez dê tenê du mînakên bidim û awayê wan ê rast jî li bin wan bidim. Heke ez û wê bi tenê bûna... (rûpel 99) Keke ez û ew bi tenê bûna...

Min wê bedena wê, hêt, şeq, memik, rû, lêv, dev, dil û ruhê wê arzû dikir... (rûpel 108)
Min ew bedena wê, hêt, şeq, memik, rû, lêv, dev, dil û ruhê wê arzû dikirin...

7) Hevokên şaş ên ji aliyê rêzîkên zimên ve
Mînakên ku min ji bo vê navbernavê hilbijartine, heta ji min hatiye, yên berbiçav in ku di zimanê me yê devkî de hene û xwedî qalib in. Bi gotineke din, jixwe ew tînan û li ser wan lihevkirinek heye. Wekî tê zanîn, her ziman xwedî qalib, riyên vegotinê, şayes, biwêj û gotinên pêşiyên e. Ev rewşa hanê jî mîna pergala zimên a kodan e. Gava mirov van qodan xera bike, ji aliyê serwestbûn û tîgihîştinê ve alozî pêk tê û ziman jî derbe dixwe. Lewma divê ku haya mirov ji van yekan hebe.

Niha jî, ji bo ronîkirina van gotinên ku me li jorê kirin, em serî li dayîna nimûneyan bidin: Dengê nalîna Esterê ku nerm, tenik û giran bû hîç çu carê ji ber guhê naçe (rûpel 12). A rast di vê hevokê de, ku min li sê cihan binê peyvyan xêz kiriye, ne îtirazek sê îtirazên min hene. A pêşîn deng an zirav an jî stûr e, ku birêz Uzun bi xwe jî, di hevoka pey vê hevokê de gotiye dengê zirav. Heta hin kes îcar di şûna dengê stûr de dibêjin dengê qalind. Ev şaş e. Bi awayekî giştî ji tiştên silîndirîk re zirav û stûr û ji tiştên pehn re jî tenik û qalind tê gotin. Îcar kurmanc ji bo "deng" û "dû" peyvên zirav û stûr bi kar tînin.

Li aliyê din peyvên "hîç" û "çu" hemwate ne, ku nemaze li hêla Botan, Hekar û Behdînan li şûna "tu"yê "çu" dibêjin. Li vir qewimîneke denganiyê heye û em pê dizanin ku di Kurdî de ev her du deng (t û ç) bi hev diguherin. Mîna "têjik" û "çêjik". Loma bi vî awayî nabe. Îtiraza min a din jî li derbirina "ji ber guh naçe" ye. Di zargotina me

de, ango di zimanê me yê devkî de ev biwêj heye. Wekî "qet ji ber çavê min naçe." Lê min bi xwe nebihîstiye ku dibêjin "dengê wî/wê ji ber guhê min naçe." Lê dibêjin "dengê wî/wê "ji guhê min dernayê."

Ku ez hevokê li gorî zanebûna xwe rast bikim: Dengê nalîna Esterê ku nerm, zirav û giran bû çu carê ji guhê min dernayê.

... û jinikeke dîn a xama ku halê wê ne baş bû... (rûpel 14). Di vê hevokê de rexneya min li gotina "xama" ye ku min binî xêz kiriye. Ev peyv nemaze ji bo keçên bermirad, keçên nûgihayî, qîzên ciwan tê gotin. Ku keç zewicî bi şûn de jê re "jinikeke dîn a xama" nikare bê gotin. Ancax, keç hîn nezewicibe mirov jê re dibêje keça xama. Bi ya min ev hevok dikare bi awayê "... û jinikeke dîn a ciwan ku halê wê ne baş bû..." bê sererastkirin.

...bi hilavêtina berbangê, dengê beq, mêş, pêşî û teyrên dirinde... (rûpel 16). Dîsan di vê hevokê de rexneya min li ser gotina "hilavêtin"ê ye. Berbang hilnaavêje. Berbang an diavêje yan jî lê dide. Herçî peyva hilhatin e, ew ji bo derketina roj, heyv û stêran e. Berbang, ne navê cîsmekî esmanî ye, ew navê demeke serê sibehê ye. Li aliyê din peyva deng jî wek yekejimar hatiye bikaranîn, divê ew jî pîrejimar be. Lewma ez dibêjim mirov dişê vê hevokê wiha sererast bike: ... bi avêtina berbangê re, dengên beq, mêş, pêşî û teyrên dirinde...

Di nav van hemû hîsên têvel de, ku bi qasî demeke dirêj min jê dernedixist ka ew çî hîs bûn... (Rûpel 21). Bala we kişandibe min binê "jê"yê xêz kiriye, ji ber ku gelş di wê de ye. Di wateya fêhmîkirin û tîgihîştinê de lêker "tê derxistin" e, ne "jê derxistin" e. Ji lew re, bi ya min gerek hevok wiha bûya: Di nav van hemû hîsên têvel de, ku bi qasî demeke dirêj min tê dernedixist ka ew çî hîs bûn...

Em berdewamî bi dayîna hevokên nimûneyî ku min ji romanê girtine, bidin: ... lê difnên poz, heye ku ji ber zehmetiyên dan û girtina nefesê gelek fireh bûn (rûpel 22). Em yekser bibêjin li şûna "difn" diviya ku "firn" an jî "firnik" bihata gotin. Ji ber ku "difn" hem wateya "poz", "bêvil" û "kepû/kepi" ye. Em dirêj nekin û hevoka xwe ya alternatîf derpêş bikin. ...lê firnên poz, heye ku ji

ber zehmetiyên dan û girtina nefesê gelek fireh bûn.

... û jê re jî delingên derpiyên wê yên herîrî... (rûpel 22). Peyva deling (ku ji der+ling tê) di wateya devdeling, (ango devderling), devling û pancikê de hatiye bikaranîn. Lê çî heye ku "deling" û "derpê" hemwate ne. Ez hevokê dikarim wiha sererast bikim: ... û jê re jî devdelingên derpiyên wê yên herîrî...

... ew hemû keda min a anîna keçikê dê bi hewa de biçûya (rûpel 27). Ev biwêja hanê ya binî xêzkirî ji min re xerîb hat. Di şûna wê de biwêjên "bi avê de çûn", "bi ro de çûn", "berhewa çûn" û "beredayî çûn" hene.

Herê herçî qas ewê hinekî hiş leqandibe em naşên jê çêtir bibînin (rûpel 36). Ji bo vê biwêjê jî (ku min binî xêz kiriye), ez nerazîbûna xwe dixwazim aşkera bikim. Ez bi biwêjên "hiş avêtin", "hiş firandin", "aqil avêtin", "aqil çeliqandin", "aqil firandin" dizanim ku hene, lê ez rastî tebîreke wiha nehatime. Lewma "hiş leqandin" ji min re xerîb hat: Herê, her çî qas ewê hinekî hiş firandibe jî em naşên jê çêtir bibînin

... de dev ji van gotinên tewşo-mewşo berde û bê aliyê min... (rûpel 40).

Min bi hêdîka aliyê wê kir... (rûpel 40)
Min bi zanebûn ev her du hevok li dû hev dan. Ji ber ku lêkera "alî kirin", bi min ji aliyê vekîtê ve şaş hatiye bikaranîn. Di şûna ku em dibêjin "bê aliyê min", em dibêjin "bê alî min", an jî "alî min bike" (yan jî "aliyî min bike"). Ji hevoka "bê aliyê min" mehneyeke din jî diçe. Yanê were "odeya min, cihê min" û hwd.

Di heman romanê de, li cihekî çavê min bi tebîra "kevçiyê textik" ket. Lê mixabin, min ji bîr kiriye ku ez hejmara rûpelê qeyd bikim. Tiştê ez dizanim, ji kevçiyên ku ji daran çêdibin re, di kurmancî de "kevçiyê darîn" tê gotin. Lewma min xwest ku ez dijatiya xwe ya li hemberî gotina "kevçiyê textik" jî bidim xuyakirin û bibêjim ku ew "kevçiyê darîn" e.

Ez vê beşê naxwazim zêde dirêj bikim, bi rastî gelek hevokên nimûneyî ji bo vê mijarê jî min ji nav romanê hibijartibûn. Le ji bo ron û zelalbûnê,

min tenê qîma xwe bi dana van mînakên anî.

8) Hevokên ku bêhna bandora Tirkî ji wan tînan
Em Kurdên Bakur ên xwende û xwendewar, ku ji nav perwerdeya bi zimanî Tirkî rabûne, di bin bandor û hîkariya zimanê Tirkî de ne. Gava em li xwe, li eslê xwe vedigerin û dixwazin bi zimanê xwe biaxivin û binivîsin, mixabin ku em zû bi zû ji bin bandora zimanê Tirkî xelas nabin. Çimkî zimanê me yê perwerdeyê û hîndekariyê, zimanê me yê hizirîn û derbirina hest û ramanan bi Tirkî ye. Em ji çand û zargotina xwe, ji zimanê xwe dûr ketine. Vegerîna lê jî, biêş û jan e. Têkoşîneke xurt, keftûlefteke zêde û lêhûrbûneke cidî ji me re divê.

Ji lew re eger mirov bi awayekî giştî bibêje ku nivîskarên bakur kêm zêde di bin bandora zimanê Tirkî de ne, ez welê hizir dikim ku dê zêde îtiraz ji vê gotinê re çênebe. Mixabin, ez dixwazim bibêjim birêz Mehmed Uzun jî di nav vê kategoriyê de ye. Di zimanê wî de jî mirov rast û leqayî bandora zimanê Tirkî tê. Helbet, ez ne li dij im ku divê mirov ji zimanê perisî, werabûyî sûd û kelk wernegire. Ev yek hewce ye jî. Bi saya wan zimanan mirov dikare zimanê xwe bi pêş bixe û geşê pê bide. Ji lew re ez jî dipejirînim û qebûl dikim ku ew ziman li ber zimanê mirov, derî û pencereyên din vedikin. Lê divê ku em bi zanebûn ji wan sûd wergirin. Qalibên nû, tebîren nû, riyên vegotinê yên nû, biwêjên nû yên ku hewcedarî û pêwîstiya zimanê me bi wan heye, li zimanê xwe bînin ne ku wan yek bi yek li zimanê xwe wergerînin.

Niha jî ez çend nimûneyan ji bo vê dabaşa me ji romana "Hawara Dicleyê II" bidim. ...heyata me hilweşand û ... (rûpel 8). Bêhna gotina Tirkî ya "hayatımızı yıktın ve..." jê tê. Li şûnê heke "heyata me ser û binê hev kir..." bihata gotin bi ya min dê baştir bûya.

... Medresa Sor îhtîşama xwe wînda kiriye (rûpel 12). Biwêja Tirkî "ihtîşamı yitirmek" tîne bîra min. Gelo meriv bibêje ku "ihtîşama Medreseya Sor nemaye" dê ziyaneke bigihîştaya mebest û wateyê?!

...qetliyameke hov hatibû pê (rûpel 13). Di zimanê me yê devkî de, bi hêsanî û rihetî "qetliyam çêbû" tê gotin. Çima qetliyam pêk hat? Ev awayê gotinê

ez dikim nakim gotina "katliam gerçekleşmek" a Tirkî bi bîra min dixê.

...û Ester, bi saxî li wir peyde kir... (rûpel 13). Lêkerên me yên "dîtin" û "peyde kirin", bergindên "bulmak" a Tirkî ne. Lê carinan mirov li beranberî "bulmak"ê "dîtin" û carinan jî "peyde kirin"ê bi kar tîne. Di vê hevokê de li şûna "peyde kir" de eger "dît" bihata gotin, bi ya min dê derbirineke bi Kurdî bûya: ...û Ester, bi saxî li wir dît...

...keldanên ku bi tesadûfî li pey qetliyamê mabûn... (rûpel 14). Ji vê hevokê jî, bi min bêhna bandor û tesîra zimanê Tirkî tê. "li pey qetliyamê mabûn" wekî wergera "katliamdan arta kalmışlardı" ya Tirkî ye. Heke "ji qetliamê fil-itîbûn" an jî "ji ber qetliamê mabûn" bihata gotin dê baş û xweştir bûya. ...keldanên ku bi tesadûfî jî ber qetliamê mabûn...

Di esasê xwe de çend birîndarên din jî hebûn... (rûpel 14). Nerazîbûna min, ji awayê gotina "di esasê xwe de" re heye. Ev biwêj ji zimanê Tirkî tê, ez wisan dihizirim. Li cihê wê "a rast" bihata bikaranîn, dê hîn bikeys bûya.

Birîndarên xwe davêtin ser pişta xwe... (rûpel 16). Gelo mirov dibêje avêtin ser pişta xwe? Gelo ev ne ji ber fikirîna Tirkî "sirtuna atmak" qewimîbe? Ez wisan texmîn dikim. Çimkî ez bi "dan pişta xwe" dizanim: Birîndarên xwe dan pişta xwe...

...yek ji sîmayên herî nas ên cimeta cihûyan e (rûpel 25). Hema yekser biwêja Tirkî "tanıdık sima" hat hişê min. Di şûna wê de "yekî naskirî" hîn bêhtir Kurdî xuya dike. Li hêla din gerek ne "ên cimeta cûyan e" lê "ê cimaeta cûhayan e" bûya. Awayê ku min li gorî xwe rast kiriye ez derpêş bikim. ... yekî naskirî yê cimaeta cihûyan e.

...şer ku ji ber vê sebebê yan wê sebebê, gir an hûr derdike ... (rûpel 52). Nizanim, lê hema tafilê gotina "ufak veya büyük çaplı savaş" a Tirkî hat hawara min. Ez ji xwe dipirsim gelo di zimanê me de tebîra şerê hûr an jî şerê gir heye? Gotinên mîna şerê biçûk, şerê mezin û şerê giran di bîra min de hene ku min ew ji zimanê devkî berhev kirine.

Li aliyê din, di zimanê nivîskî de ez pir rast lê tîm

ku dibêjin "şer derket" ku ez hizir dikim ji Tirkî (savaş çıkmak) ketiye ser zimanê me xwendeyan. Li şûna wê "şer rabû", "şer çêbû" û "şer qewimî" heye. Ez wiha dest li hevokê bigerinim, gelo dê xerabtir bibe?!: ...şer ku ji ber vê sebebê yan wê sebebê, biçûk an giran diqewime....

Yan jî mîna kuştin û hilweşînê jî em dikarin şer bi nav bikin (rûpel 52). Ew peyvên binxêzkirî hebûna gotinên Tirkî "ölüm ve yıkım" bi mirov dide hisandin. Bi ya min, mirov dikare berginda wan a bi Kurdî wek "kuştin û wêranî" jî bide. Yan jî mîna kuştin û wêranîyê jî em dikarin şer bi nav bikin.

... janeke zirav a derba şûr hîs kiribû (rûpel 75). Lêkera hîs kirin, ez wisan texmîn dikim ji zimanê Tirkî hat ket zimanê me yê devkî û nivîskî. Ez behsa koka peyvê (hîs/his) nakim. Peyv bi koka xwe bi erebî ye. Di zimanê me yê devkî û di zargotina me de peyva "his" û lêkerên "pê hisîn", "pê hisandin", biwêj in "bi xwe derxistin" û "di xwe derxistin" hene. Li aliyê din vê paşiyê "hest pê kirin" ketiye nav zimanê me yê nivîskî. Li gorî van daxuyaniyan ez hevoka xwe ya alternatîf pêşkêş bikim: "bi janeke zirav a derba şûr hisiyabû."

Ji ber endîşeya ku nivîsar zêde dirêj nebe, min nexwest ez li ser mînakên din jî rawestim. Bi ya min ji bo serwextbûna mijarê ev nimûne bes in.

Wek encam ez dixwazim çend gotinan bibêjim û dawî li mijara xwe binim. Birêz Mehmed Uzun di warê bikaranîna ziman de her diçe xurttir dibe. Gava mirov li berhemên wî yên destpêkê binêre û yên wî yên van dawiyayan bide ber hev, ango wan hevber bike, dê bi sanayî vê rewşê bibîne. Ew çawan dixwaze şewazeke xwe biafirîne û zimanê romana Kurdî xurt û dewlemend bike, her wisan ew li dû hêma û şayesên (teswîrên) zengîn e jî. Ew li pey bidestxistina qalibên nû, riyên vegotinê yên nû ye û gava vê yekê dike jî xwe ji zargotina Kurdî dûr naxe. Zimanê xwe, şewaz û uslûba xwe bi zargotina Kurdî dixemilîne û ji wê kan û çavkaniyê sudeke baş werdigire.

Bi zanebûn, bi awayekî hendaze peyvan hildibijêre û li gorî aheng û ritmê, hevokên xwe saz dike, tu dibêjî qey pexşanekê dinivîse. Ji lew re mirov tî

derdixe ku xemxurê vî zimanî ye, beşî ku ziman hişîne û tehdê lê bike.

Gotina dawî ya ku ez hez dikim bibêjim ev e. Spas Mehmed Uzun ku te bi rik û inad li ber xwe da, da ku tu gav bi vî zimanî bidî avêtin û careke din spas jî te re ku te bi berhemên xwe serê me bilind û rûyê me spî kiriye. Ji vê ked û xizmeta we re, tenê ji min tî ku ji we re bibêjim mal ava Mehmed Uzun.



MEHMED UZUN LI SER STÎLEKE RÊKÛPÊK RÛNIŞT

Medenî Ferho

A rastî, nivîsandina bîranîn û serpêhatiyan ji bo min zor e... Berekî giran e. Cureyê herî zor yê nivîsandinê ye. Dema xwendevan li sernivîsê binêrin, direkt ew ê dizanibin mijar Mehmed Uzun e. Ev jî xelega duyemîn asê û zor e. Nivîsa min a yekemîn li ser Mehmed Uzun hestên min bûn. Gotinên wî yên li Amedê bandoreke erênî li min kirin. Amed, di gihîştina min a îroyîn de roleke sereke listiye. Zarokên wê, evîna wê, bircên wê, kolanên di nava romantîzma xuloxafiya nermik de dinalin, kevirên bi reng û temtêla dîroka demdirêj bi reng-vedana sûravka efnikgirtî û di kêleka hev de risimandî, hestiyên min stewardin, ava kîmyewî ya nava mêjiyê min rengîn kir. Germa demsala havînî ku di nava çakûç û sidan de ziwa dibe, bi xwêdana mirovan cewher digire, reng da xwîna min... Ava Mezin -Dicle- ku ez gihandim ber xeniqandinê, tirsê avê kire dilê min... Heya niha jî nizamim avjeniyê bikim... Ava fîsqeya ku spî dirije, lê bêhna ewrên reş î tîrş dibalivîne, tûyên şemî û tey-teawan dike miştaxeya dilxweşiya zarokan... Tenê li Fîsqeya dengê zarokan bi avê re dikene, av bi kenê zarokan re şeqênîyê ji kevirên reş tîne. Tivêla rûdêna zarokên li kûç û kolan kar dikin, xizanî, neçarî, coş û hêrsa gelê Kurd resim dike. Ava sûsê, hêsrên erd û esman in...


Ava sûsê... Xweşmeya Omer Xeyam û-meyfiroşa Melayê Cizîrî ku mirov serxweş nakin... Zengil û

şirîna ava sûsê, dengê nalênîya Şalûl û Bilbilê baxçê dilê Feqê Teyra ne, lê mirov kezêb-herhilî nake. Şelîpana kulkeseriya dîroka talankirî kom dike, girîş dike, saz dike û di nava qesebê zêr û zîv de qaz dike.

Taybetmendîya Amedê di nava bajarên Kurdistanê de hest û nav e... Hestên neteweyî ye, navê payî-padî-gahî-cihan-darî-şumul î text e. Lewra ew keslana sergêjekî ku mîna tozika mirinê bi ser bajarên Kurdistanê de hatiye reşandin, li Amedê peyde nabe. Tivêla rûdêna rojê li bajarên Kurdistanê cuda ye û bi rengê komên xelkê niştecih, rengîn dibe. Li Amedê rengê asîmanê erdnîgariya zêrîn û xalvedana xunafa berî baranê, wiha nermik û şiloke di nava rengên rojê de, bi temtêla reqsa stêrikan dide xuya kirin. Mirov dinalîne... Nalîna ku tengezariyê difelişîne... Her dem, di nava her cureyê hoy û mercan de zîndî ye, enerjîk e... Her sibeh bi rojhilat re, poema Kurdî di nava tîrêjên rojê de, bi xet û tîrêjên qozmîk li ser Amedê xal vedide. Efsaneyên gelê Kurd, ên ji demjiyana destanan gihana roja îroyîn, helbestên lîrik ku di nava tevna bi xunava dîrokê hatine kurisandin, bi kevirên reş ên bedena kelê re xewnên kûr bibînin jî, di neqşên li ser keviran xemrevînê dilorînin. Ev jî pîroziya duyemîn a bajarê Amedê ye.

Têkiliya min û Mehmed Uzun, sala yekem bi hatina Ewrûpayê re (1992), dest pê kir. Li mala Feqîr Ehmed, Kolnê... Roja pêşî ku me hev nas kir, ciwanekî Kurd jî li wir amade bû. Axaftina navbera wî û Mehmed Uzun enteresan bû.

Em sê kes bûn. M. Uzun, Ciwanê Kurd û ez. Pêşî Ciwanê Kurd dest bi pirsan kir û yekem pirsê ji Mehmed: Çima tu di romanên xwe de stîlên cuda bi kar tîni? Mehmed Uzun, di nava beşîşineke her dem de: Stîla min ev e, tu di mijarê digihije yan na? Ciwan: Belê têdigihijim, pirsgerêka min di wî alî de tune ye, rexneyên min jî tune ne... Dixwazim bêjim weke roman-nivîsekî Kurd, tu dikarî bibe ekolek... Mehmed Uzun ciddî: Ekol, ne karê mirovekî bi tenê ye... Grub pêwist in... Min gotin ji devê M. Uzun girt û got: Naaa, di vê mijarê de dîtina min cuda ye, mirovek dikare bibe destpêka ekolekê, grubek jî dikare ekolekê derbixe holê, yan jî grubek bike û bi navê saziyekê bide pêş... M. Uzun: Tu dikarî mînakan bide? Min got belê: Picasso... Yan jî grubê Dadaîzm... Saziya



Frankfurt li Elmanya... Lê dive em ji bîr nekin ku yek ekol bi tenê, ji nişka ve derneketiye holê... Teva li ser bingehekê, li ser firazeyekê hatine ava kirin.... Pêwiste "înfiâl-î aşk" hebe!.. Mîna Balzac dibêje, dive ku kêştiyên ji hiş û raman barkirî hebin... M. Uzun, hinekî rawestiya, berê xwe da ciwan, bi gotinên nerm û hêdî: Civaka me di nava xewnên giran de razayî ye, cih cihan felc e, pêşî em rakin ser lingan... Tiştên hûn dibêjin piştê tîrêjên...

Ciwan, li hember bersiva Mehmed Uzun hinekî rawestiya, bi dengêkî ji xwe ewle: Gelê Kurd destîniya xwe ya kor û kerende şikand? Destîniya

kor û kerende çemê bêbor e, mirov dixeniqîne... Niha ev destîni di rewşeke din de derketiye holê. Tabûyên siyaseta fermî di çemê herka dîrokê de ku bi sed û bend hatibûn ava kirin, hatin hêrivandin... Ciwan dixwest dirêj bike. Min, gotin ji devê wî girt... Mehmed rast dibêje, civaka Kurd her çi qasî dest avêtibe çek, sed û bendên di herka dîrokê de ku li hember destîniya gelê Kurd hatibûn ava kirin û rewşeke ker û kerende derxistibûn holê hêrivandibin jî, di aliyê edebiyatê de hîna zaroka di pêçekê de ye... Edebiyat sebrê dixwaze û pêdiviya afirandina wêjeya Kurdî bi demên dirêj heye. Navenda kêşa entelektueliya Kurd tune ye, ev jî du lingên wê seqet dike.

Axaftinê dirêj kir, lê ciwanê Kurd li ser miqeresiya xwe rawestiyabû, bi hêsanî ramanê xwe ne diguhert, tiştêk jî erê ne dikir. Rastiya ku "şûr li gorî siyasetê ji kalan derdikeve" erê ne dikir. Heya mêvanên din hatin, axaftina me dom kir. Dema ku mirov îro li rewşê dinêre, Têkoşîna Gelê Kurd ketiye wêjeyê. Dîrok dibin çavan re tê derbas kirin û di

destîniya gelê Kurd û serhildanên gelê Kurd de, tê dadgeh kirin. Dive ku em ji bîr nekin; Têkoşîna Rizgarîxwaz a Gelê Kurd ya îroyîn senteza 29 serhildanan e û li ser bingeheke felsefeyî hatiye rûnandin. Tevgera gelê Kurd ketiye çarçoveya jiyana bi -îstîkbal-. Gotinê, bêhna barûdê li xwe pêçaye û dixwaze di rengê dilovaniya mirovaniyê de derbikeve holê. Gelo wê dikaribe bêhna barûdê ji ser xwe biavêje, rewşê biguhere û di rengê bêhna gul û gulbijêrkan de baxçeyê dilan behiştî bike? Guhertin tenê di destên eniyekê, aliyekî de nîne. Jiyan têkilî ye û hevpar e. Di şerê guhertinî de ku bi tevahî ekolojiya têkilî, paşeroj û tevgera du-sê welatan tê guhertin hêsa nîn e. Lewra rola

nivîskar û rewşenbîran giring e.

Dojeh para Kurdan ketiye û bi destê dijmin fereh bûye. Hêvî maye utopya paşerojan.

'Gelo' û utopya paşerojan, barê ser milê nivîskaran nîne gelo?

Mirovanî, liqasî şûr dibin bandora gotinê de ye. Nîrê gotinê, ji roja gotin bi hevûdin ve hatin darvekirin û weke ristîk derkete holê, heya îro li ser stûyê mirovan e. Derketina holê ya destanên dirêj, helbestên lirîk belaş nîn e. Gotin bi îradeya mirovan derdikeve, lê di destê sêhrebendan de dibine hêza efsûnî. Serdestiyê li destîniya mirov dikin. Îdeolojiya dîroka hiş û raman ku tacîdariyê li komên xelkê dike jî, gotin e. Lewra guhertina rewşê û reng-dayîna pêvajoyê, di hêza gotinê de diyar dibe. Pêxember û hêza pêxemberan, yan jî mirovên serdestî li dîrokê kirine, esker, sivil, feylesof û zanist mînakê vê yekê ne.

Her rewşenbîr, her nivîskar hemberî herika dîrokê berpirsiyar e. Lewra gotin û gotarên li ser nivîskaran jî di dibistana rewşenbîriyê de cihêkî taybet digirin. Nivîskarî orijînalîte ye... Xwedî derketina li orijînalîteya komên xelkê ye... Gelê Kurd her-çi qasî li hemberî hêzeke zordar be jî, cih cihan di nava lîberalîzma di wateya -futuhata entellektuelî- de, hêza edebiyata Tirk şikandiyê. Di demên dawî de em dibînin ku bi saya Têkoşîna Rizgarîxwaz a Gelê Kurd, (çi eskerî, çi sivil) eniya rewşenbîrên Tirk ji bo aşiyê zend û bendên xwe çikandine. Daxuyaniyên aşiyê yên rewşenbîrên Tirk û Kurd mînakê vê çendê ne. Fam kirin, ku gel bi inteljansiya xwe gel e. Gelê Tirk heya îro jî di nava bedcaniya "akincitîya talangerî" de dixeniqe, difetise, di nava hêrsa gevzînokî a neçarî de şilûşatî bûye. Medya Tirk berdevkiya otorîteya eskerî dike, mîna serokê Cemiyeta Rojnamevanên Tirk, Orhan Erînc dibêje, medya Tirk ewlekariya xwe wînda kiriye. Rewşenbîriya Tirk jî heya doh piştigiri dida heman otorîtê.

Bi gotineke Tirkî "ontayfayên medya" Tirk, di nava pêşbazîya maç kirina potînan de ne. Tişteki din ê balkêş: Dijmin bo ku Têkoşîna Gelê Kurd têk bibe dogmatîzma mizgeftê bi kar tîne, serî li demagojiyên olî, siyasî û civakî dide. Lîstikên fatalîsta bazirganî dide pêş û metodên zordestiyê zêde dike. Gera li rastiye, gihiştina

nirxên mirovaniyê, avakirina hestên bawerî û dostaniyê, berz kirin û bihêzkirina mafê mirovan armanca wan nîn e. Yek armanca wan heye, têkbirina Têkoşîna Rizgarîxwaz a Gelê Kurd. Kuştina rêxistinîya gelê Kurd û murdariya netewiyeta gelê Kurd e. Bêguman piştê dorê tê nirxên gelê Kurd, çand e, edebiyat e, tore ne, kêlên goristanan ku bi giştî têk bibin. Ji aliyê din ve dijmin dixwaze ku 'mazi' -kevnepîsiya Kurdan felc bike. Di têkbirin û kuştina beşê nivîskî de, dijmin serketî bûye. Gelê Kurd 'mazi' -kevnepîsiya xwe di gotina devkî de parastiyê. Lewra wêjeya devkî ya gelê Kurd bê hember, bi hêz e. Bi vê pêwanê, em car din dubare bikin; barê giran li ser milên nivîskarên Kurd e. Eger nivîskar di nava gera 'mazi' -kevnepîsiya xwe de "cewherê dirî" ne bîne, ji serketinê dûr e. Goethe, li nava kavilan li kevnepîsiya klasîzmê digeriya, dixwest li rastî nîşaniyê berhemî rast were. Pêwîste em jî, di nava kavil, şikê û xirbîhên herka dîroka wêran de li rastiya xwe bigerin. Îdeolojiya Enstituya Frensa (1795) ku ji aliyê Tracy û Cabonîs ve hate damezrandin têkiliya navbera hiş û ramanê mirov û cîhana derve derxiste holê dikare bibe mînak. Ji ber ku serketin bi saya gotinê bidestxistin. Sensûalîzma Frensî, bi gotinên efsûnbazî derkete holê. Afirgerê sensûalîzma Frensî Condillak bi wesîfdaneke kûbarî hêza gotina xwe tîne ziman. Dibêje 'ez şagirdê gotinê me'.

Kî ji nivîskarên Kurd dikare xwe bi şagirtiya gotinê bide nas kirin û dikare bibe bersiva pêvajoya îroyîn? Kêmasî di vir de ye.

Şerê min û Mehmed Uzun, ku di rewşeke gotin û axaftina di nava komcivînan de pêk hat, du caran li ser vê mijarê bû. Lê Mehmed Uzun her du caran jî, vekirî digot: Tu îdda min a nivîsandina şoreşê tune ye û min negotiyê.

Berî Têkoşîna Rizgarîxwaz a gelê Kurd, inteljansiya Kurd tunebû. Ne xwedî nasnameyê payedar û watedar bû. Belê kes hebûn... Kes jî di nava mij û morana tofanî a afûr û kafûra dewleta Tirk de fetîsîbûn. Derfetên dengkirinê nedidîtin, nivîsandin jî dihate wateya şenqkirin û mirina reş ya di nava çar dîwaran de. Piştî Tevera Azadîxwaz a Gelê Kurd, nefesa gelê Kurd û rewşenbîriya Kurd derket. Li exlaqê rojane ku pîroz tê dîtin xwedî derketin çêbû. Sazî û dezgeh hatin ava kirin. Kolektîwîzmê dest pê kir. Nivîsan-

dina bi zimanê Kurdî kete jiyane, hindik be jî bazareke zimanê Kurdî çêbû. Bêexlaqîya siyasî ya li ser jiyana rojane hate kuştin. Û her kesî dît û tîgihişt ku dîrok şer e. Şer jî, ne tenê bi alavên eskerî tê kirin û serketinê tê bidestxistin. Xwedî derketina li destîniya komên xelkê, bi gelek cure û rengan çêdibe. Yek ji van rengan û herî giring eniya wêjeyî ye.

Belaş ne hatiye gotin ku "eger şoreş di pirtûkan de cih bigire serdikeve". Bêguman ev jî bi fam kirin û tîgihiştina tacîdarî û hikumraniya dewletî derdikeve holê. Gelê Kurd, bi inteljansiya xwe ve, bi sazî û dezgehên xwe ve fam kir ku serketin bi baweriya "hikmet-î hikumetê" tê bidestxistin.

Mehmed Uzun, yek ji wan nivîskaran e ku wate û watedariya "hikmet-î hikumetê" fam kiribû û xwest bi destîniya xwe re destîniya gelê xwe û ya cîhanê biguhere. Ev giring e... Gelek caran di nava lîstikên dijmin de şelişt, hejiya, lê ji riya gotina tacîdarî dûrket. Berxwedaneke hampa da û riya berhemdariya dewlemend bijart. Ew jî mîna gelek kesên din di nava bê-alîti û bê-terefî de aliyekî xwe felc kiribû. Di tîkoşîn û berxwedanên hebûn û nebûna gelan de, rewşenbîr û nivîskar xwedî misyonê giranbiha ne û pêwîste li dora rêvebiriya tevgerê bin, rê û şivîlan nîşan bidin, xeletî, şaşî û nekariyan bibînin, hêza gotinê nîşan bidin. Cih girtina li dora rêvebiriya şoreşan ne alîgirî û ne teslîmbûn e.

Mînakên vê yekê di dîroka cîhanê de gelek hene. Sê cureyên rewşenbîrî hene, pêwîste yên me jî ji van her sê cureyan yekî bibijêrin.

Yek: Riya Brahîm e, riya Galîlee ye, riya Hallaci Mansur e... Yanê çûna ser koma êzingan e. Du: Riya Rebalais e ku dibêje, ez evîndarê rastiye me, lê heya ber sêdarê...

Sê: Riya Guîzot, ku entellektuelê herî mezin ê dema xwe ye. Mixabin ev entellektuelê mezin pirs-girêkên di nava wan de dijî nabîne.

Gelo entellektuelên Kurd, wê di nava "behreyî demê" de dikaribin di kîjan rêzê de cih bigirin û hêzê di xwe de bibînin û bêjin: Şûr li gorî mantiqê siyasî jî kalan derdikeve.

Ji bo mirovekî tî av giring e, ji bo mirovekî birçî, berî masê, perdeya li ser masê û kevçî xwarin giring e... Ji bo gelê Kurd jî azadî giring e, tî û birçiyê azadiyê ye. Bo azadiyê kewijiyê... Guhertinê dixwaze, têkbirina statukoparêziya herêmê dixwaze. Ji bo vê yekê jî şer dike. Wêje jî guhertin e. Ne tenê dibêje, bi gotinê re hêza guhertinê bi kar tîne û dest diavêje rêkûpêkiya bedewî û delaliyê. Yanî aliyê nirxê giranbiha "estetîk"ê dike rojevê... Balzac dibêje: Romana tiştên tene guhertinê nivîsandin. Roman navê guhertinê ye. Mehmed Uzun li xerîbiyê dest avête wêjeyê... Xwest bi eniya wêje dest biavêje destîniya xwe û gelê xwe. Serketî bû...

Aliyê rexnekirina Mehmed Uzun, yan jî kêmasiya romanên wî, cihnegirtina erdnîgariya Kurdistanê ye. Ziman Kurdî ye, nav Kurdî ne, bi nav kirina erdnîgariya Kurdistanê tune ye. Bajar jî hene, eger di romanekê de erdnîgarî bi tîrêhî neyê dayin û bi nav kirin, bo çit û sêncê dora dîrokê bes nîn e.

Min di axaftina Konferansa Navneteweyî a li ser Zimanê Kurdî ku ji aliyê Enstîtiya Kurdî a Brukselê û Pena Kurd ve li Parlamena Yekîtiya Ewropa hate lidarxistin de jî, heman dîtinên xwe anîn ziman. Bi kurtî min wiha got: Kurd di nava mirin û jiyane de berxwedanê didin. Bo Kurdan normên hiquqî û mafê mirovan li ber çavan nayên girtin. Berjewendiyan, ademiyet avêtiye ser tingê zibil. Lê mîna xelatgirê Nobelê Ghunter Grass dibêje, em destûrê nadin da dîroka mirovaniyê û nirxên mirovaniyê biavêjin nava qirşûqalan.

Lewra bargiraniya herî mezin dikeve ser milê nivîskarên Kurd. Nivîsandina bi zimanê Kurdî bes nîn e. Ji bo avakirina keleha wêjeya Kurdî û parastina nirxên civaka Kurd ziman tenê bes nîn e. Bo bingeha keliha çanda Kurdî, ji bilî ziman, pêdivî bi folklorê Kurdî, ferhenga Kurdî, stran, destan, efsane, helbesta klasîk, çîrok û çivanok, fabl û metelokên Kurdî, avanî, hendesyariya cotbarî, cil û berg, ziyet, tore, mîng, deşt, çiya, gelî, beroj, asûman û şevên bi stêrik û bêstêrik, taveheyva êvarên Kurdistanê, pêdivî bi klîmat û demjiyanên salane û ya herî giring erdnîgariya Kurdistanê heye. Li Kurdistanê dîwarên hewşan tene sêncirin, dora hefşiyên bi hej û daran tê asêkirin, li hundirê malan kûwarên çêkirin, di anîşkên hewşan de tenûr tene dadan. Şevîniyên

Havînî li Kurdistanê navdar in. Olvedana dengê bilûra şivanên Kurdistanê eger bi deşt, gelî, mesil û çiyarêzan neyê binavkirin dilrewanî, dilovanî û mehrebaniyê nade mirovan.

Eger ev teva di honandina erdnîgariya Kurdistanê de neyên dayin, nivîskariya me seqet dimîne. Taybetmendiya gelê Kurd û erdnîgariya Kurdistanê bi hev ve girêdayî ye. Lê mixabin Hevalê Mehmed Uzun di nivîskariya xwe de, ev binbarî neaniye cih. Nasnameya Mehmed Uzun bi stîla ku bi kar tîne nayê naskirin. Lê ev bêstîlî jî dikare bibe stîlek û wiha bête bi nav kirin. Stîla Mehmed Uzun a bêstîlî... Xweş e û mirov nikare li dij derbikeve. Lê çima lingên xwe li hewa dihêle? Pêwiste erdnîgariya Kurdistanê bi nav bike, wekî parezgeha xwe û gelê xwe û wekî hêlîna zarokên paşerojan bidê pêş. Romantîzma di nava honandina xewayê Kurdistanê de, liqasî hestên mirovan bi hêz e û dikare di pirtûkên me de cih bigire. Mînak, dema gerileyekî Kurd ji ber operasyonên artêşa Tirk direve, parastina xwe, hêvî û hawara xwe liqasî Xwedê digihîne erdnîgariya welatê xwe. Aaaa, li vir pêwist e nivîskar van hestan di nava talanên deviyên, di nava çitîk qerseleyên ber kanî û çeman de, di şikeft û şeqafên berzehên çiyayên erdnîgariya welatê de xwe vedîşere, li her cih û warî, li her herêmê bi nav in, pêwiste bêne binavkirin.

Erdnîgarî dîrokê temam dike û bi nasname dike.

Wêje hinekî pîrozî û nirxdayîn e. Hêza vê pîrozî û nirxandinê jî gotine û Hevalê Mehmed Uzun, di nava me de herî baş gotina Kurdî bi kar tîne. Lê çima ev kêmasî?

Roja din, Mazhar Rojava ji min re got, pêwist e em erê bikin ku bêstîlî jî stîleke. Mehmed Uzun ev rê bijartiyê. Mirov nikare bi tundî li dij derbikeve. Lê mijarên din mirov dikare hûr û dûr li ser raweste. Ji bo lêkolîna romana Kurdî jî mijareke enteresan e.


Bêguman nivîskar ne mecbur in "upanîşad" an ji tacîdaran re binivîsin. Lê pêwist e wan gotinên ku mirov dike nava oportunizma şilûşatiyê û ber bi palêsiyê dibe jî bi kar neyîne. Ji bo hiş û ramanê me Kurdan birc û stûnên Herkul tune ne. Îdeolojî pêşî ji pêxemberê wê îdeolojîyê tê fêrbûn, ne ji di-

jmin. Erê qîrêna hiş û ramanê azad, qîrêna wekhevîya mirovan e, navê wekhevîyê ye. Rastiyeke din jî ewe ku trajediya gelê Kurd, berî bête cîhanê ne hatiye nivîsandin. Gelê Kurd berxwedanek da dest pê kirin, hîna didomîne, li hember wê tarejediya bi destan hatiye nivîsandin qonaxên giring bidestxistine. Em teva hinekî zarokên wê berxwedanê ne, nixrên civaka me jî wiha. Gelo kî wê hêz û berz kirina nijada gelê Kurd û hêz û berziya nixrên civaka Kurd bigihîne nifşên paşerojan? Ne nivîskar?

Komên xelkê tiştan qenc an xerab ji bîr nakin. Nexasim gelê Kurd, nixrên xwe dizane û dinase, "qedirşinas e". Kekê Mehmed Uzun, piştî çû Amedê, ji aliyê gelê Kurd ve bi "qedirşinasî" hate hambêz kirin. Îcar, em dikarin bêjin ku stîla Mehmed Uzun giha qonaxa ji bêstîliya erdnîgarî xelas bibe, di nava rêkûpêkiya sênc û diwarê dîrokî de, olan bide, bi nasnameya Kurdistanî ciwar bibe. Mîna Destanê Egîdekî biqîre, nixrên civaka Kurd bibalivîne.

Piştî ew qas gotin, ez dikarim vê niyazê bikim: Xwezî bî wê roja ku di nava nivîskarên Kurd de "maşerî şuur" hate avakirin.

Xala duyemîn a piştî ew qas gotin ez dikarim bêjim: Mehmed Uzun li derveyî welat nasnameya wêjeya Kurdî ye.



RONÎ MÎNA EVÎNÊ TARÎ MÎNA MI- RINÊ

Fawaz Husên

Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê romana du lehengan e, du lehengên di bahoza sedsala bîstan de. Mehmed Uzun navê welatan û miletan di berhema xwe de diyar nake, lê xwendevan bi hêsanî tê digihêje ku welat Tirkiye ye û doz doza gelê kurd e. Ew zordariya desthilatiyê di kesê Baz de bigewde dike û hemû belengaziya Kurdan û stûxwariya wan di Kevokê de, di vê keça bêhempa xweşik û nazik de, dicivîne.

Di pelên pêşîn ên vê dastanê de, xwendevan dibîne ku **Baz û Kevok** bûne du firendeyên girtî, rewşa wan her duyan eynî rewş e, mirin li pêşiya wan her duyan e. Heft leşkerên bi cil û bergên bajarî wan di şeva **Welatê Mezin** de ber bi mirineke misoger ve dajon. Lê di navbera kuştina Kevokê û ya Baz de, Mehmed Uzun hemû trajedî û hemû hêviya du miletan de li ber çavên xwendevanên we radixîne.

Kî ye Baz? Kî ye Kevok? Nivîskar dibêje çawa Baz bûye Baz û wiha jî dijminê Kevokê. Piştî ku leşker hemû endamên malbateke çiyayî berbat dikin, li gor edetên xwe yê kevin, ew sêwiyekî bêzar bi xwe ve digirin. Ew wî di destgehên çekdarî û leşkerî de perwerde dikin, ew wî hînî parastin û serfiraziya artêşê dikin. Lawikê belengaz mezin dibe û dibe xwînîxwarê miletê xwe yê rastîn. Di serê wî de, her kesê ku serê xwe diji desthilatiyê bilind dike gerek li ser rûyê erdê nemîne. Piştî her êrîşê, Baz ji nav ciyan vedigere serbazgeha xwe, nava malbata xwe ya sexte. Di şevên serbajarê Welatê Mezin de, Baz jineke, hem dê, hem qehbe dibîne û

di hambêza wê de tenhatiya xwe û bêhna xwîna ri-jandî ji bîr bike.

Kevok kî ye? ew ji dayika xwe çê dibe gava mala-bata wê bi fermana Welatê Mezin ji axa kal û bavên xwe bar dike û berê xwe dide qûmistana nebedîbûnê. Bazê ku wê gavê di bîstaliya xwe de bû bi çavên serê xwe dibîne çawa ev zarok tê ser rûyê erdê û qurteke av jî dide diya wê. Gava ew cara duduyan vê zarokê dibîne, Kevok bûye keçeke bîst salî. Ew şoreşvan e û serê xwe li hemberî zordariya Welatê Mezin bilind dike. Ew ji bo gelê xwe doza jiyanek bi rûmet dike. Baz, dijminê dijminan pencên xwe li wê dide hev. Kevok dibe girtiya Baz. Lê di vê navberê de, Baz pêrgî esl û nijadê xwe tê, ew bi kuştina malbata xwe ya rastîn agahdar dibe. Ew dibîne ku Bazê çiyayî bi destên xwe çavên çiyayîyan derdixîne. Gava ew bi ser hişê xwe tê û rastiye dibîne, êdî dereng e, ew li ser rêya mirinê ye. Baz di nav navperûşkên bazên ji xwe mezintir de dibe kevok û qurban.

Ronî mîna evînê, tarî mîna mirina dastanek e, dastana kesên ku bi darê zorê bûne dijminên hev. Mehmed Uzun dibîne ku Welatê Mezin bûye welatê kuştî û qîrînan. Mixabin, dengê ku ji her aliyên Welatê Mezin tê, tenê dengê kuştinê ye. Ew dengên baz û kevokên li ser rêya mirinê ne.

Mehmed Uzun dizane ku bajarvaniya bi darê zorê hovîtî ye, ne bajarvanî ye. Dem, çi teng bin çi fireh, ew destê xwe ji hêviyê naşo. Mala te ava, birayê Memo, ji bo van berhemên bêhempa û vê hêviya ku te li me par kir. Bijî, birayê hêja. Ma gelo roj û şevên Parîs û Stockholmê dê te ji bîr bikin?

* Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê, Stenbol, Avesta, 1998, Rûp: 350.

RONESANSA LI WELATÊ ME

Ayhan Meretowar

Çawan ku ji aliyê hemû kesên edebiyatêz û dîrokzan ve tê zanîn, li welatên ku di bin serdestiya Împaratoriya Osmanî (Tirk- Îslam) de bûn, -mîna gelê Tirk, Kurd û Erebi- ronakbîriya azadîxwaz, di sedsala hijdehan de, li welatên Ewrûpî serî da û xwe girt.

Di serî de edîbên gelê Tirk ên mîna Namik Kemal, Îbrahîm Şînasî, Abdulhamîd Ziya Paşa, Rezaîzade Ekrem û Abdulhak Hamîd Tarhan, li hember istîbdada giran a sultanên Osmanî, bi şûrên xwe yê qelew ên qelemî derketine meydana têkoşînê.

Hewldanên Edîban ên Ewrûpîbûnê

Ev edîb û têkoşerên qelemşûr, di nav gelên ku tabiyên dewleta sultanî ya osmanî bûn de, bi lez û bez bûn xwedî qedr û qîmet. Berhemên van azadîxwazên ciwan, bi awayekî têra xwe bes gihîşt girseyên gel ên osmanî. Gava ji aliyê sultanên mîna Ebdulmezîd û Ebdulhemîd ve, kar û barên edebî û siyasî yê van "Jon Tirkan" hat astengkirin, ew qet ranewestiyên wan tavilê berê xwe dan diwelên Ewrûpî, -bi taybetî welatê Fransayê- û bi ked û hedeke bêserûber, zorê dan ronîkirina gelê xwe.

Piştî salên 1860an, di rewşa siyasî û civakî ya Împaratoriya Osmanî de, geşedanên gelek girîng qewimîn. Di van geşedanên de bandora van edîban an jî tesîra welatên Ewrûpî zêde bû, hêjayî meraqê ye. Heke em bala xwe bidin lêkolerên ser vê hêlê, serê ewil ev nîrxandin derdikevin pêşîya me:

"Mustefa Reşîd Paşa, sala 1858an dimre. Heta sala

1871an, Alî Paşa, îdareya dewletê, zafê caran di destê xwe de digre. Rewîştî vî paşayî, pir bi ihtiyat û tedbîr e. Ew, tempoya rojavayîbûnê, giran dike. Ji bo ku ev tevger bibe daimî û misêwa bi rê ve biçe, bi awayekî samîmî rojavayîbûnê dihezimîne (digibirîne) û dike ku mecliseke idealist û ronakbîr bigihîje."

Di van salan de, piştî mirina Sultan Ebdulmecîd ku sultan Ebdulmezîd tê ser textê dewletê, ew maf û azadiyên ferdan ku bi "Xetta Gulxaneyê" hatibû belgekirin, ji siyasîtiyê bêhtir huqûqî bû.

Ewrûpîbûna Osmaniyan û Çapemenî

Taybetiyeke pir girîng a dewra Ebdulmezîd ew bû ku cara pêşî hêzeke zaf mezin ket xizmeta welatiyan: "Hêza çapemeniyê".

Çapemeniya xusûsî, di vê sedemê de bi lez û bezî xurt bû. Agah Efendi, sala 1860î, rojnameya pêşîya Tirk ku bi navê "Tercumanê Ehwal" bû derdixe.

Du salan di pey vê rojnameyê de, -sala 1862a- Şînasî, rojnameya bi navê "Teswîrê Efkar" derdixe. Namik Kemal berdewamiya vê rojnameyê tîne. Piştî çar salan, -sala 1866- îca rojnameya bi navê "Muxbîr" ji hêla Alî Suavî ve tê derxistin. Peyre jî hejmara rojnameyê serbixwe zêde dibe û ew ciwanên ku ketine ber bayê şaristaniya rojavayîyan, bi tundî lawaziya hukûmetê ya di hemdemîbûnê de rexne dikin. Wisan dikin ku li welêt, girseyeke mezin ji raya giştî dibe muxalîfê istîbdada sultanî.

Penaberîya Edîbên Osmanî Li Ewrûpayê

Pir tê re derbas nabe, ev nîfşê ku li gor şaristaniya rojavayî, têkoşîna doza maf û azadiyan dike, "Cemiyata Osmaniyan Nû" ava dike. Hukûmet zorê dide wan û ew jî mecbûr dibin, direvin Ewrûpayê. Ew vê doza xwe li Ewrûpayê jî berdewam dikin. Alî Suavî, li bajarê Londrayê, sala 1867an rojnameya "Muxbîr" derdixe; Namik Kemal û Ziya Paşa jî, salekê peyre -sala 1868an- bi navê "Hurriyet"ê rojnameyêke din derdixin.

Edebiyata Tirkî û Edebiyata Frensî

Vê serdemê, ji hemû cûre çêsnên edebî yê edebiyata frensî, li zimanê Tirkî hatin wergerandin û li gor rêbaza edebiyata Frensî, di edebiyata Tirkî

de, berhem hatin dayin. Pirê berhemên edebî, di vê serdemê de hatin ceribandin.

Têgîna Millet û Perçebûna Welêt

Hîna ji wê hingê ve têgîna "gel/millet" di ferhengê de hat ravekirin. Milletê Osmanî, Osmanîtî, (Osmanîparêzî) ku hemû gelên bin destê Împaratoriya Osmanî, bêyî ku ferq û mîla dîn û mezheban were kirin, weke milletekî hesibandin. Hemû rewşenbîr û mirovên dewletê, digotin ku bila dewlet parçe nebe. Divê ku yekîtiyeke me'newî hebe di nav hemû teb'ayên dewletê de. Di wê dewrê de tu kes li hember vê fikrê jî hema hema derneketiye hetta ku Herba Balkanan (1913) derket.

Xetayên Edîban

Ji ber ku edîbên osmanî, di serdema Tenzîmatê de, bi hemû awayî ketin ser şopa edebiyata frensî, ji wan nehat û nekarîn ku xwe ji neteweparêzîtiya asoteng biparêzin. Ew "Îhtîlala Frensîyan", bû sedem ku li nav dewleta osmanî, gelek gel, doza azadiya xwe ya neteweyî bikin. Ew tovên avakirina dewleta millî ku di salên Herba Yekem a Cîhanê de, di bin banê "Tirkparêzîtiyê" de şax da, berhema vê serdema edîbên Tenzîmatê ye.

Edebiyata Kurdî û Biratiya Gelan

Edîbên kurd, bi deh salan ji aliyê sîstemê ve bê deng hat hiştin.

Berhema M. Uzun a bi navê "Siya Evînê" ku bûye manaşa derbirina nêrîn û dîtînen wî, bi awayekî pir balkêş, serê mirovan ji nav mij û morana neteweparêziya ku neteweyên din li ber çavên mirov reş dike, rast dike û dike bêhn li mirovan fireh bibe.

Van rojên ku maweya/pêvajoya şerê Kurd û Tirkan, weke "kozek"ê ye di destê hin xêrnexwaz û şerxwazên malûm de û kirine ku birîneke kûr û xedar, di hişmendîya biratîparêzan de vebe, hemû berhemên M. Uzun, dikarin bibin dermanên bilezûbez ên başkirinê.

"Ronî Mîna Evînê Tarî Mîna Mirinê" berhemeke wisan e ku mafê ked û heda têkoşerên azadiyê pê kariye daye. Bi vê jî ranewestiyayê; îca wan lehmgên bûyerê ku kesayetiye gelek xerîv û sosret ên wan sîstemên neheq in, pir bi pisporî kariye bihûne.

Nivîskarê Biratiya Gelan


Nivîskar, bi berhema xwe ya "Hawara Dicleyê", gihîştîye wê merheleya ku êdî bûye xwedî kesayetiyeke navneteweyî. Tu xwendevanê welatê me ku vê berhemê bixwîne û weke welatîyekî kurd, ji welatîyên gelê ermen hez neke, bi raya min dê tunebe. Êdî qelesa nivîskêr, daye dî wê hiş û ramana ku "hemû gelên ser rûyê erdê, di eslê xwe de birayên şîrîn ên hev û din in" û pêşî li gerdûnîbûna nivîskarê me vedike.

Digel ku bi hemû hêz û şiyana xwe, mil da ber barê azadiya gelê xwe, berê xwe ji gelê Tirk, çanda Tirk, zimanê Tirk û edebiyata Tirk baneda. Tevî ku di nîvê dilê xwe de cî da Tirkî, wisan jî çerî tarîtiyê nekir û ji wî aliyê dunyayê, ji welatê kana dostan Siwêdê rabû, hat vê derê, çira vexist.

Digel hemû gazin û lomeyên ku jê tînin kirin, vî camêrî, hemêza xwe ya ku ji çanda cîhanê, edebiyata cîhanê û aramiya cîhanê re vekiribû, ciyê herî xweş û mezin da Kurdî û jê hat ku edebiyata Kurdîyê bibe bigihîjîne edebiyata cîhanê.

Min bawer e ku gelan, ji hêla xwe ve, zê ve perûyekî ji "Perûyê Nobelê" mezintir daye vî nivîskarê me yê biratiya gelan.

1- AKYÜZ Kenan Modern Türk Edebiyatının Ana Çizgileri (Xetên Sereke yê Edebiyata Modern a Tirk), İstanbul, İnkılap Kitabevi, 1982



BÎRA QE- DERÊ Û FO- TOGRAFÊ HERÎ DAWÎN: “ZOZAN HADÊ EM BIÇIN ZOZANÊN JIYANÊ”

Mem Mîrxan

Di jiyana mirov de hindêk tişt hene ku tu car ji bîr nabin. Wek filmê herî xweş, strana herî bi bandor, bajarê herî bedew, evîn bi gotina Mehmed evîna abadîn. Bîra Qederê jî ji bo min yek ji wan destpêkan e. Cara pêşîn li ser riya sirgûnê min dest bi xwendina wê kir. Sal 1999 ez sirgûnî bajarê Bilecîk'ê bûbûm. Dibe ku ji ber bandora sirgûniyê be jî ez gelek rojan di bin bandora wê de mam.

Roman romana me hemûyan e. Hemû sirgûn, ên dîrketî û ên nefibûyîyan e. Roman romana rabirdû û dîroka me ye. Dîroka me ya têkçûyî, dîroka zimanê bêxwedî, dîroka me bêxwedîyan, an jî parçebûn, belavbûn û jihevketinê ye. Dîrok


dîroka Bedirxaniyan e. Bedirxanî: Prens û mîrên kurdan ên herî dawîn, Bedrî Paşayê Bedirxanî, Emin Eli Beg, Rûşen Xanim, Semiha Xanim, Celadet, Hikmet, Meziyet, Safter, Kamo, Hikmet Rewşen, Canan, Monika û Amoja Sitê ye, dîrok dîroka mirinê ye. Mirina Mîrê Kurdan Celadet Bedirxan e. Dîrok dîroka jiyane ye, jiyana alfabeyê nû, rojname, kovar û romanên nû ye. Dîrok dîroka bîrekê ye. Bîreke tev li qedera Kurdan bûye. Dîrok dîroka nivisandina romanekê ye.



Bîra Qederê.
Nav : Bîra Qederê
Çeşn : Roman

Roman ji 16 fotografan pêk tê. Lê em ê di wê nivîsê de fotografekî li romanê zêde bikin. Û navê wê dayinin “Fotografê Herî dawiyê: Ne ji bo mirinê ji bo jiyane”.

Roman ji dawiyê dest pê dike. Ji mirina Celadet. “Mirin hat, Celadet Beg û bedena wî bir û li pey xwe jî ev hîsa kambax xist nav malê... Malê reş girê daye. Ji roja mirinê û vir ve ye, mal, Rûşen Xanim, Zarok, nas û xizm, meriv û dost li şîne



wê ji bo Romana Bîra Qederê pir girîng e. Ji ber ku tovê romanê li vê qonaxê tene avêtin. Di wêneyê yekemîn de Bedrî paşa dixuye.

Di wêneyê 1. de Celadet tune ye lê hebûna Celadet heye. Celadet an bigota bêvê wî Ceco di vî wêneyê de xwedê dide. Ceco weke mirina wî xwedêdana wî jî ecêb û tore ye. Dema xwedê dide ji ber meziniya gewdeyê wî, wî bi emeliyat û mirî derdixin.

rûniştine.” Û bi fografan berdewam dike.

Rastî jî her tişt di fotografan de hatiye veşartin. Wext, dem, dewran, jiyane, serpêhatî, bûyer, pêwendî, evîn, şer, têkoşîn, êş, keser, hesret, hîs, pêjn... Wek tê dîtî di van du paragrafan de mirov hem lehengên romanê hem jî mijara romanê bi awayekî beloq hîn dibe. Belê di vê romanê de her tişt beloq e. Bêyî Mîr Bedirxan wêneyê hemû malbata Bedirxaniyan hene. Mirov bi hêsanî hemû serpêhatiyên wan di fotografan de dikare bibîne.

Fotograf 1: Ev wêne di sala 1893an de li Kadiköyê hatiye kişandin. Demsal bihar e. Di nav daristanê de qesrek dixuye. Çar qonaxên din jî di wêneyê de dixuyên lê jê yek pir girîng e. Qonaxa ku pencera wê xuya dike, ev qonax, hebûna wê, reng û avahiyên wê, ode û meclîsên wê, bîr û baxçeyên




Lê ew çi ye! Dengê tê. Dengê zarokê tê, dengê zarokê mirî tê xulama malê. Ew deng dengê Celadet ê pozberan e. Xwedê star bike.

Fotograf 2: Ev wêne di sala 1895an de dema payîzê li Fotografxaneya R. Xendamian hatiye kişandin. Di fotografa duyemîn a romana Bîra Qederê de du kes hene. Jinek û Mêrek. Emîn Alî Bedirxan û jina wî Semiha Xanim. Yanê bav û diya Celadet.”

Di fotografa Emin Beg û Samiha Xanimê de tiştê ku herî bala mirovan dikişîne, çavên wan in; du cot çavên reş mezin, germ ku dikenin. Mirov li ser rûyê wan ken nabîne... Lê çavên germ dikenin. Kenekî kubar, ne boq, lê bi pîvan... Mirov dikare ji kenê wan tê derxe ku... Ew ji jiyane hez dikin, lê bîr bi zehmetiyê wê jî dibin.” Di vî wêneyê de Amoja Sitê jî heye ku Mîr Bedirxan bi çavê xwe dîtîye. Dûr û dirêj behsa Mîr Bedirxan dike. Her çi qas em dizanin ku heta niha wêneyekî Mîr Bedirxan tunebe jî, bi saya Amoja Sitê em tê digihîjin ku Mîr Bedirxan çi xweşmêr û egît e.

Amaja Sitê: “Lo zarokno lo, çavreşên min no lo, ma ez çi bêjim, Mîr Bedirxan şêrê Welatê Kurdistanê bû.” Rastî jî ma êdî çi pêwîst e ji bo pesindayîna Mîrê Kurdan.

Fotograf 3: Ev fotograf di sala 1990î de hatiye



kişandin. Fotograf Pira Galata, pira dem û dewran cihê evîn û mirinê dide nîşandan. Fotograf ji aliye Abdullah Fre`res ve hatiye kişandin. Di wêne de; Pira Galatayê dîr û dirêj tê taswîrkirin. Digel tarix û qedera Pira Galatayê aliye wê yê din jî ji bo romana Bîra Qederê pir girîng in. Ji ber ku yekem car germahiya boş a evînê li vir li ser Pira Galatayê bi can û bedana Celadet digire. Belê di vî wêneyî de Celadet bi evînê diheser. An bi gotineke din dibe evîndarê Cananê.

Sirgûniya li sirgûnê jî di vî wêneyî de dest pê dike. Keştiya sirgûnê tê amadekirin. Wan dişînin Bajarê Sipartayê.

Fotograf 4: Wêneyê çaran 1909an, di 10ê mehanisanê de hatiye kişandin. Di dema kişandina vî fotografi de tiştê herî balkêş keçeke pismamê wî Mehmed Salihê ku li Kayseriyê dijî xwedê dide. Rewşen xwedê dide. Belê di berdwama Romana Bîra Qederê de xwedê wê dide Celadet Bedirxan jî. Di vî wêneyî de tenê Celadet heye. Yanê evîndarê evînê, şagirtê Ovîdius Celadetê şazdeh salî heye. Di êvareke ronîya havîna 1912an li Bexçeyê Otele Belvu Canê nas dike. Neviyê Mîr Bedirxan

lawê welatê Kurdistanê di heman demê de dibe evîndarê Cananê.

Ji bo ku ez karibim kitekitên fotografan bêjim hewce ye ku ez jî romaneke wekî Bîra Qederê binivîsim. Ji ber wê gelek di ser re ez ê behsa fotografan û çend hêmayê di romanê de bikim û derbasî "Wêneyê herî Dawîn ; "Zozan Hadê Em Biçin Zozanên Jiyanê"" bibim.

Di Fotografa 5 de Şerê Cihanê yê yekemin dest pê dike. Şiverêyek di wêneyê de heye. Ev rê rêya mirinê ye; Mirina şerê cihanê yê yekemin. Mirina Zo û Lo'yan.

Di fotografa 6 de, **Kürt Teali Cemiyetî** ava dibe. Di Fotograf 7 de şopên salên xem û keserê hene. Salên piştî şer (20an) salên tevlihevî, hilweşîn û ketinê, salên kul û derdan, şik û gumanan û rê û rêwitiyê hene. Monika heye. Sirgûn heye, Elmanya, Munih û muzika **Gustav Mahler** û xeribî heye. Di Fotografa 8. de disa Fraulein Karlfeld... evîna Monika Karlfeld, Mirina Saftera li Elmanya, di Fotografa 9. de vegeza Misir **Xoybûn** û Rûşen Keça Mehmed Salihê Pismam, di Fotografa 10. de **Celadet Ali Bedirxan, Qedrî Cemil Paşa, Ekrem Cemil Paşa, Serhildan**, di Fotografa 11. de derketina Hawarê, di Fotografa 12. de sal 1935 Celadet û dotmama wî Rûşen û zewac heye. Di Fotografa 13. de Cixara **Lucky Strike**, Xwelidank, mirin, fikr, nivîsin, afirîn, xewn, xeyal, bêhtengi, hêrs, tenêti, sebr, daxwaz, hevî û bîranîn, Rêzana Elfabiya Kurdî hene. Di Fotografa 14. de Hawar û sê zarokê din; Sînem, Cemşîd, Ronahî, Ahmedê Fermanê Kîkî hene. Di Fotografa 15. de; Du leşkerên Frensewî û Celadet, Canana dilşikestî, çandîna pembo, di fotografa dawîn de bîr heye. Bîra Qederê, bîra mirinê, bîra mirina Khan, Mîrê herî dawiyê yê Kurdan heye. Mirin heye.

Romanek û şazdeh fotograf, şazdeh wêneyê hevparê dîroka me, dîroka me ya wekî çavên Celadet reş, dîroka gelê ji bîr bûyî, dîroka Lo'yên sirgûnkirî.

Di romana Bîra Qederê de gelek têgeh têrtijî hatine vegotin. Wekî Felsefeya jînê, xeribî, hesreta welat, sirgûn, hişyariya ciwanîyê û mirinê.

Nîvîskar:

Felsefeya jînê wiha hatiye ziman; "Her çi tişt û kes xweş û rind e, ew pîroz e, ev yek jî qaîdeyê min ê jînê ye. Xweşikayî, spehîti û bedewî divê felsefeya jînê be."

Xeribî: "Xeribî jî wiha di rûpelên êşbaz de cih digire; "Ez dîrketî û derketî bûm. Her tişt di nav bédengiyêke kûr de xeribî min bû. Ez, xeribê welatê xerib, bûbûm xeribê her tiştî" Stenbol; "li welatê xeribiyê welatê min, welatê xeribê li welatê xeribiyê, ji Kurdistanê dîr Kurdistanê min."

Veger; "Dawiya dawiyê em ê di rojek pîroz a Xwedê de, tevî wan zanîn, tecrûbe û serpêhatiyên xwe tevî keser û kêfxweşiyê xwe, vegerin mala xwe."

Mirin; "Kî çi dibêje bila bibêje, mirin ecêb e, çûyîn û koça dawiyê ya kambax e. Mirin keser e, bi tenê keser."

Hişyariya Ciwanîyê; "Çare nîn e, Beden hişyar dibe. Wext wexta dîtin, nasîn û kifşkirina bedenê ye. Wext wexta kitekitên rih û can, hîs û pejna ne. Wext wexta cinet û dojecha evînê, agir û germahiya şehwetê, dîni û dilgermiya hezkirinê ye." Sirgûn; "Sirgûn ne cezakirineke mêrkujan e, kavilkirina malan e, şewitandina dilan e."



Wek gotina dawiyê: Romana Bîra Qederê bi hûnandin û naveroka xwe, romaneke dîrokiya herî balkêş e. Roman piranî ji devê kesê yekemîn yanê ji devê nivîskar hatiye nivisandin. Şayesandin û teswîrên gelek balkêş tê de hene. Di romanê de vegotina çirokbêjî û vegotina bîranînê bi hev re hatiye bikaranîn.

Fotografê Herî Dawîn: "Zozan Hadê Em Biçin Zozanên Jiyanê"

1: Demsal payîz e. Payîza sala 2006an e. Şev e. Di wêneyî de, ne zarokatî, hewş û dara hinarê, ne salên dibistanê, ne heps û **Zindana Diyarbekirê**, ne berpirsiyariya rojnameyê, ne sînor, ne serxet, ne binxet, ne Swêd û salên sirgûnê ne, vegeza şermoka Welêt, ne Celadet û **Bîra Qederê**, ne **Memduh Selim Beg** û Siya evînê, ne Kevok û Baz, ne xelat û roman Xuya dike. Na, tenê ew û dotmama wî. Mehmed û Zozan. Zozana bargiran, Zozana hevala rojên sirgûn û xeribiyê. Zozana ciwan. Belê Zozan wekî dotmama Celadet Rûşenê, bi temenê xwe ji Mehmed biçûktir e. Lê li gor edetên kurdan ji bo zewaca pismam û dotmamê tu rê û rêbaz tune ne. Bes pismam bixwaze.

Dotmam û pismam li ber nexweşxaneyê **Zanîngeha Dicleyê** li ber darekê ku çend pel jê xuya ne, li ser bankeke beton rûniştî ne. Bank wekî darê xuya dike, lê ne dar e. Xapandin e, xapandin û xirabkirina xwezayê ye. Li milê çepê Mehmed, li milê rastê Zozan rûniştiye. Mehmed wekî ji ber patozê hatibe westiyayî dixuye. Rûken e, hemû diranên wî yê pêşin, porê sipî yê fîrk, rû û rûçikê çikiyayî, pozê ji ber qels ketinê ji eslê xwe dirêjtir xuya dike wêneyê serî tamam dikin. Li ser



eniya fireh a bi şewla wênekêşê biriqî, derb hene, derbên feleka xayîn. Mehmed destê xwe yê çepê di dora stûyê dotmamê re biriye û li nêzî pêsîra Zozanê ya çepê bi destê wê girtiye. Na, tam bi destê wê negirtiye, wekî tiliyên wan hev ramûsin ghiştine hev. Diyar e ji bo ev fotograf bê kişandin tu amadekariya wî tune ye. Guçê kurtikê spî yê çepê di ber kembera pantorê hêşînboz derbas kiriye, guçê raste bi ser pantor de berdaye. Zozan bi kêf e, wekî zarokêkê. Rû û dêmên wê yê gilover jî di nav şahiyêke boş a bi taswas û bi saw de ne. Di kenê wê de hemû dek û dolabê qedera reş dixweyin. Çavên wê girtî ne. Porê reş û biskên xwe, bi hemû xweşikayiya wan bi ser kurtikê Mehmed de berdane. Zozanê bilûzekî keskê tariyê bi gewrî li xwe kiriye. Bilûz wekî milên Mehmedê rojên abadîne salên xerîbiyê ew seranser rapêçane. Di gewriya wê de gerdeniyek bi çar kevir û çavînokek he ye. Kembera di pantor re kiriye têra xwe fireh e. Mirov hîs dike ku piçekî din xwe xwar bike wê bi ser hêta wê re canê wê xuya bike. Li ber wan maseyêke dirêj heye. Li ser masê çar qedeh, qedeha çayê ya li ber Mehmed hîn tijî ye. An gumek an du gum jê vexwarine. Li ber qedehê tey-fikek, bi gotina erxenyiyan nalbikîkek heye. Di nalbikiyê de perçeyek zebeş û du zûlikê beqleweyê hene. Hîn kesî dest nedane şîranî û fêkiyan. Li

pişt wan di nav tariya şevê de, çend dar xuya dikin, lê mirov tê dernaxe çî cûre dar in. Ne diyar e, ev wêne berî dema kemoterapiyê an piştî wê hatiye kişandin. An gelo piştî şevbihêrka ku li Deriyê Çiyê di çadira bavê lalo, na na ne çadira bavê lalo konê nivîskarê denbêjan Mehmed UZUN a li hember Nexweşxaneyê Venî Vîdiyê ye. Şevbihêrka dengbêjan, şevbihêrka, nivîskarê jîbîrbûyîyan, şevbihêrka êşan, şevbihêrka Ehmedê Fermanî Kîkî, Evdalê Zeynikê ye.


2: Dîsa şevêk ji wan şevan e. Hemû dost û nas li di bin konê denbêjan rûniştine û dengbêjekî destê xwe daye ber guhê û dest bi strana Evdalê Zeynê û Kulinga bîrîndar kiriye. "Evdal dibê..... belê Evdal digot, dengbêjan jî digot û dor nedidan hev. Dengbêjê ku em ê behsa wî bikin bi sê dangan bang kir : "Mîrê min, mîrê min, mîrê miin lo şêxo şêxê min. Bila bişewite mala romê çawan Şêx Seîd Efendî dane ber sêpiyê, lo mîro mîrê min..."

Şêx Seîd Efendî bi vê stranê re ji konê dengbêjan bi qasî sed gavî wê de li Mihemd UZUNê ku di şaneşîna nexweşxaneyê de ye, destê xwe li ba dike û daxwazên saxî û silametiye ji Mehmed re dişîne. Ew çî ye? Mehmed jî wî dibîne.

Wî û amadekariyên daleqandina 47 rêberên kurdan ...

28ê meha Pûşpera 1925an. Hîn tîrêjên rojê nedane Bedena Diyarbekirê. Berî ku dozger biryara xwe diyar bike dengê çakûç, birek û tevşoyan tê. Hemû sêpi wekî hev tene çêkirin. Ji bo ku girê girên hikumatê bi aramî û dilşadî nasasîna kuştinê temaşe bikin jê re tribun tene avakirin. Amedekari wekî amadekariyên şahiyêkê berde-wam dikin. Piştî dengê zîncîrên lingê mahkûman tê. Şêx ne li pêşiya qefle ne jî li dawiyê ye. Wekî esmên bi hêşiniyêke bêgilej bê sewaxkirin, bi heft rengên rojê, ronahî bi ser sêpiyan re dide rihê Şêx Saidê daleqandî.

Êdî tav bi qasî misasê bilind e û ronahiyêke bê-dawî dest pê dike. Dengê, dengêkî rûsipî bi kurtepişt ji Mehmed re dibêje: "Xwedê şîfa xêrê bide te, lê me jî, jî bîr meke." Dengê dengbêj, dengê rûsipî ditepisîne û berde-wam dike. "Nayê jîbîrkirin, ev derba giran nayê jîbîrkirin..." Mehmed li cihê Şêx Seîd û hevalên wî hatiye daleqandin cara dawîn ji nexweşxaneyê dinihêre û dibêje: "Zozana dotmam de haydê em biçin zozanê jîyanê."



MIHEMED UZUN: NIVÎSKAREK KURD LI BER DERGEHÊN CÎHANÊ


Dilower Mêqerî /

Wergera Ji Erebî: Sirwan Hecih Berko

1

Di beyaniya rojê havînî ya salên heştêyî yên borî de, min deriyê mala bavê xwe vekir û min xortek dirêj û jixwerazi di nav cilîne spehî de dît. Vî xortî xwe ji min re bi hevokerê Kurdî ya zelal pêşkêş kir: "Navê min Mehmed Uzun e, ez ji Swêdê hatime û dixwazim bi bavê te re biaxivim."

Piştê bi ihrac ji min pirsî, bê ma gelo min berî niha bi navê wî bihîstîye yan na. Bi rastî ez kêma li ser berhemên nivîskarên li koçberiyê -ên ji herêmên Kurdî li Tirkîyê û yên di- agahdar bûm; ev yek tevî dastanên ku di wê demê de di nav xwendekarên zanîngehê yên ji nîfşê min de dihatin belavkirin, der barê derfetên mezin ên çandî yên ku di nav destên xelkên me yên li wan deveran hebûn, û bi taybetî li Swêdê. Û ji vî welatê bakurî Mehmed Uzun wekî mêvan û di heman demê de lêkolîner Şam ji xwe re kir armanc; ev bajarê ku ta di nîvê yekê yê sedsala bîstî de navendeke bîngehîn a ronakbîriya Kurdî bû. Bi her hal, derfet bi min re çêbû ku ez camêr nas bikim, dema min nas kir, ku ew nivîsar û helbestên xwe bi navê "M. Ferzend Baran" dinivîsîne. Her wiha min nas kir ku ew sernivîserê beşê çandî yê kovareke Kurdî-Tirkî bû, ku li Stockholmê derdiket. Min di




heman kovarê de çend karikaturên xwe dabûn weşandin. Min ev karikatur berî niha li salonên cuda pêşkêş kiribûn, ku hinek siyasetvan û penaberên kurd ji Tirkîyê, ku wê demê koçberî Şamê bûbûn, amade bûbûn.

2

Heft sal di ser wê hevdîtîne re derbas bûn. Dûra min xwe wekî penaberekî di hembêza Vîkingan de dît, li welatê ku Mehmed Uzun di nivîsareke xwe ya şelafane de di yek ji mezintirîn rojnameyên swêdî de li ser nivîsandibû, ku ew (Swêd) qaşo bûye navenda bîngehîn a çanda Kurdî di nîvê duyem ê sedsala bîstî de.

Ez li bajarê Uppsalayê bi cih bûm, bajarê ku xwişka min a mezin hingî deh sal bûn ku lê dijiya. Uppsala bajarê xwendekarên ji seranserî greva skandinavi ye, ku giyanên mezinên çand û wêjeyê ta niha jî lê digerin, mîna Strindberg, Ekelöf, Larsson û Bergman û yên di, ku xwendekarên zanîngehê û instituyên vî bajarî bûn.

Têkiliyên wê xwişka min bi malbata nivîskarê me




yê kurd re hebûn, ku mîna malbatekê nêzikî mala wê dijiyan. Piştî êdî kurê wan î mezîna Ferman ji min re bû hevalekî nêzik. Di rojêke zivistanê ya sar de, vî dostî ji min re got ku ez "hatime bîra" pismamê wî Mehmed û ku ew dixwaze min bibîne. Bi lez ez çûm, da ku wî nivîskari bibînim, ê

ku wê demê bi xêra hersî romanên wî, ku li dû hev li bajarê rûniştina wî Stockholmê derketibûn, navdar bûbû. Tevî dema wî ya kêma û bûha, me hev li komela Kurdî li navenda Uppsalayê dît. Ez bi pismamê wî re giham komelê û yekser çavên min li ciyê ku Mehmed Uzun lê rûniştibû, ket. Hêdî hêdî ew hema rabû ser xwe û destê xwe yê parûmkirî, giran û sar, dirêj kir, da ku ez silavê lê bikim, an jî belkî maçî bikim.

Sarbûna vê hevdîtina me ya mîna sarbûna wê salê, ji hevdîtîna me yê piştî yê germtir bû bîranînek; bi taybetî ji ber ku nivîskarê me yê mezîna gelek caran serdana bajarê me yê biçûk dikir, ew jî ji ber girêdana wî ya bi xuşka hevalê min Ferman re. Carinan, bûk û zavayê kêfxweş serdana min di odeya min a biçûk a li qiraxên navenda bajêr de dikir. Di odeya min a pepûk de tenê textek û maseyek ji bo nivîsandinê û yeke dî jî ji bo "mêvandariyê" ligel kursiyekî hebûn; ev kursiyê entîke serbilind bû, ji ber nivîskarê me ji bilî wî tiştêkî dî nedît, ku qama xwe ya dirêj li ser bitewîne. Wê demê, ez bi têbîniyên wî yê li ser karikaturên min ên nû kêfxweş dibûm, ev karikaturên ku yek bi dû ya dî de di nav destên wî de diçûn û dihatin: "Tu çima xwe ji bo nîgarêkî avî û zeytî vala nakî, çimkî ew ji bo mirov û afirandinê yê herî temendirêj in?", hevalê min î nivîskar ji min re got, û li ser rûyê wî bêhntengiyekê xwe nîşan da, ku dibe ku sedema wê jî karikaturên min ên li ser bûyerên siyasî yê wê demê bûn. Di hundirê xwe de, ez jî di heman nerîna de bûm, çimkî di nerîna min de jî siyaseta bûbû warekî gemarî. Her wiha ez di wê nerîna tal de bûm, ku hişmendîya tevayî ya ramana karikaturê hema di civateke pêşketî mîna ya swêdî

de jî peyde nedibû; îcar çawan li cem Kurdên me, yê ku gerek ew karikatur bala hişmendîya wan ji bo hebûnê kişandiba. Û ji bo ku camêr nerîna xwe ji min re balkêştir bike, ji min re pêşniyaz kir, ku ez komek ji motîvan ji bo romana wî ya nû amade bikim û got ku ewê di serdana xwe ya bê de ji min re destnivîsa wê bi xwe re bîne.

Navê romana Mehmed Uzun, ku di nav xebatên wî de ya çaran bû, "Rojek ji Rojên Evdalê Zeynikê" bû. Rûpelên destnivîsa pêşî ya vê romanê hîn jî di tariya yek ji dirçên nivîsgeha erşîva min de ne, li kêleka rûpelên dî ku nîgarên min li ser wan in, ku di wê romanê de wekî motîv hatibûn bicihkirin. Hîn jî kêfxweşîya nivîskarê me ji ber wan motîvan di bîra min de ye. Her ku li yekê ji wan dinerî, geş dibû û di dema ku dida destên du mêvanên dî de, ku pê re hatibûn cem min, ji min re got: "Ew çêtir dikarin giyanê Kurdî û siruştê wê gewde bikin, çêtir ji wan motîvên ku Abidîn Dîno ji romana Yaşar Kemal a bi navê "Destana Çiyayê Agirî" re çêkiribûn." Uzun ev yek got, ji ber wî berî niha wergera Kurdî ya vê romanê dabû min, ku nîgarên orijînal ên hunermendê tirk Dîno tê de bûn.



Vê pesindanê diviyabû mirovekî kêfxweş bike, bi ser de jî yekî wekî min, di wê demê de. Ji bo min şanaziyek bû ku navê min î belengaz de li bin nîgarên rengînkirî di romana nivîskarê me yê mezîna de bin. Lê piştî ku roman li Stenbolê hate weşandin, min dît ku "bêhemd" navê min ji romanê hatibû avêtin, wek ku nivîskarê me ji min re gelek caran sund dixwar û îdîa dikir. Di romanê de tenê navê kesê ku berga pirtûkê amade kiribû, hatibû nivîsandin. Bi vê yekê şanaziya min çû ji kesekî dî re!

Rastiya meselê ji min re bi zelalî ji aliyê hin dostên min ên li ser fen û fûtên "wêjeya koçberiyê" li Swêdê agahdar ve hate eşkerekirin. Bi kurtî, di wê demê de adet bû ku dezgeha bi navê Kulturråd (Encumena Çandî) li gorî mesrefa pirtûkê pere didan nivîskaran; ferq nedikir bê pirtûk bi zimanê swêdî yan jî bi zimanên kesên koçber bûya. Her wiha ji bo her kesê ku di amadekirina pirtûkê de beşdar dibû yan jî jê re wêne û berg amade dikirin, pere dihatin terxankirin. Ango mafên min ên diravî ji bo motîvên min ên di wê romana Uzun de bû, ku dawîya dawî "bêhemd" ket.

Lê ji bo ku ez di vê nivîsara xwe de careke din behsa vê meselê nekim, vê bûyerê tu bandor li ser tîkiliya min a bi nivîskêr re yan jî li ser nerîna min ji wî re nekir. Der barê hunera nîgarêkîyê min xwe tim wekî yekî ku tu tîkiliya wî bi karê pisporiyane ve tune ye, didît. Ji ber vê yekê, min tu carî ji bo berhemên xwe yê hindik ku min ji vî dostî yan yê dî re amade dikirin, pere nexwestine.

3

Dûrî wan fen û fûtên veşartî ku me behsa wan kir, hîn gelek tiştên aşkera di danûstendîna Mehmed Uzun de hene ku mirov dikare behsa wan bike. Dibe ku şîkbûna wî, ku me di destpêka vê nivîsarê de behsa wê kir, dihêle ku ew çavên kesên li dora xwe di hevdîtina pêşî de bikişîne ser xwe: hilbijartina wî ya berdewam ji simokîngê reş û papiyona spî re wekî cil, dihêle ku mirov bifikire ku ew ji bo bidestxistina xelata Nobel a wêjeyê yan jî ji bo tiştêkî dî tim amade ye! Divê mirov bêje, ku camêr ji ber tîkiliyên wî yê şexsî bi kesayetiyan swêdî yê çandî û siyasî yê giring re, diviyabû here bihatirîn xwaringeh û qehwexaneyên li paytexta Vîkîngan, ku hilbijartina cilên fermî pêwîstiyek bû. Lê belê nivîskarê me berê xwe daba ku derê jî, zimanek wî yê nerm û munasib hebû,

bêyî ku tîkeve mijarên kûr û giran; bi gotineke dî: tiştê ku zora wêjevanên di dema wî de dibir, gelek caran ne bêhtirî dîtineke taybetî yan jî kuxikeke çêkirî ya Uzun bû.

Ji ber ku ez bi xwe mirovekî ne qure me, tîkiliya min bi nivîskarê mezîna Uzun re xweş bû. Ez her wiha îdîa dikim, ku ji nav tevaya Kurdên Suriyê yê ku wî ew nas dikirin, wî gelek qedrê min digirt, ku ji bo min zêde bû, bi taybetî dema wî di mala xwe ya biçûk û şîk de ya ku wê demê di kolaneke taxa Sundbyberg de bû, pêşwaziya min kir. Sedema ku ez li vê derê li xwe mikur tîm, ku ez ne hêjayî wê qedirgirtina wî ya Uzun ji min re bûm, ew e ku yek ji pêşwaziyan wî ji min re û her wiha bêhawe bûna min a wê carê hate bîra min. Di şevbihêrka me de, du dostên me yê sextekar, ku pismamên rast ên sulaleta roviyan in, dest pê kir, ku bi şeweyekî beloq pesinê nivîskarê me bidin, ku hişt ku kefa bîraya ku wan yek bi dû ya dî de vedixwar, ji devê wan derkeve. Û ez, feqîrê Xwedê, di ciyê xwe de bêdeng mabûm. Mêvandarê me berê xwe da min û bi tinazî ji min pirs kir: "Ha, keko, te nerîna xwe ya giranbiha li ser romanên min negot?" Piştî wê bêdengiyê, min dest pê kir ku ez li ser serê camêr bifelsifim û min jê re li gorî xwe çend şaşitiyan di romanên wî de bi nav kirin. Jixwe ne hewce ye ku ez bêjim ku min bi wê xwîntaliya xwe di xaka camêr de koland. Vê yekê bêhna wî teng kir û bû sedema zerbûna rûyê wî. Lê wekî her car, wî karibû bi xwe û tiştên di hundirê xwe de bi gotinan dernexist derve. Lê min ev gotin di rûyê wî de xwendin: "Ma qey tu kî yî, ta ku tu berhemên min rexne dikî?"

Lê rojêke ji rojan, bi hêviya ku agahiyên taybetî li ser Salih Beg Bedirxan - ku yek ji ronakbîrên kurd di destpêka sedsalên bîstê de bû û piraniya dema zarokî û ciwaniya xwe li Şamê derbas kiribû û mala malbata wî li taxa "Suq Sarucê" ya arîstokratî bû - li cem min hebin, telefona min kir û bi nermahî û cireke xweş bi min re axivî. Bîranîna Salih Beg Bedirxan bi tirkîya osmanî hatibûn nivîsandin. Keça wî Rewşen Xan ew veguhestibû tirkîya nûjen. Ez bawer im ku Mehmed Uzun di serdana xwe ya bo Suriyê de ew bîranîna jî wê stendibûn. Bi her hal, hingî min jê xwest ku ew du rojan bide min, heta ku ez di "arşîva mirinê" ya Kurdî de bigerim! Û dema bû wext, nivîskarê me ji ciwanmêriya xwe ji mirovekî xwe yê li Uppsalayê

xwest, ku min bi tirimbêla xwe bibe Stockholmê. Û li wê derê di mala Uzun de, ji nişka ve nivîskarek kurd ê di li wir bû, navê wî Koyo Berz bû, ku helbestan û tiştên di bi zaravê zazakî dinivîsîne. Berz jî hingî yek ji nişteciyên Upp-salayê bû. Çend roj piştî hevdişîna me ya li Stockholmê, wî bi dengê tije kîn ji min re got: "Keko, tu dizanî ku agahiyên ku te ji bo Mehmed Uzun dabûn hev û wî çar rûpelên kompûterê bi wan dagirtibûn, niha wekî jêrenotên rêzexekekên di roj-nameya "Ozgür Gundem" a li Stenbolê têne weşandin? Lê tenê navê wî hatiye nivîsandin û heta bi gotineke spasiyê jî ji bo te tune ye, tu yê ku te ew agahî dabûn wî." Bi rastî ez li ser wê meselê jî nesekinim. Û min her wiha nehişt ku ew tu bandorê li ser hevaltiya min bi nivîskarê me yê mezin re, ku navê wî roj bi roj mîna miha cejnê mezintir dibû, bilîze.

Ez dikarim li vê derê piştrast bikim, ku ez tu carî nefikirîme ku ez hevaltiya xwe ya bi Mehmed Uzun re yan jî bi kîjan kesekî di re be jî ji bo armancine şexsî bi kar bînim. Lê tê bîra min, bê çawan ew carekê behetî û ecêbmayî ma, dema min jê re got ku ez ê helbestên xwe di pirtûkekê de biweşînim. Awirên çavên wî bi vê wateyê dibiriqîn: "Nîgarkêşî û dîrok û helbest jî... bi rastî te zêde kir!" Piştî dest bi vînvînê kir, bêyî ku ez fêm bikim bê çî dibêje. Di wê demê de, Uzun di "Encumena Çandî" de berpirsê beşa Kurdî bû. Ev dezgeh e ya ku erêkirina ji bo piştigiriya diravî ya weşandina pirtûkan li Swêdê dide. Min gelek caran dibihîst, ku vî berpirsê çandî pirtûkên hin hevalên xwe yên bi zimanê Tirkî xistibûn listeya pirtûkên Kurdî, bi hinceta "naveroka wan ên neteweyî" Ji bo mesela weşandina pirtûka min a helbestan -ku bi zimanê erebî hatine nivîsandin- hevalê min tişteke negot, ji ber ew exlaqê min baş nas dike.

Heta ku dawî ew roj hat, a ku min tê de ji bo nivîskarekî me yê ji Kurdistana Iraqê qelsbûna xwe li hemberî hevalê xwe nişan da. Hevalê min Faruq Hefîd yek ji nişên pêşî yên xwendekarên kurd bû, ku burseke xwendinê ji bo xwendina li zanîngehên rojhilatê Ewropayê stendibûn. Wî xwendina xwe di salên hefteyî yên borî de li Hîngariyayê qedandiyê. Nameya wî di warê etnografîyê de bû. Bi kurtî, camêr ji min xwest ku ez bi hevalê xwe yê berpirsê beşê Kurdî re biaxivim, da

ku jê bipirsim bê ma wî çî bi pirtûka wî ya bi sernavê "Rêberê Mûzexaneyê Silêmaniyê" kiriye, ku wî xistibû nav destên "Encumena Çandî". Tiştê ku li ser telefonê ji devê nivîskarê mezin Mehmed Uzun kete guhên min, dengvedana wê hîn di guhê min de ye: "Keko, ma qey ji te re gotine ku Swêd banqeya bavê me ye?!"

4
Min tu carî îdîa nekiriye ku ez karim bi zimanê Kurdî, zimanê dayika xwe, binivîsinim. Lê ez kawik bûm dema min guh da çend hevalên xwe û hewl da ku bi Kurdî binivîsinim. Bi rastî jî hewildaneke kurt bû di salên notî de, dema ku -bi kêmanî li gorî temaşevanê min- payîza temen di asoyên dût de xuya dikir. Lê tevî kawikbûna wê hewildanê, wê hişt ku kurdiya min bi gotinên nû yên cuda dewlemend bibe, ji bilî xurtbûna xwendina min a bi zimanê çiyayên me yên berz. Yek ji wan xwendina romana "Destana Çiyayê Agirî" ya Yaşar Kemal bû. Tevî ku wergêr di warê wêjeyî de ne naskirî ye jî, lê nivîs bi şeweyekî balkêş derbasî hestên min bû. Vê yekê hişt ku ez pirtûka xwe di rêya postê re bişînim ji hevalekî xwe yê li Şamê re. Ev hest di xwendina min a romanên Mehmed Uzun de qet peyde nebû; Uzunê ku bi taybetî têkiliyên xwe yên şexsî yên bi Yaşar Kemal re baş bi kar dianîn, da ku produktên xwe yên wêjeyî bi taybetî li Tirkîyeyê bide belavkirin. Ji bilî nepeydebûna xweşiya xwendinê, zimanekî Uzun yê tevlihev jî peyde dibe; ev zimanê nivîskêr ku ew qasî tevlihev bû, ku min tim ji hevalên xwe re digot, ku zilmeke mezin e, ku ew bi zimanê dayikên me yê Kurdî bête muqarenekirin; ev dayikên ku hema bêje nexwende bûn! Û ji bo ez tiştên ku min li ser romana Yaşar Kemal a wergerandî bo Kurdî nivîsandine, piştrast bikim, ez dibêjim ku çendîn hin kesan îdîa dikir, ku zimanê me yê dayikê qaşo ji ber qelsbûna wê û kêmbûna peyvan tê de nikare bibe zimanek wêjeyî, divê mirov bipirse bê çima romanek mîna "Destana Çiyayê Agirî" xweşiya hevîkirî pêk tîne, tevî ku ew hatiye wergerandin bo Kurdî; ev zimanê ku nikare xweşiyekê bide te, dema tu romanekê Mehmed Uzun dixwîni.


Ji ber vê yekê, mirov fêm dike, ku nivîskarê me nehişt ku romanên wî ji Kurdî bêne wergerandin bo Tirkî û swêdî, ku ew bi herdu zimanan jî dizane. Lê wî xwe li vir û wir pir westand, da ku romanên wî bêne wergerandin bo zimanê di û bi

taybetî yên frensî û elmanî. Li gor ku ez dizanim, ew difikirî ku êdî pirtûkên wî ji wan zimanan bêne wergerandin bo swêdî, wekî mînak ji elmanî. Û bi rastî jî ev yek piştî wilo hat. Ger nivîskarê me xwestiba, wî dikari bihêle ku pirtûkên wî yek bi dû ya di de bêne wergerandin bo swêdî; ev jî ji ber naskirin û têkiliyên wî yên civakî yên berfireh. Lê nepêkanîna vê yekê rovîtiya wî nişan dide; ji ber ew ji her kesî bêhtir dizane bê nivîsên wî çî qasî hêja ne!

Mînaka navdariya ku Mehmed Uzun wekî nivîskarekî kurd li ber dergehên "cihanê" bi dest xistiye, nişana zîrekbûna wî ya çêkirin û bikaranîna têkiliyên civakî ye. Her wiha "êtkêta" derve ya kesayetiya wî ya bi heybet ligel girêdana mezinkirinên beloq bi navê xwe wekî "dahênerê romana Kurdî" piştigiriya vî tiştî kirin. Û em ji bîr nekin ku siyaset wekî karekî berxwedanê yê rewa ji bo Kurdan wekî miletekî dagîrkirî û parçebûyî, gelek nivîskarên me ew ji bo warekî ku xwe li pişt veşêrin, bi kar anî, da ku navdariyekê bi dest xînin, ku wan bi rastî karib wê çêbikin, bi xêra propagandaya siyasî ya ji bo doza wan di cihanê de, ne bi qîmeta rast a nivîsên wan ên afirandî. Û qet ne ji nişka ve bû, ku yekemîn "nivîsa" Mehmed Uzun ku ji bo zimanekî di yê Ewropî hate wergerandin, nivîsareke siyasî bi sernavê "Bigirî welatê ber dilê min" bû, ku derbarê bobelata koçberiya bi milyonan ji Kurdan bo sînorên welatên cihanê Iraqê bû, piştî Şerê Kendavê yê Duyemîn di sala 1991ê de û têkbirina serhildana millet li dijî rêjîma Sedam. Nivîskarê me her wiha sempatiyên Rojavayê ji bo doza gelê wî li Kurdistana Tirkîyeyê ji bo navê xwe yê wêjeyî bi kar anî. Ev yek tevî rastiya ku her kes nas dike, ku Mehmed Uzun bi xwe di hevpeyvînên xwe yên rojnamevanî û televizyonî de -bi taybetî bi dezgehên Swêdê re- qet bal nedikişand ser wê êşê, û ev yek tim bi hincetine vala şirove dikir, ew jî neqebûlîrîna wî ji berxwedana çekdar li wan herêmên Kurdî. Heta di vê meselê de jî wî bi zanebûn dihişt ku bi giştî helwesta wî ne dûtî ya Rojavayê be, ku li dijî wê berxwedana çekdar bû.

Xala herî balkêş di rêzexekekên fen û fûtên Uzun de ew bû, dema nivîskarê me derket pêşiya medyaya cihanî û îdîa kir, ku di dema mayîna wî ya li Tirkîyeyê de ya ku salekê dirêj kir, ji aliyê "Terorîstên kurd" ve gef lê hatin xwarin.

Em niha Mehmed Uzun bi bîr tînin û ew -li gorî nûçeyên çapemeniyê- hatiye şandin bo Emerîkayê, piştî ku rewşa wî ya tenduristî ji ber nexweşiya şerpencyê xerabtir bûye. Ez wî bi bîr tînim û ev nûçe bi ser min de hat wek ku tarîbûna payîzê bi ser temen û bîranînên wî de hat. Ne hewce ye ku ez li vir bêjim, bê çî qasî ez ji ber nexweşiya hevalê xwe yê nivîskar diêşim; tevî ku hin kes wê gazinan ji vê rexneya min a dijar bikin. Wêneyê wî yê dawî ku di medyayê de hate weşandin, tev li bîranînên min bi xwediyê wî re bû: Dibe ku ev cara pêşî be, ku Mehmed Uzun ne bi cilên xwe yên spehî, yên bi rastî şiq, xuya dike; ew ê ku kirasê nexweşiyê yê zer li xwe kiriye, û yê ku awirên wî yên xemgîn bi kamerayê hatine kişandin, û em jî -heval û mirovên wî- wan di rêya wê re bi çavên xwe dibînin. Ne ji mafên min bû, ku ez di dema dîtina wêneyê nûçeyê pê re de gumanê bikim ku ev tişt jî yek ji "listikên" ji bo navdariyê be, ku bi navê camêr we hatine girêdan. Di wê demê de nehat bîra min ji bilî ramankirina bi wî giyanê tarî, yê ku Selîm Berekat di dîwana xwe ya helbestê "El-Methaqîl" de wekî "bavê valahiyê" bi nav dike, giyanê dijmin, ê gumanok û serserî, yê rûreş - wekî ecelê bê çare.



BÎRA QEDERÊ

Rêzan Tovjîn


Romanên Mehmed Uzun Siya Evîne û Bîra Qederê bandoreke zêde li ser min kirin. Jixwe min di jiyana xwe de cara yekem romeneke bi Kurdî xwendibû, Siya Evîne. Hîn jî di çavên min de ziman, honandin û teşeya van her du romanên ji mijara wan ne girîngtir e. Memduh Selîm Beg û Celadet Elî Bedirxan di mejiyê min de bi saya van her du romanên vejîyan.

Bîra Qederê jî romaneke dîrokî ye. Jiyana Celadet Elî Bedirxan ji dayikbûna wî heta gorbihuşt dibe tîne zimên. Dema min nû xwend ez bêhtir di bin bandora feodalîzmê de bûm. Gelekî hêrsa min bi Mehmed Uzun hatibû. Min gotibû "Uzun lehengê xwe, angî Celadet wekî berdûşekî nivîsiye." Lê ev bi tenê bandora feodalîyê bû. Dûre bi qasî 10 salan min dît ku gelek rewşenbîrên kurd li ser Celadet tiştên xweş nabêjin. Wê demê ew gotinên wan û vegotina Bîra Qederê di serê min de Celadet jî derekê danî dereke din.

Di Bîra Qederê de êdî Celadet jî girîng e û honandin, teşe û zimanê romanê jî girîng e. Lê ji bo nîrxandina romanekê em ê jiyana rastî û ne rastî ya Celadet deynin aliyekî.

Pêşî divê em ji muhafezekariya romanê dest pê bikin. Wekî hemû romanên Mehmed Uzun, Bîra Qederê jî bo ziman û nêzîkatiyê muhafezekarî hatiye nivîsîn. Ji qalibê hevokan, heta bi dubarekirina wan, ji dubarekirina hevokan heta bi hilbijartina bêjeyan hewayeke wisan heye. Uzun di romanên xwe de tu caran serî hilnedaye jixwe. Tu caran şûr li diwaran nekişandîye. Nexwestiyê xwe bike Don Kîşot. Di feraseta romanên wî de jî wisan e.

Di Bîra Qederê de ev çawan derketiye holê: Dubarebûna bêjeyan... Mînak "Berf, berfeke gir... Berfeke sar, berfeke demdirêj dibare." Ev teşe li



cîhanê ji aliyê gelek romanûs û çiroknûsan ve hatiye bikaranîn. Hinekan bi muhafezekarî, hinekan jî tenê ji bo xweşikiya hevokê bi kar anîne. Uzun di Siya Evîne û Bîra Qederê de bi zêdehî, di romanên din de jî bi awayekî belî bi kar anîye. Helbet ev tenê nabe sedema vê nîrxandinê.

Li aliyê din dubarebûna hevokan heye. Ne ji ber ku zimanê wî ne dewlemend e, bi rastî ji ber ku ew naxwaze hinek gotinan bi kar bîne wisan dibe. Her wisan di hilbijartina qalib û bêjeyan de jî wisan kiriye. Mirov dikare vê nêzîkatiyê bi du awayan binirxîne. Yek: Uzun naxwaze dîrî zimanê gel bikeve. Dixwaze romana wî ji aliyê piraniya gel ve bête xwendin û qebûl kirin. Dîtirse ku bi gotinên nû û yên li her herêmê nayên bikaranîn xwe ji xwendevan bi dîr bixe. Du: Derdekî Uzun nîn e ku bi romanên xwe kurdiyê pak û paqij derxe holê, ji gotinên Erebî, Farisî, Tirkî û Îngilîzî ve-qetîne û Kurmanciyê nû pêşkêş bike.

Ev her du nîrxandin jî di encama xwe de muhafezekariyê didin der.

Ji aliyê teşeyê ve di Bîra Qederê de wekî ku tê zanîn Rojnivîsk hatiye bikaranîn. Mirov xwe di nav rûpelên rojnivîska Celadet de hîs dike. Di vê ceribandina xwe de jî serkeftî ye. Ev teşe jî li cîhanê berê hatiye bikaranîn. Heke Uzun ev teşe hilnebijarta dê nikaribûya me têxe nav rojên Celadet û rûhiyata wan rojan vejîne. Dîsa jî Uzun beşên rojnivîsê û beşên ji zimanê xwe ji hev cuda kiriye û nexwestiyê hilma romana modern ji ser here.

Di Bîra Qederê de divê em Uzun ji aliyekî ve pîroz bikin. Ji bo lêkolîna ku ji bo vê romanê kiriye. Gelek nivîskarên cîhanê ku romanên dîrokî dinivîsin, dema lehengê xwe di bajarekî kevin re derbas dikin, navê kuçe û kolanên wê demê jî tînin ziman. Dema ku lehengê xwe xwaringehê navê xwarinên wê demê dihejmêrin: Dema ku cilekî li xwe dike navê parçe û qumaşên wê demê û taybetiyên wan vedibêjin. Uzun jî mecbûr bû ku di romaneke wisan dîrokî de agahiyan berhev bike. Çûn û hatina wî ya di vî warî de parçeyekî nivîskariya wî ya girîng e.

Ev taybetiyên baş ên nivîskariyê ne. Hinek taybetiyên nivîskariyê jî hene ku ku di nav her gelekî de cuda ne. Mînak di nav romanên tirkan de her tim jinên kurdan di bin mîrên tirkan de ne. Tirk pêşketî ne û jinên kurdan xwe li wan digirin. Di romana Bîra Qederê de jî jineke Xîrwat di bin mîrê kurd de ye. Em bêjin di jiyana rastî de wisan çêbûye û Uzun jî ew aniye ziman, çawan be romaneke dîrokî ye. Lê dema mirov bifikire, çima di nav nivîsên her duyan de ew qas teferuat hene û di nav nivîsên Celadet û Rûşen xanim de ew qas teferuat nîn in. Gelo ji ber ku jineke kurd bû Uzun wisan nekir. An jî ber ku Canan ne kurd bû Uzun dilê Celadet lê rihet kir?

Celadet di nav rêxistina Xoybûnê de bû. Gelek rewşenbîr rexne dikin ku wî pereyê xebatan û rêxistinê dibir li kêfa xwe xerc dikir. Li otêlan diket hembêza Cananê. Ji ber vê yekê jî pevçûn çêbû û Celadet êdî guhê xwe ji ser xebatên siyasî da alî.


Berî ku mirov ji mijarê dîr bikeve, divê em careke din bipirsin ku çima têkiliya Canan û Celadet ew qasî mohra xwe li romanê dixin. Bînin bîra xwe ku di romana Hawara Dîcleyê de jî şervaneke kurd bera bin mîrekî tirk dide. Ev her du jî klasîk in.

Taybetiyên nivîskarên welatan in. Heman taybetî li ser Uzun jî xwe xuya kiriye.

Wekî di destpêkê de jî hate vegotin, ev jî parçeyekî muhafezekariyê ne. Uzun di romanên xwe de şûr li diwaran nekişandîye. Xwe nekiriye Don Kîşot.

Di Bîra Qederê de teferuatên nav nivînan jî zêde hatine bikaranîn. Dema ku em dibêjin "zêde" bila em nekevin şûna muhafezekaran. Ne ku em dibêjin têkiliyên zayendî divê di romanên de ew qasî vekirî neyên nivîsandin. Li cîhanê bi hezaran romanûsan bi armanca firotina romanê ev yek bi kar anîne. Têkiliyên zayendî di romanê de wekî bazarkirina jinê hatine pêşkêşkirin. Tiştên ku divê em li hember derkevin ev e. Di Bîra Qederê de jî têkiliya Celadet û Canan ne têkiliyek wisan e ku were destekkirin, an mirov jê re bédeng bimîne. Heke mirovek bi miroveke/din re be û bi awayekî veşartî bi hinekî din re be ev ne tiştê exlaqî ye. Ev jî bo her kesî derbasdar e, hem jin hem jî mîr. Ji ber vê yekê têkiliya Celadet û Canan ne têkiliyê divê were destekkirin. Wê demê mirov dibêje "Gelo Uzun hema ji bo ku têkiliyên cinsî di romanê de derxe pêş û bala xwendevan bikişîne, wisan kiriye?"

Romana Bîra Qederê heta niha ji aliyê gelek kesan ve hatibû nîrxandin. Ji lew re min hin tişt anîn ziman ku berê kesî neaniye ziman. Hem ji bo dubare çênebin, hem jî ji roman bêhtir bête veçîrandin.



ZIMANEK GELEKÎ (NETEWEYE KÎ) DIAFI- RÎNE

Yaşar Kemal /
Ji Tirkî Werger: Mem Mîrxan

Mehmed ji bo min hostayekî mezin ê zimên e. Ne tenê hostayê zimanekî ye. Zimanê ku em jê re dibêjin zimanê edebiyatê, zimanê romanê heye. Her nivîskarek, zimanê xwe diafirîne. Mehmed yekem romana modern a Kurdî nivîsandîye. Yên ku berhemên dişibine romanan bi Kurdî dinivîsîn helbet gelek hene. Lê yekî weke Mehmed hosta, nav û dengê wî li cîhanê belav bûye, zêde tune ne. Îro zimanê Kurdî bi Mehmed dest pê dike. Zimanê romanê, avakirina zimanekî ye. Zimanê romanê, zimanê helbestê avakirina zimanekî ye. Vî mirovî li Anatolyayê, zimanê ku bi salan hatiye qedexekirin roman nivîsand. Bi vî zimanî hostayek derket, bi Kurdî, got; bi vî zimanî mirov dikare romaekê binivîsîne û romanên herî bedew nivîsandin. Mehmed nişan da ku mirov bi Kurdî dikare bi hostatî romanekê binivîsîne.

Ez jî kurd im. Lê belê ez ne nivîskarekî kurd im. Şanseki min ê weke Mehmed çênebû. Li Tirkiyeyê gelek wêjenas derketin. Nazim Hikmet derket, Saik Faik derket. Gelek mirovên din jî derketin. Lê di Kurdî de tenê Mehmedek derket. Yê Tirkiyeyê jî tenê Mehmedekî wê heye. Ji bo min jî, Mehmed nixê herî mezin ê edebiyatê ye. Em rûmetên xwe, nixên xwe nas nakin. Yên li Tirkiyeyê ne jî nizanin. Tirkiye, rûmetê nade yên

ku zimanê me afirandin. Ku Mehmed hate wêlatekî; kurd dibe, tirk dibe, ereb dibe divê jê re rêz bigire, rûmetê bide.

Divê bê zanîn: Zimanek gelekî neteweyekî diafirîne.

Nîşe: Ji axaftina Yaşar Kemal a dema serdana Mehmed UZUN a nexweşxaneyê



ENCAM- NAMEYA KONFE- RANSA PARASTINA ZIMAN

Konferansa Parastin û Perwerdehiya Zimanê Kurdî ku di çarçoveya 4'emîn Rojên Wêjeyê li Diyarbekirê, di navbera 18 û 19'ê sermawezê de bi beşdariya 150 delegeran pêk hat. Konferans ji aliyê Şaredariya Bajarê Mezin a Diyarbekirê û bi piştgiriya saziyên ku xebata parastin û pêşvebirina zimanê kurdî dikin ve hate lidarxistin. Em encam-nameya konferansê pêşkêşî we dikin:

- Di konferansê de hate destnîşankirin ku meşandina politikayên pişaftinê sêceki mirovahiyê ye. Lewre ev politika ji hêla beşdarên konferansê ve hatin şermezarkirin.

- Ji aliyê beşdarên konferansê ve hate destnîşankirin ku divê siyasatmedarên kurd siyaseta xwe bi zimanê kurdî bikin, lewre bang li hemû sazî, dezgeh û siyasatmedarên kurd hate kirin ku siyaseta xwe bi zimanê kurdî bikin.

- Beşdarên konferansê bal kişand ser çavnebariya li hemberî zimanê kurdî û ji ber bikaranîn û handana zimanê kurdî pest û pêkûtiya li ser şaredariyan şermezar kir.

- Delagasyona konferansê, pêşniyar li Hikûmeta Herêma Kurdistanê Federal kir ku li herêma

Parêzgeha Duhokê û derdora wê ku zaravayê kurmançî lê tê bikaranîn perwerdehi bi zaravayê kurmançî be.

- Beşdarên konferansê diyar kir ku mafê ziman û çandê mafekî navneteweyî û demokratîk e. Li ser vê bingehê beşdarên konferansê bang li kurdên Tîrkiye, Suriye û Îranê kir ku li mafên xwe yên çand û ziman xwedî derkevin.

- Beşdaran destnîşan kir ku ji bo pêşketina ziman mercên aşî û aramiyê pêwîst in. Ji bo vê yekê jî konferansa me bang li hemû derdorên têkildar kir ku ji bo pêkanîna mercên aştiyane barê ku dikeve ser milên wan pêk bînin.

- Beşdarên Konferansa Parastin û Perwerdehiya Kurdî astengkirina televîzyon û weşanên kurdî yên mîna Roj TV, MMC û Komala TV wekî binpêkirina mafên mirovan û astengkirina zimanê kurdî dibînin û vê yekê şermezar dikin.

- Di warê fêrkirin û perwerdehiyê de divê ku alikariyeye taybet ji bo kurdên Ermenistan, Başûrê Rojavayê welêt, re bê kirin.

- Beşdarên konferansê bang li saziyên sivil û demokratîk ên li hemû herêmên ku kurd lê dijîn kir ku têkiliyên xwe yên civakî, çandî, hunerî û aborî xurt bikin da ku zarava û devokên kurdî ber bi hev ve werin û nêzîkî hev bibin.

- Di konferansê de girîngî û pêwîstiya Tevgera Ziman ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî hate destnîşankirin û bang li hemû gelê kurd hate kirin ku bi hemû îmkanên xwe beşdarî xebatên Tevgera Ziman bibin.

- Konferansa me bal kişand ser girîngiya jin û ciwanan a di parastin û pêşvebirina zimanê kurdî û xwest ku jin û ciwan risteke bi taybet di parastin û pêşvebirina zimanê kurdî de bigirin ser milên xwe.

- Konferansa me gihîşt vê encamê ku teknoloji heta niha ji bo pişaftina zimanê kurdî hatiye bikaranîn. Beşdaran xwest ku gelê kurd di parastin û pêşvebirina zimanê kurdî de bi awayekî xurt ji teknolojiyê sûde wergire.

- Konferansa me rojanebûna rojnameya A. Welat


wekî gaveke dîrokî bi nav kir û xwest ku gelê kurd bi her awayî li rojname, kovar û weşanên xwedî derkeve.

- Her wekî di konferansa par de jî biryar hatibû girtin, konferansa me pêşniyar li Hikûmeta Herêma Kurdistanê Federal kir da ku gav bi gav ber bi serdestkirina tîpên latînî ve biçe.

- Konferansa Parastin û Perwerdehiya Kurdî bang li rewşenbîr û akademîsyenên kurd kir ku bi zimanê kurdî berhevan bidin û li ser zimanê kurdî xebatên zanistî bikin.

- Beşdarên konferansê bang li dewletên ku kurd hemwelatîyên wan in kir ku hebûna zimanê kurdî nas bikin û ji bo parastin û pêşvebirina zimanê kurdî butçeyeye taybet veqetînin.

- Her çiqas li ber zimanê kurdî hinek astengî hebin jî, yên ku zimanê kurdî biparêzin kes û saziyên kurdan in. Tiştê girîng ev e ku kurd û kesên ku xwe kurd dihesibînin, berî her tiştî di jiyana rojane de, di danûstandinên bi her awayî de zimanê xwe bi kar bînin.



LI SER "SÊ ROJ Û SÊ ŞEV, DENG Û BÊJ"Ê ÇEND NOT

Cemil Oguz

Li Navenda Çanda Mezopotamyayê çalakiya "Sê roj, sê şev, deng û bêj" a dengbêjan rojên 8-9-10'ê berfanbarê li dar ket. Di çalakiya ku hem dengbêj, hem temaşevan, hem jî NÇM memnûn bû de gelek xalên balkêş derketin hole.

Di çalakiya dengbêjan ku têde qala çîrokên Dewrêşê Evdî, Mem û Zîn, Şêx Sêîd, Siyabend û Xecê, Têlî, Cewher Beg, Evdalê Zeynikê hatin kirin, denbêjêh kurd Seyîtxanê Boyaxçî, Salihê Qubînî, Îsmailê Sêlimî, Apê Bekir, Zahiro û Tahsînê Pasûrê bi çîrok û klamên xwe derketin pêşberî temaşevanan gelek xalên balkêş derketin hole.

Ji çalakiya Sê roj, sê şev, deng û bêj" hin not:

- Di sê rojên konserên dengbêjan de Zahiro bi dengê xwe, şekildayîna klam û gotinê ji dengbêjên din zêdetir serketîtir dixuya û derket pêş.

- Salona NÇM'ê ku di hin konseran re bi temamî tije bû, di hinan de nîvteje bû, di nav van temaşevanan de jî herî zêde ciwan balê dikişandin.

- Digel ku evçend meh in ji ber tadilatê salona NÇM'ê girtîbû û haya zêde kesî ji van çalakiyan nîn bû jî, vê xebatê hem li gor xwe bi têra xwe

temaşevanan kişand, hem jî kir ku reklama salonê jî bê kirin.

- Ev derket holê ku xebatên bi mijar, xebatên serketî balê dikişînin û dê bikişînin.

- Li ser sehnê, dema dengbêjek klam digot, te dît, bi awayekî destê wî bilind dibû û te ferq dikir ku silav dida yekî/ê yan jî silavê yekî/ê digirt.

- Di nav dengbêjan de her hurmet hebû. Kî biketa hundir, ewên din li ber radibûn. Ev yek hurmeta di nava kurdan a jiyana berê de jî nîşan dida.

- Ji klamên ku dihatin vegotin tam dihatin fêhm kirin an na nediyar bûn, lê du tişt jê diyar bû: Yek jê ji klaman zewq dihat girtin, yek jê ji klam hatin nasîn, hindik be jî çîroka wan kete ser ziman.

- Di nav sohbetên me yên li derve de dengbêj Îsmailê Sêlimî ku li Amedê, li Navenda Çanda Dicle Firatê berpîrsê denbêjan e got ku di sala 2007'an de li Amedê Mala Dengbêjan vekin û li wir dê dersa dengbêjiyê jî bidin. Dê bikin ku nîfşê nû yê dengbêj derkevin holê.

- Dengbêj Tehsînê Pasûrî dazanîn ku ji bo ciwan bibin dengbêj divê xwedî jiyanê rast bin, bi çand û zimanê bizanibin, hema wisa ji xwe ber dengbêjî nabe.

- Hurmeta dengbêjan a li hember hev û li hember guhdar û temaşevanan zêde bû û peyvên "Ez xulamê te me", "Ez qurbanê rihê te bim" li hewa difriyan.

- Di sê rojan de hejmara muzîkarên NÇM'ê di nava temaşevanan de kêmbû.

- Sekna Zahiro ya li sehnê hakimbûna wî ya li sehnê û temaşevanan diyar dikir, carinan saniyeyekê-du saniye disekinî, bi vî awayî dikir ku zêdetir bal li ser bimîne, bala temaşevanan her li ser be. Ev yek jî serketineke din a wî bû.

- Kêmasiyên bernameyê jî ev bûn: Hin bername bi 15-20 deqîqeyan bi derengî dert pê kirin, her wiha di nav temaşevanan de lêdana telefonan jî kêmasiyeke din bû.

- Hem li ser sehneyê, her li derveyî sehneyê qet tizbî ji destê dengbêjan neket. Ji aliyekê klam digotin û ew klam di nav guhên temaşevanan bi coşeke xweşik olan didan, ji aliyê din ve carinan dengê şîrgîna tîzbiya dengbêjan ku qet temaşevan aciz nekidir jî xwe digihand temaşevanan.

- Dê demê kî li sehneyê ba bila biba, dengbêjên din miheqeq di nav temaşevanan de cih digirtin, li wî temaşevan dikirin, wekî ku rêgeza, "Li dîwanê heval bi tenê nayê hiştin" dianîn cih. Vê yekê kir ku temaşevan zêdetir ji wan hez bikin.

- Li dema konser û li derve yên ku makîneyên wan ên fotografan hebûn fotograf dikişandin, ên ku nîn bû, bi telefonên xwe fotograf dikişandin, wekî ku bikevin pêşbaziye...

- Dengbêjan hem ji ser sehnê, hem jî li derve bi gotin û tevgera xwe çend caran sipasî ji amadekarên vê çalakiyê Elif Kaya û Turan Yapıştıran re kirin.

- Denbêjên ku ji Amedê hatibûn bi şid, ji dil gotina, "Ez dengbêjê Amedê me" dianîn ziman.


- Di nav klaman de nepixandina bûyerê pir zêde bû û vê jî dikir ku zêdetir klam balê bikişînin, ji wan bê hezkirin. Mînak: 1-"Du sal berê min maçekê lê dabû, ev du sal in ez bi firçe û mecûnan devê xwe dişom, her roj wext destmêjê digirim hê tema wê ji nav diranên min neçûye." 2- Li ser Şewata Sînemaya Amûdê klamê dibêje, dibê, "Her carê diket hundir, bi carekê de 10-15 zarok dikir hambêza xwe û ew dianî derve, lê cara dawî dîrek li serî wî ket..." 3- Dixwaze delalî, jîriya Nazê bîne ziman, dibêje, "Yeka wekî Nazê bikeve mala me, ez ji te re sond dixwim dewlet a me ye..." û hwd.

- Di sê rojan de 6 konser hatin li darxistin, hemû dengbêj beşdar bûn.

- Nebûna jinên dengbêj jî wekî pîrsekê li holê ma.

- Temaşevan ji konseran memnûn bûn, organîzator memnûn bûn, dengbêj jî bi heman awayî. Memnûnbûna dengbêjan mirov dikare bi gotinên Zahiro ku ji me re gotin, bîne ziman: "Dema berê ez dihatim NÇM'ê, bi tirkî ji min dipirsîn, digotir,


"Tu kî yî?" vê carê bi kurdî xeber didan, xwedî li me derketin. Ger xebatên wisa zêde bibin dê dengbêjî têk neçe."



Ji Weşanên Lîsê

www.bername.net

BERNAME.net



Biha: 5 YTL

KOVARA KOMPUTER Û INTERNETÊ

HEJMARA TAYBET : 1 SAL SERMAWEZ 2006

PHP-NUKE BI KURDÎ YE

PHP-FUSION BI KURDÎ YE

FileZilla BI KURDÎ

UBUNTU LINUX'Ê NAS BIKIN

Ji bo cihaneke nû û geş amade bin.
Prestê we nema ji komputera we dibe. Ev
pêşeroja we ye.

OpenOffice.org

Ofisa kurdî ji bo ceribandinê derket. Êdî kurdî bi gavên mezin pêşve dihere. Rastnivîsa kurdî li ser OpenOffice.org dê bibe şoreşeke mezin.

Mozilla Firefox

Di gera internetê de pirsgirêk namin. Firefox hem ewledar e, hem lezgîn e hem jî bi kurdî ye.

Karger çî ye ?

Komputergeran komeleya xwe ava li Amedê ava kirin. Êdî her roj wergera bernameyan tê kirin. Kadroyên teknik tèn perwerdekirin.

Kawa Nemir



DOSYE: MEHMED UZUN

“N iha Diyarbekir di heyata min de jî di nivîskariya min de jî cihekî gelek giring werdigire. Wekî hûn jî dizanin nivîskariya min li welatê xerîbiyê dest pê kir û ez bûm nivîskarê romana Kurdî. Û li welatê xerîbiyê nivîskarî zaf zaf zehmet bû. Zehmet e, gelek zehmet e. Di wê heyama avakirina nivîskariya min de; Diyarbekir her tim bi min re bû. Jixwe di romana min a “Tu” de Diyarbekir bi firehî heye. Mirov dikare bêje ku ew roman romana Diyarbekirê ye. Diyarbekir, hingê ji bo min bû hêz û qewet, da ku ez karibim li hember zehmetî û diwariyên welatê xerîbiyê rawestim û li milê din jî karibim nivîskariya xwe ava bikim. Baweriya min gelek bi Amedê û hemû herêmên Kurdistanê heye.”

MEHMED UZUN

